peyama Kurd

Rojnameya Gîştî ya Hefteyî | Hejmar 19 / Sal 1 | 14.01.2005

Kurdish weekly newspaper | Kurdische Wochenzeitung

Serokê Komîteya referandumê li Kurdistanê Helkewt Ebdula: „Ji sedî nodê kurdan serxwebûnê dixwazin“

Rûpel 4



Heta Kemalîzm serdest e, Demokrasî û Kurd dê bindest be!

Her olek kitêbek xwe ya muqeddes heye. Heram û helal, rast û çewt di van kitêbên pîroz de hatiye nivîsîn. Kesên xwedî bawerî, nabe ji kelamên kitêbên pîroz derkevin

Kemalîzm û dewleta Kemalîst jî xwediyê “kitêbek muqeddes” e. Navê pirtûka dewleta Kemalîst jî “kirmizi kitap / pirtûka sor” e. Di derbarê vê pirtûkê de gelek tişt tên axavtin û nivîsîn. Lê hemû kes nikarin wê bibînin û bidestxin. Tenê Serokkomar, Serokwezîr û hin wezîrên girîng dema dest bi karê xwe bikin vê pirtûkê dixwînin da ku erkên xwe û hedê xwe bizanibin!

Gelek babetên vê pirtûkê bi taybetî li dijî gelê Kurd û doza Kurdistanê hatiye amadekirin. Kesê ku ji naveroka vê pirtûkê agahdar be, dikare qenc bibîne, bê serçaviya siyaseta dijayetiya Kurd û Kurdistanê ji kûderê dertê!

Li Tirkiyê bi salane ku herkes behsa pirtûkek bi navê „Pirtûka sor“ dike. Herwiha ji aliyê herkesî tê dizanin ku „Pirtûka sor“ esas „Zagona bingehîn“ a „dewleta kûr ya Tirk“ e û rêvebiriya dewletê bi vê pirtûkê dimeşe.

Li gel vê zanyariyê tê îddîa kirin ku hejmara kesên ku ev „Pirtûka sor“ dîtinin û·xwendinin deh-panzdeh kesan derbas nake ku ev kes jî raste rast „Xwediyê“ dewleta Tirk in.

Rûpel 3



Ibrahîm Güçlü:
Em dixwazin ruhê DDKOyan wekî sala 1969an dîsa vejînin

Rûpel 5

Dengê Hesen Cizrawî, ruh dide min
Rûpel 9



Wêne: Peyama Kurd — Fatê û Hêvîdar Zana

Kadîm Kan
Projeya nukluera Îran ê
Rûpel 7

Laleş Qaso
Hayrî Durmuş û Abdullah Ocalan
Rûpel 8

Prof.Henri Barkey
Serxwebûna Kurdan ne dûr e
Rûpel 8

Heciyên Kurdistanê ji Hewlêrê firiyan
Rûpel 8

Çewlîg de banî ke semedî erdlerza virazîyayî nêsaxlemî
Rûpel 16

Li Almanya, Kurdistan Tv bi şahiyeke taybetî deriyên studyoya xwe vedike
Rûpel 5

Li Almanya li dijî islamîstên radikal operasyon
Rûpel 6

Şîrove
Ahmet Zeki Okçuoglu
Naîf Bezwan
Rûpel 3

Hêvî Sebrî
Bajarê Şamê, cîhê zaroktiya min -1-
Rûpel 10

Kamiran Haco
Demokratî li Suriyê dibe garantiya çareseriya Pirsa Kurdî
Rûpel 6

Fehmî Balayî
Di hebûn û nebûnê de sînema Kurd
Rûpel 15

Ehmedê Dirihî
Konferansa ziwanê Kurdî ya Dîyarbekirî
Rûpel 17

D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1,70 EUR

4 196577 401503 19

www.e-kurd.org

Rejîma Tirk, Erdogan-AKP û doza Kurdistanê

Bayram Ayaz


19 Tabax 2004

Li Rojhilata navîn konjonkturek stratejîk hesas peyda bûye ku çav û gohên hemî hêzên navnetewî û herêmî ser e.

Tirkîye, wek dewletek-sereke li herêmê bêguman bala her hêzî dikşîne. Amerîkî û Îsraîlî pê mujil in, Ewrûpî naxwazin wê bixeydînin, Rusya, Îran û dewletên Ereb pê re peywendiyan datînin û dixwazin wê ji bo planên xwe bi kar bînin. Rejîma Tirk jî dixwaze ji van her yekî îstîfadeyê bike û wisa temenê xwe dirêj bike. Helbet em behsa rejîma Tirk dikin, ne ya Hukûmetê. Rejîm û dewlet perçeyek in, bi hev zeliqî ne. Hukûmet organek e ku çerxa birêvebiriyê digerîne.

Li Tirkîyê, dewrê Hûkûmetan zêde tune. Vê rastiyê, gelek caran siyasetvanên Tirkan bi xwe tînin ser zimên, dibêjin: "Em Hukûmet in, lê hukm ne di destê me de ye, desthilatdariya me bi sînur e" ! Baş e, li Tirkîyê desthilatdarî di destê kê de ye? Û armancên van hêzan çi ne?

Dema ku mirov vê taybetiya rejîma Tirk nenase û analîzên xwe goreyê vê rastiyê neke, nikare ji nav pirsan derbikeve û bersivên rast bibîne. Helbet em naxwazin rola Hukûmetan û aktorên polîtîk sivîl bincil bikin. Mebesta me ew e, em bêhtir balê bikşînin ser strûktûra rejîma Tirk. Pirsa demokrasiyê, astengiyên li pêş doza Kurd, danûsendinên wan bi Yekîtîya Ewrûpa û Amerîka re, giş van kêşeyan divê em wek babetên rejîma Tirk binirxînin, ne yên Hukûmetê.

Rola Serokwezîr Recep Tayyîp Erdogan û partiya wî AKPê (Partiya Adaletê û Pêşketinê) jî divê wisa lê bê nêrin. Peywendiyên Erdogan-AKP û rejîma Tirk di çi radeyê de ne? Rejîm vî kesî û partiya wî dipejirîne? Bi çiqasî rê li ber vî kesî vedikin? Erdogan û hevalên wî nêrînên wan çi ne? Gelo çi guherîn li cem wan çêbûye? Ev kom bi bîr û hizrên xwe dikarin rejîma Tirk demokratîze bikin? Hêza wan bi vê yekê digîhe?

Wisa xuyaye, tevgera demokrat-lîberal ya Tirkan jî û tevgera welatparêza Kurd jî, hewce ye bi van pirsan hertim mijûl bibe. Gelo dewleta Tirk (rejîm) dikare bibe dewleteka demokrat? Erdogan û hevalên xwe dikarin di bin vî barî de rabin?

Belê em dibînin ku Erdogan û partiya wî AKP ser xeta Yekîtîya Ewrûpa ye. Ew dixwazin Tirkîye bibe endamê YE û bi alîkariya YE rejîma Tirkîyê hinek bigûhere û xwe li goreyê pîvanên Ewrûpiyan demokratîze bike. Erdogan û hevalên wî vî tiştî dixwazin, jiber ku ew bi xwe jî muhtacê vê yekê ne. Pirsa girîng ev e: Gelo guherînên ku Erdogan û hevalên wî dixwazin, bi têrî gûherîna rejîma Tirk tê an na? Vê pirsê em dikarin bi şêweyek din jî bipirsin? Gelo Erdogan û hevalên xwe dixwazin rejîma îro biguherin? Armancek wan wisa heye?

Çend meh berê di rojnameya Milliyetê de nûçeyek belav bû. Gelek balkeş bû! Mirovekî Erdogan, wêneya Erdogan bi generalan re bi hevre li ser caw dabû çêkirin û li bajarê wan (li Rîze) daliqandibû. Hin endamên AKPê aciz bûne ku wêneya Erdogan bi generalan re bi hevra hatîye daliqandin.

Tişta herî girîng di pirsa demokratîzekirina Tirkîyeyê de jî ev noqte ye. Hêza ku li pêşiya prosesa demokrasiyê asteng e, general in. Ew xwe xwediyê rejîma Tirk dinirxînin. Zagona bingehîn û hin yasayên din jî erkê parastina rejîmê daye artêşa Tirk.

Desttêwerdanên ordiya Tirk ser siyasetê tên zanîn. Wan sê caran dest dan ser hukm û gelek caran jî bê ku bi aşkere dest bidin ser hukm, bi rêyên din Hukûmetan, serokwezîran, wezîr û burokratên bilind yên girîng dane guhertin.

Li welatên demokrat artêş di bin emrê sivîlan de ne. Li Tirkîyeyê rejîm/dewlet di bin destê artêşê de ye û sivîl ji generalan ditirsin, bê generalan nikarin gav bavêjin.

Li pêşiya çareserkirina doza Kurd jî astengiya sereke artêş e. General di pirsa Kurd de bi taybetî hesas in û vê pirsê wek perçekirin û dawî anîna dewleta Tirk dinirxînin. Ew nahêlin dewlet demokratîze bibe, di her fersendî de astengiyan derdixin jiber ku difikirin dê Kurd jî ji van mafan îstîfadeyê bikin û Tirkîyê perçe bikin. Ev mejiyê generalên Tirkan e. Siyasetvanekî eger li ber vî mejiyî serê xwe dayne, nikare dest bide rejîma Tirk. Helbet gûherînên biçûk ku çêbûne baş in, lê ev gav nikarin rejîmê bigûherînin. Vêca heta rejîm di bin vesayeta generalan de bimîne, li Tirkîyê demokrasiyek li gor pîvanên Ewrûpiyan pêk nayê.

Erdogan û hevalên wî guherînan dixwazin, lê bi qasî ku bi kêrî wan were. Ji wê û pê de „demokratbûna" Erdogan û hevalên wî qet namîne. Hele ji bo pirsa Kurdan ew tucarî generalan aciz nakin, rejîmê aciz nakin, berevajî ew jî dê bikarin generalên xwe re bibin yek. Jiber ew jî li dijî doza Kurdistanê ne.

Ji bo vê yekê divê tevgera Kurd li ilacê xwe bigere, xwe bi hêz bike û bi xebat û hêza xwe xwe li ser rejîma Tirk ferz bike. Ji Kurdan re yekîtî û ser û programeke zelal û hevbeş gerek e. Em berê xwe bidin vê rastiyê. Pêwist e demokrasiyê û Kurd û Kurdistanîtiyê em bihêz bikin.

Ji peyama Kurd

Têbiniyek kurt ji bo Mamoste Emîn Akbaş

Mamoste Emîn Akbaş ji Peyama Kurd re nameyek rêkiribû. Me ew name wekî gîhaye destê me, bê kurtkirin, di hejmara bihûrî de weşand.

E. Akbaş rexne li me digre û xwe aciz dike, bê çima em cîh didin rexne û nêrînên li dijî A. Ocalan. Dibêje eger hûn di vê rê de îsrar bikin, ezê bêjim „xwezî bi Tirkîya Hurriyetê û ne bi Kurdiya we". Ev hevok, bêguman ji bo mamosteyekî dersa zimanê kurdî dide, bêtalihiyek mezin e!

E. Akbaş dibêje, qaşo em sixêf û dijûnan didin. Yek hejmarek Peyama Kurd ketiye destê wî û ew bi lez û bez gîhaye vê baweriyê!

Me prensîbên weşana xwe hêj di destpêkê de diyar kiriye. Em ne li gel sixêf û dijûnan in. Ev ne karê me ye. Di nivîsa birêz Laleş Qaso de çend gotin derbas dibin ku dikare wek çîr bên qebûlkirin. Xwezî nebûya, dê baştir bûya. Dibe ku niha hin xwendevanên me bêjin, kurq A. Ocalan çi tê devê wî dibêje, welatê me re "kerxane" got, ma Laleş Qaso çend gotin nivîsiye dinya xira dibe? Na dinya xira nabe, lê em naxwazin kesên wekî birêz Laleş Qaso û rojnameya kurdayetiyê bikeve sewiya wî kesî! Baştir e em xwe ji van tiştan dûr bihêlin. Em dikarin bi bîr û baweriyên xwe yên ku em ji wan piştrast in, Kurdan serwext bikin, şiyar bikin.

Li aliyê din divê kesên wekî Mamoste E. Akbaş jî rexneyên fikrî wek dijûn û sixêf yekser reş nekin. Wek mînak hatiye gotin nêrînên Apo wekî jahr in. Ev ne sixêf e, ev ne dijûn e. Ev tarîfek e, navlêkirin e.

Birêz E. Akbaş, em naxwazin li vê derê dûr û dirêj bi nêrînên A. Ocalan ve dakevin. Ji roja hatiye girtin û heta bi îro vî kesî çi gotiye, nivîsiye tê zanîn.

Em werin ser gotinên wî yên herî dawî (hevdîtinên wî ya roja 05.01.2005 bi parêzerên xwe re). Ew carek din bi aşkere dijminahiya destkeftiyên vî miletî li başurê Kurdistanê dike. Aşkere aşkere dixwaze gerîlayên ku li Kurdistana azad in, bera ser hêzên Hikûmeta Kurdistanê bide, dixwaze şer derkeve, Kurd Kurd bikuje. Mêrik dibêje min heta nuha ev kar kir, nehişt dewletê daynin. Lê PK-Kyîyên îro bêxêr in, bi kêr nayên, rola xwe nalîzin.

Vêca gelo ev nêrîn ne jahr in Mamosteyê hêja?

Digel hin hevokên di nameyê de ku em layiqê mamosteyekî zimanê Kurdî nabînin, cardin jî em spasî nameya birêz Mamoste Emîn Akbaş dikin û hêvîdar in bi hevra di diyalogê de bimînin.

Impressum

Xwediyê Rojnameyê
Peyama Kurd Verlag
Peyama Kurd
Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn / Germany
Fon: +49 (0228) 18 00 654
+49 (0228) 18 00 655
Faks: +49 (0228) 18 00 656
www.peyama-kurd.com
info@peyama-kurd.com

Redaksiyon
Kurmanciya Jorîn:
Fadil Özçelik (Editore Bakur, fö),
Sirwan Hecî Berko (Editore Rojava û Diaspora, shb),
Silêman Aldxanî (sa), Z. Pirkemal (Magazîn û behnvedan zp)

Kirdkî (Zazakî):
Seyîdxan Kurij (Editor, sk)

Kurmanciya Jêrîn:
Dana Alî, Venus Faiq, Simkan Aziz,
Nizar Caf, Cotyar Darfirqs, Mansur Sidqî,
Mustafa Chuartaiy

Peyama Kurd ji mafê xwe dibîne, ku nivîsên jê re têne şandin, kurt bike. Ew ji aliyê rêziman û rastnivîsînê ve di serastkirina berheman de azad e. Peyama Kurd berhema ku jê re tê şandin û berê li cîyekî din hatibe belavkirin, nawêşîne.

Astengiya pêş demokrasiyê û azadiya gelê Kurdistanê Kemalîzm e!

Dezgehên resmî yên hiqûqî û siyasî; partî û hikûmet heta ku di çarçoveya vê „Pirtûka sor“ de bimînin xwediyê mafê hebûnê ne, gava ku zincîrên xwe dişkînin û ji çerçoveya ji wan re hatiye xîz kirin derdikevin, an rastî darbeyek eskerî dibin an bi rê û metodek ji çav tirsandinê bigirin heta jarkirinê, ji cîh û misyonên xwe dibin.

Di „Pirtûka sor“de eşkere dibe ku „Xwediyê“ dewleta Tirk kî ne û ev „Xwedî“ ji bilî xwe ji tu kesî bawer nakin, li Tirkiyê herkes tê kontrol û teqîb kirin ku bi zimanekî psîkolojîk dikare navê „Paranoyak dewlet“ jî lê bibe. Niqteyek din ya balkêş ew e ku di beşa yekem xala çaran de tê nivîsandin ku ev belgeya ku otoriteya siyasî ji dest hikumeta digire (ku ji aliyê gel ve hatiye hilbijartin ango hiqûqî û meşrû ye) û dide dest hêzên „ne xuya“ ji aliyê Komisyona wezîran ve hatiye testîq kirin.

„Pirtûka sor“ ango „belgeya stratejîk ya ewlekariya hundurî“ ji pênc beşan pêk tê. Beşên ku hikûmet û hiqûqa resmî nikare midaxele bike wiha tên bi rêzkirin:

Beşê yekem: Hîmên giştî

Beşa duyem: Hêmanên (unsûr) tehdîda hundur û nirxandina faktorên mayin yên ku bandorê li ewlekariya hundur dikin

Beşa sêyem: Stratejiya ewlekariya hundurîn

Beşa çaremîn: Rêxistinkirin û çalak kirina rêvebiriya ewlekariya hundurîn

Beşa pêncemîn: Xisûsên din

Hîmên giştî

Ev beş ji pênc xalan pêk tên ku wiha bi rêzdibin: 1. Armanc, 2. Wergirî, 3. Pênas, a) Ewlekariya millî, b) Siyaseta ewlekariya millî, c) Hêza millî, d) Berjewendiyên millî, e) Beka, f) Tehdîdên ji hundur, g) Tehdîdên ji derve, h) Ewlekariya hundurîn i) Çalakiyên xeraker (yikici), j) Çalakiyên parveker, k) Çalakiyên paşverûtî (îrtîcayî), l) Hindikayî (kêmnetewe), m) Bertilxwarin (yolsuzluk).. Di bin her xalê de manaya ev sernivîsan yek bi yek nav lê dibe û tê ragihandin. Di beşa yekem de Armanc, di çarçoveya siyaseta ewlekariya hundurîn ku bi siyasî belgeya ewlekariya millî ya Komara Tirkiyê hatiye eşkere kirin, hazirkirin, birêvebirin û bikaranîna hêmanên hêzên millî tê nîşan kirin.

Hêmanên tehdîda hundur..

Di vê beşê de dûr û dirêj analîza siyasî û aborî ya herêmî û navnetewî tê kirin û digihêje encamê ku gelek welat û cîranên Tirkiyê çav bera dewlemendiyên Tirkiyê û rewşa wê ya stratejîk dane û ji ber vê yekê jî biryara parvekirina Tirkiyê dane. Çi legal, çi illegal her karekî politik ku bi çi rengî û armancê dibe bila bibe bi destên hêzên dixwazin ku Tirkiyê parve bikin, tên kirin. Ji ber vê yekê, ji herkesî jî bêtir yên Kurdan, hemû dezgehên demokratik û sîvîl peyayên dewletên dijminê Tirkiyê ne û divê di bin kontrolê de bin ku bi rastî jî bi awayekî dijwar tên kontrol kirin. Tê diyar kirin ku siyaseta îstîkrarsizkirina Tirkiyê wê di salên pêşiya me de jî berdewam bikin û pêwistiya stratejiyek ewlekariya hundur îşaret dike ku projeya Leyla Zana ya „Demokratîk Toplum Hareketi“ ango tirkkirina Kurdan bi destê „kurdan“ tîne bîra mirov. Ji bo serketina projeyên dewletê giringiya rêxistinên sîvîl û medya tê eşkere kirin ku sedemên teslîmîyet û bêdengiya medya tirk jî radixe ber çavan.

Belge, dîroka têkoşîna gelê Kurd bi 200 salî girê dide û eşkere dike ku îdeolojiya rêxistinek Kurd çi dibe bila bibe ji bo armanca ku li ser „erdê Tirkiyê“ û li Iraq, Iran û Sûriyê li herêmên ku Kurd piranîne, damezirandina dewletek Kurdistan ya serbixwe û yekbûyî ye. Ji ber vê yekê divê çalakiyên rêxistinên Kurd ji nêzîk ve bê taqîb kirin. Belge dubare dike ku daxwazên Kurdan yên demokratîk wek naskirina nasnameya Kurd ne samîmî ne û hemû ji bo damezirandina Kurdistanek serbixwe gavên taktîkî ne ku belkî ev jî bêdengiya hikumeta Erdogan radixe ber çavan.

Stratejiya ewlekariya hundurîn

Ji bo ûnsûrên tehditên hundurîn hin tedbîrên divê bên stendin wiha bi rêz dibin:

1. Çavkaniyên aborî yên rêxistinên terorîst bên tespît kirin û divê tedbîrên netewî û navnetewî bên stendin.
2. Li herêmên ku ji aliyê terorê hessas in divê xizmet bi personelên hatiye perwerde kirin bidomin.
3. Girtiyên ji ber sucên terorê di hepsê dene divê neyên efû kirin.
4. Li himber çapameniyê divê tedbîrên îdarî û qanûnî bên stendin.
5. Divê tu belgeyên netewî û navnetewî ku çalakiyên parvekir meşrû dikin çênebin û îmze nebin.
6. Divê bêhewldan ku heyetên biyanî yên ku herêmê ziyaret dikin bi wezîfedarên resmî re hevdîtinan pêk bînin.

Dewletek Pro-Tirk û dewletek Anti-Kurd du rûyen „Dewleta Yekhejmar“ ya Komara Tirk in

Naif Bezwan

Li Tirkiyê, ne îro desthilatdariya hiqûqê (the rule of law) heye, ne jî do hebû. Dewleta Tirk bi xwe, ji dema awakirina xwe heta îro, xwe wek dewletek kemalperest (kemalist) an jî Tirkperest (Türkçü) binavdike û herweha wê rastiyê di Zagona xwe ya bingehî (anayasa) de jî nivîsandiye. Li gor xala 4 ya Zagona bingehî doktrîna Ata-tirkperestiyê (Atatürkçülük) “ne dikare bê guhertin, ne jî guhertina wê dikare bê pêşneyazkirin”. Ji xwe tê zanîn ku, di nav wan “prinsîp û şoreşên Kemalperestî” de demokrasî an jî desthilatdariya hiqûqi wek peyv jî derbas nabin.

Ji ber vê, hebûn an jî tunebûna „Pirtuka Sor“ bi serê xwe tiştekî mezin îfade nake. Lê belê, dema ku mirov sazî û konseptên wek „Pirtûka sor“ „Bernama Siyasî ya Ewlekariya Netewî” (Milli Güvenlik Siyaset Belgesi), „Dewleta Kûr“,”Dewleta Yekejmar” (Tekil Devlet), “Daîra şerê Taybetî“ (Özel Harp Dairesi), „Konseya Ewlekariya Netewî“ „Zagona Bingehî ya Veşartî“ „Xetên Sor”, û herhewa peyvên wek “Nasmane Bilind ya Tirk”, „Konsepta Kerkûkê“ hwd. bi hevre, ango di nava kontekstekî giştî de mêze bike, tablo hin bêhtir zelal dibe. Hebûna wan bi hevra rastiyekê derdixe holê, ku mirov dikare bi peyva hiqûqnas û zanyarê siyasetê yê Alman Ernst Fränkel (1898-1975) wek hebûna “du dewletan” (Doppelstaat) li Tirkiyê binav bike: Yek ji wan “Dewletek normal” (Normenstaat= Dewleta Norman) ya din jî “dewletek awarte” (Massnahmenstaat= Dewleta Tedbîran)

Wateya wê ji bo Kurd û Kurdistanê ew e: Hingê ku mafên Kurdan yên siyasî û netewî bên înkarkirin, ne çavkaniyên “Pirtûkên sor û reş”, ne jî pêwistiya metodên veşartî ji holê ranabin. Ji ber ku, li nav sînorên Tirkiyê yên siyasî de di eslê xweda du netewên sereke (bê guman milletên din jî hene), ango netewa Kurd û netewa Tirk dijîn û ji ber ku mafên Kurdan yên netewî ji aliyê Komara Tirk ve nayên qebûlkirin, pêwistiya “du dewletan” ji rojevê dernayê: Dewletek pro Tirk û dewletek antî-Kurd. Dewleta ji bo Tirkan baş-xirab li ser normên “hiqûqî” birêve dibe û dewleta li dijî Kurdan û gelên din li ser bingeha tedbîrên tunekirinê, rewşa awarte û îdeolojiyek nijadperest hatiye avakirin û tê meşandin.

Digel wî jî, di çarçewa endametiya Yekîtiya Ewrûpa de rayedar û desthilatdarên Tirkan naxwazin “dewleta li dijî Kurdan” ji holê rakin, tenê dixwazin dewleta ji bo Tirka sererast bikin.

Ji bo Kurdan - û li gorî Hiqûqa navnetewî - sê opsiyon hene ku ew “dewleta awarte” ya ku li ser bingeha dijitiya wan hatiye avakirin ji holê rakin: Federasyonek ji du netewan li Tirkiyê opsiyonek e, avakirina dewletek serbixwe an jî beşdarbûna nav dewletek din li ser bingeha îrada xwe ya azad, du opsiyonên din in.

Sîstema dudewletiya Tirk bi destê Rojavayiyan hat avakirin

Ahmet Zeki Okçuoglu



Sistema dudewletî ya Tirk bi desthilatdariya Komela Ittihad-Terakkiyê destpê dike. Dewleta Osmanî devletek pir netewî û pir oli bû. Ittihadiyan dixwestin wê bikin dewletek yek netewî û yek olî: Dewleta Tirk/Islam. Wiya jî bi xwezayî ne bi naskirina mafên netewan û olan, berawajî bi sergom û tevkujiya wan gelan dixwestin pêk bînin.

Danûstandinên navnetewî rê nedida ku nîjadperestên Tirkan vî karî vekirî pêkbînin. Ji ber vê yekê jî ji boyî vî karî wan di bin dewleta eşkere de devletek vêşartî ava kir.

Dewleta veşartî ya Tirkan bi avakirina „Teşkilat-i Mahsusa“ (Rêxistina Taybetî) destpê dike. Teşkilat-i Mahsusa“ bi dest û bi pereyên Elmanan hate avakirin. Teşkilat-i Mahsusa bi qirkirina Ermenan dest bi kar kir. Duv re hêrîşî Kurdan kirin. Duv re jî dora Grêkîyan hat.

Piştî şerê Cihanê yê Yekem ji tirsa Hêzên Hevpeyman nijadperestên Tirkan şûnve gav avêtin. Lê li hemberî gelek tawîz û ruşwetan Hêzên Navnetewî li cihê peymana Sewrê, bi nijadperestên Tirkên Kemalist re peymana Lozanê mor kirin û bi biryareke navnetewî meşruiyeta nijadperestiya Tirkan hate pejirandin û sîstema du dewletî li hemberi Kurdan careke din ji nuh ve hate avakirin.

Sîstema dudewletî bi destûra bingehîn ya ku bi derbeke eskeri (1960) kete rêvebiriyê de, bi navê Saziya Ewlehiya Netewî (Milli Güvenlik Kurulu) bu yasayî. Sistema SENê (Saziya Ewlehîya Netewî) bi destûra bingehîn hatibû avakirin lê ev sazî li gora Yasaya Saziya Ewlehîya Netewî karê xwe bi peyreweke veşartî (gizli yönetmenlik) karê xwe dimeşand.

Sîstema SENê icar jî bi destûra NATOyê hatibû avakirin. Ber vê yêke jî tu car ji aliyê rojavayiyan ve ev sistem nedemokratik bi durustî nehate rexnekirin. Di pêvajoya endamtiya dewleta Tirkiyayê ji bo Yekitiya Ewrûpayê bi makyajeke basit (sekreterê Gisti berê esker bû, niha ji sivîleki mêji esker e) ev sîstem carek din ji aliyê rojavayîyan (û li gorî pîvanên Kopenhagenê) hate teyîd kirin.

Sîstema dudewletî wekî mirovekî durûyî ye. Li alîyekî bi rûyeke devbiken xwe diyar dike, li aliyê din bi devbixwîn xwe diyar dike; lê mixabin hinek siyasetmedar û rewşenbîrên Kurd hê jî naxwezin vê rastiyê bibînin.

11.01.05

www.kurdistan.org

Endamê Bizava Referandûmê li Kurdistanê Helkewt Ebdula:

Ji sedî nodê kurdan serxwebûnê dixwazin

Sê endamên Komîteya Bilind ya Referandûmê li Kûrdistanê, li Almanya bajarê Bonnê di 8 ê mehê de, semînerek li dar xistin. Me hevpeyvînek li gel endamê Komîteyê Birêz Helkewt Ebdula çêkir. Di derbarê xebata xwe de wiha axivî.



Wêne: Peyama Kurd

Seyîdxan Kurij, Fevzî Etrûşî , Fadil Özçelî û Helkewt Ebdula

Peyama Kurd: ***Berî her tiştî em dixwazin bizanibin ramana damezirandina Bizava Referandûmê çawa li gel we peyda bû, û çawa hûn gihiştin wê baweriyê ku referandûm pêwîstiyeke?***

Helkewt Ebdula: Piştî têkçûna rejîma Seddam Hisên, û çêbûna Civata Birêvebirina Iraqê, em wek kurdên başûrê Kurdistanê ketin nava hinek dûdiliyan. Tirsa me ji çend xalan hebû, ez dikarim wan xalan wiha bi nav bikim.

Xala yekemîn: Gelê Kurdistanê pê hesiya ku Emerîka û hevalbendên wê di derbarê pirsa kurdan de ne xwediyê projeyekê ne û ew li ser Îraqeke yekgirtî kar dikin.

Xala diwemîn: Opozîsyona berê ya Îraqê jî di meseleya federalîzmê de ne xwedî nerîneke zelal in. Ew dema behsa federaliyê jî dikin, behsa federaliyeke li ser bingeha coxrafî nakin. Ew dixwazin federaliyê li ser bingeha wîlayetan çêbikin.

Xala sêyemîn: Birêvebiriya siyasî ya kurdan PDK ûYNK jî bêhtir ber bi Îraqîtiyê ve çûbûn. Van her dû rêkxistinan jî mîna Emerîka û Îraqiyan fikir dikirin û yekgirtina Îraqê diparastin.

Ronakbîrên kurdistan yên serbixwe, ev pirsgirêk dîtin û ji bo çareseriyê dest bi hevdîtin û danûstendinan kirin.Di 14.07.2003 de komeleyeke ronakbîrên kurd, bi navê "mafê me ye eger em dudil bin"belavokek belav kir. Di naveroka wê belavokê de wiha hat gotin, "dudiliyên me hene û pêwîste li Kurdistan referandûmek were pêkanîn. Di vê referandûmê de, mafê gelê kurd heye bibêjin, ka ew çi dixwazin. Ew dixwazin li gel Iraqê bijîn yan dixwazin serbixwe bin". Bizava referandûmê li bajarê Silêmaniyê hate damezirandin û li tevayê navçeyên Kurdistanê belav bû.Li Xaneqîn, Silêmaniyê, Kerkûk, Hewlêr, Musil û Dihokê komîte çêbûn. Di 23 û 24 ê meha dawîn ya sala 2003 an de kongreya damezirandinê li paytext Hewlêrê hate li dar xistin. Di dawiya meha yekemîn de, me dest bi komkirina îmzeyan kir û di nava heftiyekê de me milyonek û 750 hezar îmze kom kirin. Li derveyî welat jî nêzîkî 47 hezar û 800 îmze hatin kom kirin. Me xwest em wan îmzeyan di CD an de qeyd bikin û bigihînin cihên pêwîst. 10 CD jê derketin. Me ew CD li gel xwe anîn vir ji bo ku em wan pêşkêşî dam û dezgehên Yekîtiya Netewan bikin. Em çûn Yekîtiya Netewan li Newyorkê û Komîteya Bilind ya Mafên Mirovan li Cenevrê. Me îmzeyên xwe pêşkêş kirin û niha jî em li ser rê ne ku îmzeyên xwe bibin li Brukselê pêşkêşî Yekîtiya Ewrûpa, Sosyal Enternasyonal û hikumet û perlemanê hemû welatên cîhanê bikin.

Hûn çûn serdana Yekîtiya Netewan li Newyork, we çi ji wan daxwaz kir?

Helkewt Ebdûla: Me ji wan re got ku ji destpêka sedsala borî ve gelê kurd dibin zorê de ye û bê lêpirsîn, ew bi Iraqê ve hatine girêdan û Kurdistan bûye beşek ji Iraqê.

Me ji wan re got ku gelê Kurdistanê dixwaze bi riya referandûmê çarenûsa xwe bixwe diyar bike. Me got, kurdan di 13-14 salên borî de, îspat kirin ku dikarin bixwe xwe birêve bibin.

Her wiha me diyar kir ku îro li Iraqê, kurd ji ber kurdbûna xwe têne kuştin. Ji ber vê yekê em ne amade ne careke din di çarçoveya Iraqê de bijîn û karesatên ku bi serê me hatine careke din dûbare bibin.

We bi tenê milyonek û 750 hezar îmze komkirine, kesên ku îmzeyên wan nehatine girtin, ew li dijî referandûmê ne, yan jî we nikarîbû hûn xwe bigihînin wan.

Helkewt Ebdûla: Milyonek û 750 hezar îmze, yên wan kesane ku mafê wan û dengdanê heye. Li başûrê kurdistanê, ji 5 heta 6 milyon Kurdistanî hene. Ji vê hejmarê 2 milyon û 600 hezar kes dikarin dengên xwe bikar bînin. Me ji van 2 milyon û 600 hezar kesî, milyonek û 750 îmze wergirtin e. Ji sedî 65 ê gel dixwazin ku referandûm çêbibe. Li Hewlêr di sibata sala borî de, di dema komkirina îmzeyan de teqîneke mezin çêbû û bandoreke mezin li ser karê me kir. Di wê demê de mirov ditirsiyan ku derkevin derve. Divê ez bibêjim ku li Bexda û derdora wê jî milyonek- milyon û nîvek kurd hene lê îmzeyên wan jî nehatine wergirtin. Ev îmze bi tenê yên kurdên li Kurdistanê ne û di dema teqîna li Hewlêrê de, bi zehmetî hatine kom kirin.

Wê ev karê we çi bandorê li ser rêkxistinên kurdî bike?

Helkewt Ebdûla: Ji bo ku em di karê xwe de serkevtî bin, pêwîstiya me bi piştgiriya rasteqîn û praktîkî ya rêkxistinên kurdî heye. Eger encamê hilbijartinên Iraqê ne li gora berjewendiyên kurdan bin, birêvebirên kurdan gotine ku ewê daxwaza raya gel bikin û bi riya referandûmê pirsgirêka gel çareser bikin. Em niha bi dû awayan kar dikin. Serok û birêvebirên kurdan li aliyê siyasî kar dikin û em jî li aliyê civakî. Em di wê baweriyê de ne ku raya gel ji sedî 90 li gel serxwebûnê ye. Diyare ku hêzên siyasî yên kurd bi sedema hinek têkiliyên siyasî nikarin ji federalîyê zêdetir bixwazin.

Endamên Komîteya Referandûmê çi dixwazin, federalî yan jî serxwebûn?

Helkewt Ebdûla: Ez bixwe ji bo serxwebûnê kar dikim û dengê xwe didim serxwebûnê. Referandûm, bizaveke demokratîke ûem dixwazin ku serok û rêberên kurdan jî werin ser fikra me û vê yekê bipejirînin. Em naxwazin şerê rêkxistinên xwe bikin û xwe ji wan dûr bixin. Em dixwazin bi danûstendinê bi wan bidin fêmkirin ku federalî ne berhemeke baş e ji bo gel. Gelê kurd sexwebûnê dixwaze. Em bextewarin ku siyasetmedarên kurd dijayetiya me nekirine û di aliyê manewî û maddî de alîkariya me jî kirine, ji bo ku em di karê xwe de berdewam bin. Di rastiyê de ew jî serxwebûnê dixwazin, lê belê weke partiyên siyasî mecbûrin li gora siyasetê tevbigerin û ew ne weke me serbixwe ne ku her tiştî bikin û bibêjin.

Li Iraqê di rastiyê de her du gel ji hev qetiya ne, di aliyê psîkolojî û çandî de jî wiha ye, lê belê ereb li dijî federaliyê ne, hûn vê yekê çawa dibînin?

Helkewt Ebdûla: Li gora min ji nû ve damezirandina Iraqê ne karekî hêsan e. Eger îro bikaribin ji bo çend salan Iraqê damezirînin jî, ewê careke din weke Yûgoslaviya ji hev bikeve û wê karesatên mezin werin serê wê. Gelê kurdistanê li başûr, ev 12-13 sal in ku bi zimanê kurdî dixwînin, bi azadî dijîn û dîroka xwe bixwe çêdikin. Di nava me de 5-6 nifşên ku nikarin bi erebî biaxivin hene. Tu çawa dikarî van nifşên ku bi erebî nizanin, mecbûr bikî ku li gel ereban di Îraqeke yekgirtî de bijîn. Siyasetmedarên me îro ji neçarî doza federalîzmê dikin. Li Iraq ev 83 sal in ku gel bi ramaneke dîktatorî hatiye perwerde kirin. Li başûrê Kurdistanê ev 14 sal in ku xelk bi azadî tevdigere. Tu çawa dikarî van her dû modêlan tevlîhev bikî ku ew li dijî federaliyê ne û ême jî mafê me û serxwebûnê heye. Bi raya Iraqiyan, mafê kurdan û federaliyê tune ye ji ber ku Iraq perçeyek ji niştîman û xaka ereba ye. Ji ber vê yekê ez dibêjim, ne gengaz e ku rewşa Iraqê baş bibe.

Hûn kengî difikirin referandûmê bikin?

Dû şêweyên referandûmê hene. Referandûma fermî û ya nefermî. Em hatine vir ku hêzên navnetewî bibînin û bi wan bidin pejirandin ku ew werin referandûmeke fermî li Kurdistanê çêbikin. Ji bo ku UN were kurdistanê jî pêwîste em piştgiriya hêzên navnetewî wergirin. Em nizanin kengî referandûma fermî çêdibe. Emê bixwe di roja hilbijartinên Iraqê de, referandûmeke nefermî çêbikin. Li kêleka cihên dengdanê yên ji bo hilbijartinên Iraqî, emê vê pirsê ji gel bikin: "Tû Iraqeke yekgirtî dixwazî an jî Kurdistaneke serbixwe?" Em hêvî dikin ku bi vî awahî 2 milyon û nîv deng kom bikin. Emê her wiha îza tiliyan jî bigrin. Hevkarên me li NCO wê werin çavdêrî û piştgiriya referandûmê bikin. Her wiha wê di roja hilbijartinan de tevayê çapemeniya cîhanê li wir amade be. Ev yek ji bo me derfeteke mezin e ji bo em karûbarê referandûmê ji wan re şîrove bikin û têxin rojeva wan. Ev referandûma nefermî, piştî hevdîtinên ku me li Newyork û Cenevrê kirine ji bo UN dibe weke delîl û îspatekê.

Şert û merc bo kurdistaneke serbixwe amade ne?

Helkewt Ebdûla: Em bixwe şertan amade dikin. Dem û dewran hatiye guhertin, her tişt global bûye. Li Ukraîna dema ku rê li ber demokrasiyê hate girtin, gel dakete kolanan. Heger em jî bibêjin em naxwazin li gel Iraqê bimînin û kurdên bakur, rojhilat û rojava jî bi meş û xwepêşandanan piştgiriya me bikin, emê şertên xwe amade bikin. Dinya ji bo me şertan amade nake, lazime em bixwe bikin. Beşekî mezin ji dinyayê ne dostê kurda ne.

Bizava Referandûmê girêdayî partiyeke siyasî ye an na?

Helkewt Ebdûla: Bizava Referandûmê bizaveke serbixwe ye û xwe weke raya giştî dibîne. Herkes dikare beşdarî vê bizavê bibe, lê pêwîste nerînên xwe yên siyasî bixwe re neynin û ferz nekin. Di nava me de endamên tevayê rêkxistinan û kesên serbixwe jî hene. Lê belê em alîkariya tevayê rêkxistinên siyasî û NCO (rêkxistina civaka medenî) distînin. Heta niha tu pirsgirêk di nava me de çênebûne. Ji îslamiyan bigre heta bi çepgiran, em tev ji bo serxwebûnê kar dikin.

Hûn di encam de dixwazin çi bibêjin?

Helkewt Ebdûla: Em bi riya Peyama Kurd dozê li tevayê kurdên her çar beşan dikin ku piştgiriya vê xebatê bikin. Ev dikare bibe modêlek ji bo bakûr, rojhilat û rojavayê kurdistan jî. Ev rêbazeke aştîxwaz e ji bo çareserkirina pirsgirêka kurdan.

Hevpeyvîn: Fadil Özçelik/Seyîdxan Kurij

Serokê PKK A. Ocalan:

"Nijadperestên Kurd li başûrê Kurdistanê dewletek siyonîst ava dikin"

Ocalan: " Min ji serokwezîrê Tirkiyê rica kiriye ku li himberî van bûyeran helwest û tedbîran bistîne lê serokwezîr bersiva nameyên min nedane. Serokwezîr çima bersiva nameyên min nade?"



PK/AvestaKurd - Serokê PKK Abdullah Ocalan di hevdîtina xwe ya 05.01.2005an a bi parêzeran re, li Başûrê Kurdistanê hewldana avakirina dewletek Kurdî wek avakirina siyonîzma duyemîn nirxand û li dijî avakirina Kurdistanê derket. Ocalan dibêje " min ji serokwezîrê Tirkiyê rica kiriye ku li himberî van bûyeran helwest û tedbîran bistîne lê serokwezîr bersiva nameyên min nedane. Serokwezîr çima bersiva nameyên min nade?" Ocalan weha didomîne: " Artêş qels dibe, gelê Kurd qels dibe, Kemalîzm zeîf dibe lê axayên Kurd û hêza Amerîka qezenc dikin. Li Başûrê Kurdistanê avakirina dewletek Kurdî wê li dijî Tirkiyê û Îranê bê bikaranîn. Heger milletperestên Kurd bibin dewlet ewê li dijî berjewendiyên Tirkiyê û Îranê derkevin. Ez li dijî vê derketim, lê belê yên me zeîf dimînin."

Bêguman ev ne cara ewil e ku Ocalan li dijî berjewendiyên Kurd û Kurdistanê derdikeve. Li gor wî divê dewletek Kurd ku berjewendiyên Tirkiyê dixe tehlûkê neyê avakirin. Mebesta Ocalan bi " lê yên me zeîf dimînin" eve ku dewleta Tirk zeîf û bêdeng dimîne. Bi vê gotinê dixwaze artêşa Tirk bêdeng nemîne û êrîşî Kurdistanê bike û nehêle Kurdistanek li Başûr ava bibe.

Bahattin Karakütük intîhar kir

Xebatkarê televîzyona Roj TV Bahatttin Karakutuk di 10.01.05an de li Îskoçya, li bajarê Glasgov, intîhar kir û dawî li jiyana xwe anî.

Ev demeke dirêje ku Karakutuk, li Tirkiyê û li Ewrûpa di nava medya û çapemeniya Kurd de weke rojnamevan dixebitî. Ji sala 1995 de ew li Ewrûpa dijiya û ji rojnameya Ozgur Politika re weke nivîskarê quncikê dinivîsand. Heya roja koçkirina xwe wî di televîzyona Roj Tv de programa Rojnamê pêşkêş dikir. Karakutuk ji televîzyona Med-Tv li Ewûpa dest bi xebata televîzyonê kir.

Ew di sala 1966 de li Tirkiyê, bajarê Mêrsînê ji dayîk bûbû, zewicî û bavê du zarokan bû.

Em ji malbat, dost û hevalên wî re sersaxiyê dixwazin

Kurdên li Atîna Mahabad bi bîranîn

Bavê Arî-Atîna

Kurdên li Atina di 8ê mehê de bi şevekê 59 saliya Komara Mahabadê bi bîranîn. Di şevê de axaftinek bi kurdî û bi yewnanî ser navê ku şev li darxistine hat kirin. şev ji aliyê YNK, PDK-Bakur, PSK, PRK-R, PDK-Îran, Yekitî-Sûriye û Komela Xwendevanên Kurd ve hat amadekirin. Koma Nîştiman û Koma Jiyan û dengbêjên me bi bernameyek dewlemend bi 700 kesên beşdarî şevê bûn re demek xweş û bi coş derbas kirin.

Koçka Qamişlo êrîşî Şivan Perwer kir



Hefteya bihurî di koçka Qamişlo de hinek kesan bi sixêf û gotinên ne Kurdayetî û bêehlaqî êrîşî hunermend Şivan Perwer kirin. Helbet rexnegirtin mafê herkesî ye. Lê rexnegirtin, sixêf û xeber ji hevdu cuda ne. Eşkere ye ku ew kesên bi vî islûbê maf didin xwe êrîşî şexsiyetan bikin, ev herdu helwestan bi zanebûn an bê ku hay jê hebe, tevlihev dikin. Kurdekî rewşenbîr û welatparêz divê berî her tiştî mirov be û mirovatiya xwe û kesên mayîn nexe bin lingan. Em sixêf û bêedebiya ku li dijî hunermendê Kurd şivan Perwer hatiye kirin şermezar û rûreş dikin û hêvîdarin ku wê Kurd li hêjayiyên xwe xwedî derkevin.

Ibrahîm Güçlü:
Em dixwazin ruhê 1969 an dîsa vejînin

9ê mehê, di televizyona Tirkiyê FLASH TV, di bernama Alternatîfê de li ser pirsa Kurd geneşiyek çêbû. Çend profesorên Tirk, mebusê kevn yê Dêrsimê Kamer Genç, nivîskar Mehmet Metiner û rewşenbîr û Siyasetmedarê Kurd Ibrahîm Güçlü tev li programê bûn. Ji ber ku bername di navKurdan de pir tê nîqaş kirin, em li ser vê bernamê bi Ibrahîm-Güçlü re peyivîn

Peyama Kurd: ***Tu çawa tev li bernama „Alternatîfê" bûyî?***

Ibrahîm Güçlü: Bernama „Alternatîfê" berê li ser pirsa Kurd du bername çêkir. Ji alîyê Kurdan mebusê kevn yê DEP ê Sirri Sakik û serokê kevn yê HADEP ê Murat Bozlak tev li bernama duduyan bûn. Ji ber ku ewana doza Kurdîstan neparastin, gel gelekî xemgîn bu. Li ser wê min telefonî rojnamevan birêz Onkibar kir û min got ku herdû alî ji takîye dikin. Piştre ewana li ser îlana parîsê min vexwendin ji bo bernamê. Min berê got; divê formata bernamê were guherandin. Divê cend pisporên Tirk ku bikaribin li ser pirsa Kurdistan bi zanistî munaqeşe bikin tev li bernamê bibin. Lê ewana Kamer Genç û Mehmet Metîner anîn. Ez çûm studyoyê, xebera min ji van herdûya bû. Min ji bo Kamer genç îtîraz kir, çimkî min dizanîbû ewê sewiya bernameyê daxîne. Lê êdî dereng bû. Birêz Abdulmelik Firat jî ji ber nexweşîya xwe nikaribû tev li bernamê be.

Ûsa xuya dibû ku Kamer Genç ji ber ku nehêle tu qisebikî tev li bernameyê bûbû, di vê derheqê de tu dikarî çi bejî?

Ez bawerim ji ber ku bername enteresan be Kamer genç anî bûn. Xuyabû ku Kamer Genç di derheqa Kurdistan de tu tişt nizane, lê dewleta Tirk ji vî alî de bi serketiyê. Ewna hertim Kurd derxistine ber pozê Kurdên welatparêz. Dixwazin bêjin binêre ew jî Kurd e, lê ew tu tişt naxwaze. Li vir tewra Mehmet Metiner pir balkêş bû.

Gava te behsa Federasyonê dikir M.Metîner har dibû. Bi vê bernamê re di derheqa M.Metiner de di serê Kurdan de hin pirs çêbûn. Raya te çiye?

Heta vê rojê min ji usa bawer dikir ku M.Metiner di nav Kurdan de pozîsyonek e. Lê piştî vê bernamê hevalek wî ji min re got; êdî ez bawerim ku M.Metiner mirovê dewletê ye.

Piştî Îmrali M.Metiner çu HADEP `ê û di nav HADEPê de rêça A.Ocalan parast. Gava îstîfa jî kir ragihand ku:" HADEP hin di bin tesîra tevgera azadîxwaza Kurd ya kevneşop de ye, yanî nehatiye ser xeta Ocalan". Di vê bernamê de jî M.Metiner Ocalan wek referans nîşan dida û got binerîn Ocalan ji hemwelatiya Dewleta Tirk re, dewleta uniter re îtîraz nake.

Li hemberî tewra te ku te bi îstîkrar federasyon parast, tewra gel çawa ye?

Min bi sedan telefon girt, min tebrîk dikin. Di vê bernamê de çend 2 tişt eşkira bûn:

Yek helwesta me û Tirkan cîhê ye. Ya duwem di nav Kurdan du xet hene, xeta yekemîn Kurdistaniye û li ser axa Kurdistanê desthilatdariya Kurdan dixwaze; xeta duyem dixwaze Kurdan entegreyî dewletê bike.

Em niha li Kurdistanê dest bi projeyekê dikin. Em dixwazin ruhê 1969 dîsa geş bikin. Çawa bi damezirandina DDKO ya li Kurdistanê çalakîyan destpêkir. Em dixwazin bi daxwaza federasyonê, bi daxwaza mafên xwe yên netewî-demokratîk dest bi çalakîyan bikin.

Em dixwazin tevgerek sîvîl- demokratîk û meşru bimeşînîn.

Kurd hîn nebûne daxwazên xwe vekirî bînin zimên. Tiştên ku emê li pişt deriyan de di nav xwe de bibêjin, divê eşkira li ber raya gîştî werin îfade kirin. Em projeya demokratîk cumhuriyet rexne dikin, lê divê em li hemberî wê çalakîyan bikin. Kurd gava Tirkek dibînin nikarin daxwazên xwe eşkira bêjin. Divê em ji wê psîkolojîyê xelas bin.



Li Almanya, Kurdistan Tv bi şahiyeke taybetî deriyên studyoya xwe vedike

Almanya - Di 6. salvegera damezirandina Kurdistan Tv de, gaveke nû tê avêtin û ji bo ku bibe pirek di navbera kurdên derveyî welat û welat de, studyoyek li Almanya tê vekirin. Di 17 ê vê mehê de roja duşemê studyoya li Almanya bi bernameyeke zindî dest bi karûbarê xwe dike. Hat ragihandin ku, bernameya şahiyê wê bi beşdariya gelek hunermend û rewşenbîrên navdar bi awayekî zindî were pêşkêş kirin. Berpirsyarê studyoya Kurdistan Tv li Almanya, Xelîl Sencarî di daxuyaniyeke taybetî de jib o Peyama Kurd, da zanîn ku ew dixwazin bi riya vê studyoyê berhemên hunermend û rewşenbîrên kurd bigihînin Kurdistanê û bibin dengê Kurdên li derveyî welat.

www.arsiv

Pirsa Kurdî li Suriyê: Çareseriyeke çawa?

Demokratî li Suriyê dibe garantiya çareseriya Pirsa Kurdî

Kamiran Haco – Swêd



Pirsa kurdî bi giştî pirsa miletekî bindest e, ku welatê wî hatiye dagîrkirin û perçekirin. Çareseriya vê pirsê ya rewa jî bi mafê çarenûsî û avakirina dewleteke serbixwe ve girêdayî ye. Lê belê gewdebûn û pêkanîna vê yekê di jiyanê de ne karekî hêsan e û pir aloz e. Perçebûna Kurdistanê û rewşa wê ya ciyo-siyasî bandora xwe bi giranî li şêweyê çareseriyê kiriye û taybetiyek dayê de. Li gor mercên her perçeyekî çareseriyeke xweser heye, lê akama wan jî li hev heye. Pêşketina li perçeyekî dengvedana wê pir xurt e li perçeyên din. Ango ta radeyeke bilind çarenûsa hemî perçeyan bi hev ve girêdayî ye.

Bêyî ko em li sedeman vegerin û başî-xirabiyan şirove bikin, îro li hemî perçeyên Kurdistanê çareserî di çarçova sînorê wan dewletan de tê dîtin. Armanca Kurdistana sebixwe ketiye sewya diwem û li ba hin rêxistinan nemaye.

Ji ber vê rewşa kurdistanî û taybetiya mercên Rojavayê Kurdistanê û rewşa herêmî û navnetewî, çareseriya Pirsa Kurdî li Suriyê wê di çarçova sînorên Suriyê de be, bi kêmanî di vê dema bê de, ku xuya ye wê ne kin be. Ji bo vê pir giring e ku xwestina miletê kurd ya siyasî zelal bibe û di mijê de nemîne û ev xwestin li gor karînên miletê kurd be. Di vê çarçovê de pêwîst e ku cografiya vî perçeyî berçav bê girtin. Rewş hatiye ku êdî ev yek ji gelê surî û desthilata niha (û ya pê re") bê zelalkirin û gav bi gav mentalîteya wan aliyê vê pirsê yê kurdistanî bibîne. Ji ber van sedeman demokratî li Suriyê dibe garantiya çareseriya Pirsa Kurdî li vî perçeyî (ezmûna Başûr di vî warî de balkêş e).

Demokratî dê çawa pêk bê, ne diyar e. Faktorê derve kare sereke be, lê her hal karekî hevbeş ê hemî hêzên surî ye. Kurd jî bi paraztina kesayetiya xwe ya neteweyî di riya rêxistinên xwe yên xweser de tevlî vî karî dibin. Lê belê riyên din karin hebûna vê kesayetiya neteweyî têxîne tehlûkê. Mêtodên xebatê yên ku cîhan wan îroj dipejirîne, û li gor mercên vî perçeyî ne jî, mêtodên aşitiyane ne, lê ji bo parattina gelê xwe mirov xwe di sînoran de asê nake!!

Mirov tiştekî nû nabêje gava ku mercê sereke ji bo destkeftiyan bike xurtbûna Kurdan. Ji bo ku Kurd xurt bin, pêwîst e yek bin, ango yekîtiya hêzên siyasî. Ev yekîtî gereke ji çarçova belavokan derkeve û ji jêr dest pê bike, ne ku ji jor ve bê sazkirin, li ser bingeha lihevkirina endamên van hêzan bête avakirin. Ev endam jî pêwîst e bi perwerdeke neteweyî bêne avakirin. Hestê neteweyî xurt e rex Kurdan, lê têgihiştina neteweyî qels e û ne gihayî ye. Divê ev hest bigihe asta têgihiştina neteweyî, ku di koka xwe de berpirsiyarî ye û girêdana sereke bi welêt re ye li ser hisabê girêdanên din (olî, êlî, malbatî...), ango her pêwendî û xelekên hebûna mirov dikevine asta diwem bi pîvan bi pêwendiya bi welatê mirov re. Ji bo vê yekê motor divê. Motorê vê xebatê rêxistin in.

Îroj 12 rêxistinên kurdî li Suriyê hene, başî û qelsiyên xwe nûnerîtiya miletê kurd li vî perçeyî dikin. Ji bo ku li gor demê bin û karibin bersiva pirsên milet û rewşa îroyîn bidin, pêwîstiya wan bi guhertinên mezin û bingehîn heye, yan na wê milet ji wan derbas bibe! Li gor min, gerek e ku guhertin ji nava tevgerê pêk bê, bi ser ku pir zor e, lê tu pêwîstî bi zêdebûna (jimareke) nû nîne.

Guhertina ku tê xwestin, bi taybetî di programa siyasî û mîkanîzma karê hundirîn de ye. Programa ku di dema şerê sar de hatiye danîn, divê ku li ser roniya demokratiyê, lîberalîzmê, siyaseta "yek qutib" î, 12 adarê, şerê medeniyatan, (şiyarbûna islamî!), têror, xurtbûna rola Kurdan, hatina YE li ser sînorên Kurdistanê û hwd.. bê danîn, û pêwîst e ku ev program karibe xwestinên Kurdan ên siyasî bi zelalî nîşan bike û rewabûna van xwestinan bi cemawerên surî bide pejirandin.

Ji bo ko ev tişt pêk bên û pêş kevin, gerek e mîkanîzma karê hundirîn bê guhertin. Temenê vê ya ku îro rêxistinên Kurdan pê kar dikin, nêzî sed salî ye, û ji partiyên komunîst hatiye girtin, ku wan bi xwe tu xêr jê nedît. Ev sîstema heyî bersiva dema nû ya demokratiyê û zelalbûnê nade û her dibe asteng li ber ramanên nû û inîsyatîvên endaman û hatina xwîna nû.

Tovên evînî

Cemal Özçelik

I.
Yê tovê şîn dike çi ye?
Himêz kirina axê û ya bi vî awayî
bi şîrêza xwe şîr dayina wê ye?
An jî, tîrêjê rojê yên şîrgermî ne?
Belkî jî ne ew, ne jî ya din e..
Divê cewher bi xwe di tovê de hebe..
Bêyî germahiya tavê tov nikari zêde berxwe bide.
û astegî û zehmetiyên tebîetê piştgav bike..
Lê ger ew tava comert û bi rehm,
ya ku germahiya xwe ji dil
li herkesî û li her tiştî belav dike,
rû nede tovê û hêvî dayinên xwe yî bi şifqet
ji wê re texsîr bike,
divê ax jî qayişê bi wê re bikişîne
û dev ji evîna xwe ya tovê berde
û wê di hundirê xwe de pûç bike?
Ji ber ku hez kirinek bersiva xwe nastîne,
divê dil vê di hundirê xwe de bifetisîne?

II.
Ger ya hez kirî bi helwestên xwe vê evînê têr neke,
ew nikare şaxan berde
û xwe bi rengên şîn ve bigîhîne..
Lê divê tov jî evîn jî bê ne avdayin,
bêne sitar kirin..
Divê li ser qayişa roja ku ji her tiştî re comerd dê,
lê tenê toveke reben û bêkes
di bin axê de hêvî şikestî dike,
û li ser qayişa wan hezkiriyên ku
bişirandinên xwe bêyî yên ji wan hez dikin
li ĥer kesî belav dikin...
Tov were hêşîn kirin,
û evîn were vejandin, di axê û di dil de..
lê divê berê cewher di tovê, di evînê de hebe.
Tenê tovên bi evîn hêşin dibin

Komela Mafê Mirovan IHD rapora 2004an weşand

Komela Mafê Mirovan a şaxê Amedê, ,rapora mafê mirovan a sala 2004an weşand.



Amed - Komela Mafê Mirovan IHD diyar kir, ku sala par li bajarên Bakurê Kurdistanê ji ber şer, kuştinên bêmehkemekirin û mayînan, bi tevahî 305 kesan jiyana xwe ji dest dane.

Komela Mafê Mirovan a şaxê Amedê, ,rapora mafê mirovan a sala 2004an weşand. Li gorî vê yekê par li bajarên Kurdistanê di şer de 219, di êrîşan de 68 û di encama teqîna mayînan de jî 18, bi giştî 305 kesî jiyana xwe jidest dane.

Di raporê de tê diyarkirin, ku bi giştî 7 hezar û 208 binpêkirina mafan pêk hatiye û herî zêde di bûyerên binçavkirinê de maf hatine binpêkirin. Nûnerê herêmê yê komelê Mehdî Perînçek, rapor eşkere kir û got, ku di sala 2004an de mijara binpêkirina mafê mirovan, li Tirkiyê yek ji mijara ku herî zêde hatiye rojevê ye. Perînçek anî zimên ku ji ber helwest û vîna siyasî ya hikûmeta AKP, ev bûyer pêk hatine û got, hîn jî hukûmet bi awayekî taktîkî nêzî pirsgirêkên mafê mirovan dibe.

Amnesty international pirsa girtiyekî Kurd dike

Berlin- Rêxistina mafê mirovan a navnetewî amnesty internation – şaxê Berlin, di nameyek xwede ku ji hikumeta Sûryê re şandibû, di 07 01.2005 de, xwest ku rewşa girtiyê Kurd Abdulqadir Silêman bê zelal kirin. Di nameyê de hat diyarkirin ku Silêman di 22.12.2004 an de li bajarokê Dêrîkê – Cezîrê ji alîyê hêzên ewlekarîyên leşkerî ve hatiye girtin.

Li gor agahdariya malbata wî, sedema girtina Silêman ewe ku di çalakîyên serhildana 12ê Avdarê de beşdar bûye .Her weha tê diyarkirin ku Silêman nexweşê dil e.



Li Almanya li dijî islamîstên radikal operasyon

Berlin- Polîsê Alman li dijî îslamîstên radîkal li seranserê Almanya di 12 mehê de operasyonên mezin pêk anî. Di operasyonên ku berbi sibê û li pênc eyaletên Almanya dest pê kirin 700 polis û tîmên taybet beşdar bûn û dan ser 50 mal, dikan û camiyan. Li gora daxuyaniya daireya kriminal ya eyaleta Bavyera di derbarê 11 kesan de biryara girtinê û 11 kesan de jî biryara binçav kirinê hatiye stendin. Piraniya ev kesan ji Cezayir û Tûnisê ne û tê guman kirin ku pêwendiyên wan bi rêxistinên Zerkavî û Ensar el Islam re heye. Hat ragihandin ku ev çete li Almanya çalakiyên ku gel teşwîkî serhildanê dikin li dar dixin û propagandaya cîhad dikin.

www.kurd.org

Projeya nukluera Îran ê



Kadîm Kan

Wek dewlet, yan wek hêz, wek şîrketek ticarî û heta wek mirovekî serbixwe, ji bo bighêje armanca xwe pêwistî bi stratejiyekê heye. Stratejiyek ku bi hûr û kûr hatiye hesibandin gelek cara rê dide xwedanê xwe ku bi serkeve. Lê eger aliyê din-terefê din, stratejî û mumkunatên pêkanîna stratejiya te fêhm kiribin, ewê karibin zaafiyetekê baş bidin xwediyê wê stratejiyê.

Kes stratejiya xwe ji mirov re nabêje û mirov pê nahesîne jî, lê ji mumkunatên bi karanina meselekê mirov kare tê bighêje, ka ew kes an teref dixwaze çi bike . Mirov gerek li ser wê meselê biricife û gelek realîst be. Wek Kurd gava mirov li têkiliyên Faris û Tirka dimeyzîne, tiştê herî pêşî ku tê ber çawê mirov eve ku dagîrkirina Kurdistanê xeleka pêşîn û esasiye ku li ser dighijin hevdu. Wek dagîrker ew naxwazin Kurdistana başûr ji bighije sexwebûna xwe. Lê ji alê din ve gelek tişt hene ku wan ji hev dûrdixin. Berjewendiyên wan ê polîtîkî û aborî li Kavkaz û li rojhilata navîn û bi taybetî li Irakê wan dûrî hevdû dixe. (Mirov careke din kare li ser van ciha serê we bêşîne)

Xasitiyek dewletên Rojhilata navîn heye ku herkes dibêje cihê wan ê cografî pir bi qiymet e, ango; ji bo dewletên mezin ên cîhanê cihekî wan ê geostratejîk heye.Tê jibîrkirin (anjî ji bo xwe di nav listekê de bihêlin) ku gringiya geostratejiyê li gor şert û rewşa digewire.

şcar ew çend salên paşîn, Tirk di her halukarê de dibên, dewletá Tirkiyê wek pirekêye di navbera dînê Mesîhî û Îslamê de ,an jî bi gelemperî di navbera Rojava û Rojhilat de.

Di vê xalê de dewleta Îranê tu tenezûlê bi pira dewleta Tirk nake.Sebeba wê çiye?

Ji bo mirov pozîsyona dewleta Îranê fêhm bike, mirov gereke du muqayesan bike.Yek : Îran wek pir milletî dirûvê Yugoslavya kevn pê dikeve. Dido: Ji alî giringiya dewletî de,dewleta Fransa ji bo Ewrûpa çi giranî heye, Îran jî li Rojhilata navîn ew girani heye (ez wek dewlet wek politikformationekê dibêjim, an ez ji wan ne xweşim.) Gerek neyê înkarkirin ku iro li Iraqê, Îranê serê Amerîkiyan dêşîne û dide fikrandinê. Îran li Irake kontrol li ser şiiyan heye û di her halukarê de ewa bi Amerîkiyan dide nîşandanê.

Eger em li sûniyên Iraqê binerin, ew jî di bin bandora dewleta Sûriyê de ne .Gava ku mirov têkiliyên Îran û Sûriyê li Lubnanê dimeyzîne, mirov kare têkiliyên wana li Iraqê jî fêhm bike. Li ser pirsgirêka Iraqê tu ferq di navbera Sûriyê û Îranê de tuneye. Dewleta Sûriyê ji mêjve hîn ji wexta Esadê mezin de di destê alewiyan deye û alewiyên Sûriye xwe nêzîkî Farisên şiî dibînin. Ango; elitaguzîdên- polîtîkî û eskerî li Sûriyê alewî –şiî ne. Têkiliyên wan herdû dewletan ne taktîkîne, armancên wan ên hevbeş hene û hevkariya wan stratejîk e.

Îran di 5-10 salên paşîn de gelek dewletên derdora xwe, Ewrûpî û Amerîkiya bi çêkirina Tank û helikopteran ecêbmayî dihêle. Ew ne bes bi çêkirina rakêtên şahap û zelzal gelekan di bin tehdîtê de dihêle. Îran bi çalakî di fuarên navnetewî de ji bo firotina çekan cîh digre û firoşgerekî giring e. Li gor Farisan bixwe û li gor pisporên navnetewî, Îran heta niha çek firotiye 43 dewletan (di nav de dewletên Ewrûpî jî hene) û rakêtên şahap 5 kare berberiyê bi rakêtên Rûsî yên balastik ss-9 re bike.(dibe ku ewa hinek fiş be lê raste ku karin bighijin heta 2000 km.) Ew çend mangên paşînê di medya cîhanê de nîqaşên mezin li ser Îrane tên kirin. Îran di proja xweya enerjiya nukleerî de dikare ûrana paqij bi destxe û ev jî gavekî nêztir ji bo çêkirina bomba atomê ye. Herkes lazime qebûl bike ku ewa tehditeke mezin, bi taybetî ji bo ciranên xwe û ji bo Rojhilata navîn e.

Dewletên ku dikevin nav



Wêne: Kore



Wêne: Iran

çenbera tehdîtên Îranê

Teorîk an ji dil ve dixwaze: Li Iraqê li gor hesabên Îranê di hilbijartinan de şiî bi serkevin û bi tesîra Îranê ewê karibin vek hikûmet ji bo Amerîkiya bêjin "herin mala xwe". Li vir mirov kare gelek şaxan veke. A bi dilê min ewe ku Kurdistan bibit serbixwe û ê mayî di dohnê xwe de biqijin, an jî sunî dikevin bin destê Urdun an jî bi temamî dikeve bin destê şiiyan. Netice: Dewleta şiiya Îranê dewleta şiiya Iraqê, Amerîkiya ji bo çi şerkirin?

Hebûna Amerîkiyê li Rojhilata navîn û bi taybetî li Iraqê, wek cîranê Îranê ji bo Kurd û Îsraîliyan herhal demekê ku dîroka wan bê nivîsandin.

Eger em jivir bi rêkevin û li projeya Îranê bimeyzînin, du bûyerên giring hene. A: Îsraîl di 1981ê de pir bi hêsanî reektora Osîda li Iraqê tarûmar kir û yek dewletên Ereba jî nikarîbûn dengê xwe bikin

B: Meclîsa Îsraîl .Kneest di 21 Tîrmeha 2004an de raporek îstixbaratî nîqaş kirin û di peyde wezîrê parêzî got:``Eger raya gihiştî ya navnetewî li ser tehdîtên Îranê bêdeng bimînin em mecbûrin gavên ku ji me tên xwestin bavêjin``.

Tirk, Îran û Îsraîl heta sala 1979an di Rojhilata navîn de, di bin tesîra şerê sar de dostên hevdû yê herî nêzîk bûn. şro roj her dewletekê daye ser şopekê din, her şopek ku berjewendiyên wan ji hevdû cihêne û stratejiyên wan jî li himberî hevdû ne.

Emê vegerin ser Tirka

Wek tê zanîn dewleta Tirk di NATO deye û li gor hesabên wan di hemû halûkarê de wê NATO li pişta wan be. Lê xuyaye vaya tenê bi devkî wa ye. Bi dû pêhesandina ku Îran karê ûrana paqij bi dest xe, wezirê derve yê Tirka A. Gul got:``Wexta me nîne`` û çend roj peyde meclîsa Tirk biryar da ku sê santralên enerjiya nukleer din jî ava bikin.

Di eslê xwede tecruba Tirka li ser wê meselê heye. Hîn ji salên 70î de Tirka di Îstanbûl kuçuk çekmecê de di laboratuara fizîkê de dest bi ceribandina enerjiya nukleera paqijkirina ûran kirine.

Di sala1982an de wexta ku general K.Evren çûbû Pakîstanê. Wî çaxî di rojnaman de hat nivîsandin ku Tirka ji brayê xwe yên Pakistanî li ser paqijkirina ûran alîkarî xwestine. Xuyaye Amerîki, ewçax Sovyet û Ewrûpiya tiliya xwe li Tirka hejandin. Herhal Tirka planê xwe kirin sarincê.

Lê di sala 2001ê de, şert û mercên din çêbûbûn û Tirka projeya xwe ji sarincê derxistin. Vê carê bi destê generalekî din H.özkök û dîsa li Pakîstanê digot *"Tirk û Pakîstanî wê têkiliyên xwe li ser berjewendiyên xwe yên geostratejîk li pêşxin"*.

Ango dixwazim bejim kesê ku karibe bi Tirka re li ser vê meselê alîkariyê bike ew jî ´´brayê`` wan Pakîstanî ne. Di medya cîhanê de hat gotin ku Pakîstan alîkarîya Îraniya kiriye.

Wexta cîranê Tirka Îran ji alî teknolajiya çek de pêşde dikeve, kare ûran paqij bike, agir bi devlingê Tirka ketiye. Wek di serîde jî hat gotin, Îranî tenezulî dewleta Tirka nakin û tu pêwistî nabînin ji bo navçîtiyê. Îranî bi Alman, Fransizi û Îngîlîza re lihevhatin ku tenê ji bo niha projekta xwe bidin sekinandinê. Li himber wê gelek tawîzên aborî, polîtîkî û teknolajîk bi destxistin .Tiştekî ku Tirk tenê di xewna xwe de karin bibînin. Lê di bûyere projên nukleer de lihevhatinên wiha berê jî çêbûne. Koreya Bakur yek ji wan e ku gelek caran soz daye, alikariye xwe stendiye û tu tiştek bi cîh naniye.

Pakîstan di salên 80î de ji Îngîlîz û ji Amerîkiya alîkariyên mezin stendin da ku dev ji projektên xwe berde. Lê di salên 90î de atom bomba wî di destê wî de bû, jê veger tunebû.

Ji serî heta paşî ev e stratejî û ev e taktîk.Tirk, xwedê ji wan ne razî be, eger rojekê tiştekî wa bi destxin, bi vê nemirovatiya xwe û bi vê qîr û qelebalixa nîjadperestî wê serê gelekan bêşînin, a baş bila tiştek bi destê wan nekeve. Bi hêviya ku Ewrûpî û Amerîkiya ji karên xwe yê bi Koreya Bakur, Pakîstan û Îranê tiştek fêrbûne.

Hayrî Durmuş û Abdullah Ocalan

Laleş Qaso



Di deh salên min ên Zindana Diyarbekirê de, min du caran rakirin nexweşxaneya eskerî. Nexweşiya min jî, mehmetçîkan kezaba min hilweşandibûn. Lê ez nemirim. Û wilo bi hêsanî jî ez ê nemrim. Li gora min, her tekoşerê ku di doza kurdî de xwedî prensîp û şexsiyet be, wê li derdora sed salekî jî bijî. Di vî warî de Osman Sebrî, Cegerxwîn û hwd. nimûneyên ber bi çav in. Heger terempêl li Izedînê Osmên ne qelibyaba û Mûsa Anter jî nebaya alîgirê apoyiyan, kî dizane belkî herdu jî zêdeyî sed salekî jiyabana. Kemal Burkay li derdora heftêyî ye û ez bawer dikim ku ew ê hetanî bi sed û tiştekî jî bibe, (car carê gava ez vê gotinê jê re dibêjim, dibeşişe; dû re jî dibêje "na na, ez sed salî naxwazim…), lêbelê ez bawer nakim ku Abdullah Ocalan xwe bigihîne şêstî.

Mehmetçîkan di sala 1982an de ez wek nexweşekî nîvmirî rakiribûm nexweşxaneya eskerî. Li wê nexweşxaneyê di bin erdê de zindaneke tam bi haweyê misilmanî hebû. Mirov xof jê digirt! Zindan bi şev û rojê reş bû. Mîna bereteyên li ber germa havînê, ji her derê wê bêhna felqeyên kezeba hilhilî, xwîn û elemê difûriya. Em şeş-heft hêsîrên ku li wir, bi ser jana birînên xwe de habela dinaliyan û mehmetçîkan jî car carê li me dixistin. Ji wan hinavên me ên ku ji destê zilmê, xwîn bi ser wê betona sar û qerisî de dipijiqandin, hilm radibû û hilmê di reşaya zindanê de sawêr digirt. Xwîn bi dîwaran û derûdorê ve diherikî, dimeya, diqusiya û dîsa diherikî. Erêêê erê, li wî cihê bêkesiyê, mirov digot qey zeman sekinîbû; ne seet digeriya û ne jî ro hildihat! Roj bûbûn şev û şev jî bûbûn çiyayekî ji risês û bi ser wan kelaxkên me ên birîndar de kumişîbûn. Wey li mino, wey li minê, ew çi şev û roj bûn! Jehr û kezaba binên zemanan bi ser canê me de dirijandin, hey hewar! Bila bi hêsîriya kafirê herî barbar be û ne bi hêsîriya mehmetçîkên misilman be! Bila bi xuşk û biratiya ker û qantir û kûçik û tajiyan be û ne bi xusk û biratiya tirkan, faris û ereban be!Dijwariya rojeke hêsîriya Zindana Diyarbekirê, bi qasî xelasiya du welatên wek Cezayira ku di demekê de bindestê "frensiyên kafir" bû, dihat! Gava dijminên mirov misilman bin û bi ser de jî ev misilman tirk, faris û ereb bin, haho, ma tê kişandin!...

Li zindanê qeryole û çend kevnekotkên ku bi ser qeryoleyan de dakiribûn hebûn. Destên me bi şev û rojê bi qeryoleyan ve kelepçekirî bûn. Tuwalet li derveyî zindanê, lê hema pê ve bû. Destava piçûk û mezin li her sê danên rojê rast kiribûn. Bi şevê jî carekê bû. Me ji destê tuwaletê pir dikişand! "Dîtin û gotin nabe wek hev." Gava mirov bi jana zirav û tîfoyê be, mirov her ji bêhnikekê diçe tuwaletê. Û li me jî him çûna tuwaletê û him bi xwedeberdan qedexe kiribûn. Di dawiyê de me xist serê hev û me hindurê zindanê di pîsiyê de hişt. Li me xistin, lê me dîsa wek xwe kir û vê carê jî me zindan tam di pîsiyê de raxist. Mafir, dîtin ku nabe, êdî bi şev û rojê elektirîk pêxistî û deriyê tuwaletê jî vekirî hiştin. Îcar em hîn wilo û Xeyrî Durmuş (Hayri) anîn vê zindanê. Xeyriyê ku di rojiya mirinê de li ber mirinê bû û berê jî ev zindan dîtibû, kêfa xwe bi me re pir anî û bi hêdîka got, "ew ji wisa fêm dikin, eferim ji we re!..."

Li derve gelek şev û rojên min û wî ên xweş û nexweş û têr û birçî bi hev re derbas bûbûn. Em hevalê hev bûn. Min ji dil û can qedir û qîmet dabûyê û wî jî ji min û wensa min pir hez kiribû. Min çiqasî dixwest ku heta bi hilma wî a dawî ez li ber serê wî bama û bêwestan hema min jê re behsa van çiyayên me ên ku îro xwîn digrîn û dinalin û vê bihara me a şewitî kiribaya û ew jî di nav destên min de xiliyaba. Çerm û hestî mabû. Di wî rûkê wî ê vemirî de xuya dikir ku wî jî çiqasî dixwest ez li ba bama. Bi haweyê ku em ji desthilanîn nekevin û li ber xwe bidin destê min diguvaşt. Lê çi fêde, mehmetçîkên teres, piştî hatina wî bi du seetekî em birin jor.

Xeyrî li wî cihê hêsîriyê, li wê zindana qerisî, li ser wê darbesta hesînî û wilo bêkes û kûs ji vê dinyaya bi xwedan û şeytan çû! Xeyrî çiyayekî bi şax û per bû! Xeyrî guleyê devê topa azadiyê, metelyoz, xweşkêş û çapiliya destê tekoşeran bû! Xeyrî remza liberxwedana zindanê û çelengê serxwebûn û azadiya miletê me bû! Lê bila xerab bibe mala xwefiroşiyê ku heta bi serê ên wek Xeyrî jî di gorê de tewandin!...

Pevçûn! Û hetanî bi mirinê bi mehmetçîkan re pevçûn! Bifikire, gelo ne eyb e ew xwîn li erdê bimîne û bi ser de jî mirov hevalê Xeyrî be û bide dû Abdullah Ocalanê ku bi qesasên mîletê kurd û Xeyrî re li def û zirneyekê dixîne?

lales56@hotmail.com

Serxwebûna Kurdan ne dûr e

Pisporê Kurd û serokê beşê têkiliyên navnetewî yê zanîngeha Lehigh a Amerîka Prof.Henri Barkey di derbarê Kurdan de dîtinên xwe anî zimên.



Prof.Henri Barkey

Wê Kerkûk çilo be û Amerîka çawa lê dinêre?

Ez bawer nakim ku Amerîka bizanibe wê çawa pirsgirêka Kerkûkê çareser bike. Pêşeroja Kerkûkê bi ya Iraqê ve girêdayî ye. Heger şiî û oldar bên ser hikûm, evê ji bo Kurd û Turkmenan rewşek zehmet be, evê ji alî wan de neyê pejirandin.Wê gavê wê Kerkûk tevlihev bibe.

Xeta sor a Tirkiyê li Amerîka çawa tê nirxandin?

Amerîka, ji bo ku Kurd zêde neçin pêş rê li ber wan digrin. Heger Amerîka rê li ber negirta, wê ji zû de Kurd têketana Kerkûkê.

Di awira gelemperiya Tirkiyê de tê bawerkirin ku Amerîka dixwaze Tirkiyê parçe bike..

Van gotinan ji ku derdixin? Divê tiştek neyê jibîr kirin: Heger Amerîka Ocalan teslîm nekira wê PKK şer berdewam bikira

Başe hebûna PKK, Kongra-Gel?

Ez bawerim wê Amerîka xwe ji PKKê xilas bike. Ji ber ku , di vê mijarê de peyman daye Tirkî û ya din jî Amerîka naxwaze hêmanek çekdarî ku îstîqrarê xiradike, bihêle.

Hûn dibêjin otonomiya Kurdên Iraqê li berjewenda Tirkiyê ye…

Ev ne tiştekî nû ye, vegera polîtîka Özal e. Özal digot: "Ez ne li dijî Kurda me, lê li dijî terorîsta me". Daxwazek Kurdên Tirkiyê nîne ku ji Tirkiyê veqetin. Berbi Yekîtiya Ewrûpabûna Tirkiyê, wê bala gellekan bikşîne

Barzanî "Kurdistanek serbixwe" bilêv dike.. ma ev rast e?

Na, ne rast e. Carekê ne bi deryayê ve ne; ji bo derbasbûna Başûrê Iraqê divê riyên Tirkiyê, Sûriyê û Îranê bên bikaranîn. Lê serxwebûn jî wek ku em difikirin ne dûr e. Di nav xelkê de daxwaza serxwebûnê bilind e. Barzanî û Talabanî bi vê giraniyê dihisin. Heger Iraqê ber bi xirabiyê ve biçe, ji bo rizgarbûna xwe Kurd karin têkevin nav revgera serbixwebûnê.

Çavkanî: Rojnameya Vatan. 07.01.2005

Rojnamevana Kurd Şemzîn Cîhanî, sê sal û sê mehan hat zîndan kirin

Rojhilatê Kurdistan- Di 10ê mehê de rojnamewana Kurd Şemzîn Cîhanî di dadgeha Îqlabî ya bajarê Mehabadê de hat darizandin. Dadgehê sê sal û 91 roj ceze yê hepiskirinê da xanim şemzînî Cîhanî. Li gorî biryara dadgehê sê sal ceze paşve tê avetîn, lê divê 91 rojan bikeve zîndanê.

Heta roja darizandinê sehet 5 an şemzîn di zîndanê de bû, lê piştre hat azadkirin, çimkî ewana ji biryara dadgehê re îtîraz kirin. Heta biryara dadgeha bilind ewê serbest be, lê gava dadgeha bilind vê cezê tesdîk bike, wê şemzîn bigrin. Ew zîndana ku şemzîn dixin nav, jibo zîndaniyên sîyasî, mirdar û mafiya ye û bi hev re li yek cihî ne.şemzîn Cîhanî li ser nivîs û axavtinên xwe hatiye girtin ku tê de rexne li siyaseta rejîma komara Îsalamî ya Îranê girtiye. Herweha şemzînî di meseleyên mafên jinan de pir jêhatî bûye.

Li seha fûtbolê bi kurdî axaftin qedexe ye



Anatol - Li bajarê Konyayê ji ber ku fûtbolîstên tîma kurdan bi kurdî axivîn maç temam nebû. Di lîga Amator ya bajarê Konyayê de tîma Seydîşehîr û Yeniceoba Belediyespor hatin himber hevdu. Hakema xanim Emine Koçak karta sor nîşanî Serhatê kaptanê tîma kurd aYenice da û ew ji leystikê avêt. Li ser vê mijarê fûtbolîst û antrenorê kurd di nav xwe de bi kurdî dest bi minaqeşê kirin. Hakem Emine Koçak ji ber sedema ku kurdi tênagihê li seheyê axaftina kurdî qedexe kir. Tîma kurd ji ber sedema "kes nikare zimanê me qedexe bike" ji sehê vekişiya û helwesta hakem protesto kir.

Ji ber axaftina bi kurdî tîma kurd ji lîgê hat qewirandin.

Heciyên Kurdistanê ji Hewlêrê firiyan

Heciyên Kurdistanê di dîrokê de cara yekem ji balafirgeha paytextê welatê xwe Hewlêrê firiyan Suudî û bi sax û selametî gihi_tin cihê xwe. Di 11ê mehê de Hecî li Hewlerê bi ala Kurdistanê ji aliyê meriv û berpirsên Hikumeta Kurdistanê bi merasîmekê hatin bi rê kirin. Heciyên Kurd herwiha alaya xwe ya netewî li Mekê û Medînê di nav hemû alayên welatên dinyê de bilind kirin.

www.kurdistan.org

Dengê Hesen Cizrawî, ruh dide min

Fatê li bajarê Wanê hatiye dinyayê (ez nizanim temenê wê çiqas e, min pirs nekir). Di sala 1986 an de li gel Koma Şîrwan dest bi xebata hunerî kiriye. Di sala 1996 an de derketiye Ewrûpa. Ew zewiciye û dayika du zarokên bi navê Burkay (9) û Shara(2) ye.
Berî ku em dest bi hevpeyvînê bikin, min ji wê daxwaz kir ku em cil û bergên kurdî li xwe bikin. Ez di wê baweriyê de me ku kinc bandoreke mezin li ser hestên mirov dikin. Fatê, daxwaza min pejirand û deriyê dolaba xwe ya kincan vekir. Me xemla xwe girê da, çaya xwe danî ber xwe û dest bi hevpeyvîna xwe kir.



Peyama Kurd: ***Me Fatê bi riya Koma şîrwan nas kir, gelo berî xebata komê jî cihekî Fatê di nava stranbêj û hunermendên kurd de hebû?***

Fatê: Berî komê tu xebata min tune bû, ji ber ku ez zarok bûm. Min di temenekî biçûk de dest bi gotina stranan kir. Di kasêta me ya yekemîn de ez hewqasî biçûk bûm, min nikarîbû ez baş gotinên stranan bibêjim.

Kê ji te re got, yan jî tu pê hesand ku dengê te xweş e. Te bixwe dengê xwe xweş didît yan jî hinekan ji te re got?

Beriya ku ez stranan bibêjim, kesek ji dengê min razî tune bû, ji ber ku min ji sibehê heta êvarê dikire qare qar. Bi taybetî jî diya min ji dengê min ne razî bû. Bexçeyekî me yê biçûk hebû, di wî bexçî de dareke Gêlatê hebû, ji ber ku hevalên min tune bûn û ez her demê bi tenê bûm, ez derdiketim ser wê darê û min stran digotin. Destê diya min nedigihîşt min ku min bêdeng bike. Ez dikarim bibêjim, dengê min ji aliyê Kazo ve hat kifş kirin. Wê demê zaroka herî mezin ez bûm, di navbera min û kurê wî de çar sal hebûn. Jixwe piştre kurê wî jî dest bi strangotinê kir û me di komê de bi hev re xebat kir. Di malbata me de dengên xweş bi vî awahî têne kifş kirin.

We bi koma şîrwan dest pê kir û xwe gihande derekê, piştre jî kom ji hev belav bû, ji xeynî te du endamên din yên wê komê hebûn, rewşa wan çi ye û we çima pêwîst dît hûn belav bibin?

Kom belav nebûye. Koma şîrwan di dema derketina xwe de yekemîn kom bû ku bi zimanê kurdî stran digotin. Bi rastî me gelek zor û zehmetî jî dîtin. Di wê demê de komên muzîkê kêm bûn û ez dikarim bibêjim Koma şîrwan serkêşiya vî karî kir. Ji ber ku wê demê karûbarê koman dihate qedexe kirin, komeke ku stranên kurdî bigotana pir derdikete pêş. Lê niha ew qedexe ne bi temamî be jî rabûne û bi dehan komên muzîkê çêbûn e. Ez bi tenê ji komê cuda bû me, lê xebata komê berdewam e. Zarokên Kazo yên din xebata komê dimeşînin.

Min bixwe nebihîstiye, lê ez dixwazim dîsa jî bipirsim, gelo Fatê tucaran bi zimanê tirkî di şev û şahiyan de stran gotine?

Di zaroktiya xwe de, min li malê ji xwe re bi zimanê tirkî stran gotine. Wê demê kurdî qedexe bû û bi tenê dengbêjî hebû, ew jî bê muzîk bû û bi min nexweş dihat. Ji ber vê yekê min ji xwe re stranên tirkî yên gelêrî digotin. Lê min li ser sehnê her demê bi kurdî gotiye. Ez di wê baweriyê de me ku ezê nikaribim bi tirkî bibêjim jî...

Tu xwe tê de nabînî...

Na, ez xwe tê de nabînim, nikarim baş telafuz bikim û pê hest nakim.

Tu hem stranbêjî û hem dayik î. Ev her dû kar jî barên giran didin ser milên mirov û her dû jî bi hest û hezkirin dibin, bi kinayî tu çawa vî barê giran hildigrî?

Bi rastî zehmet e. Mirov jin be, dayik be û hunermend be barê mirov girane, lê ez dixwazim li vir spasiya hevalê xwe bikim. Ez bi piştgirî û alîkariya wî dikarim ji bin vî barî derkevim. Zehmet e, lê karekî xweş e. Dayikbûna min bandoreke mezin li ser stranên min dike. Dema ku ez li ser dayikekê yan jî li ser zarokan distirêm, ez bi wê yekê dihisim û dikarim xwe têxim nava stranê. Stran tev bi vî awahî ne. Dema ku mirov stranek got, lazime mirov têkeve nava wê û xwe tê de bibîne. Lê heger mirov ji sedî sed têkeve nava wê ew xweştir dibe. Nîzamettîn Ariç stranekê bi navê Zînê dibêje, mirov ji serî heta binî bi wê êşê dihese.

Ez dixwazim hinekî jî xwe berdim nava cîhana hunermendan. Têkiliyên di navbera we de bi çi awahî ne. Dema ku lazim bû, tu piştgiriyê ji kesî dibînî yan her yek bi serê xwe dewletek e?

Ez cihana hunermendan, weke siyaseta kurdan dibînim û wisaye jî. Gelek hevalên min yên nêzîk jî hene, em di çêkirina kasêtan de, di vokalan de alîkariya hev dikin. Min ji çend kesan alîkarî xwestiye û dane min, lê hinek kes jî hene ez naxwazim navan bidim, dixwazin alîkariyê bikin, lê ji rêkxistinên xwe ditirsin. Hinek jê bi rastî hêsîrê rêkxistinên siyasî ne. Ez vê yekê şaş dibînim. Mirovekî hunermend pêwîste azad be. Ez têkiliyên di navbera hunermendan de pir baş nabînim. Weke min got, siyaseta kurdan çawa be, têkiliyên di navbera hunermendan de jî wiha ne.

Tu dibêjî, eger mirov li wê qadê ne gur be, ji aliyê guran ve tê xwarin...

Eynî wisa ye.

Di navbera hunermendên jin de jî ev pirsgirêk hene, yan têkilî di navbera we de germtir in?.

Pirseke zehmet e, lê pêwîst e. Ez dîsa naxwazim navan bidim, lê weke nimûne hinek jinên hûnermend hene, berî ku em werin dinyayê dest bi vî karî kirine. Min her demê xwestiye ku ew kes destê alîkariyê pêşkêşî me bikin, ji ber ku ew di aliyê tecrûbê û huner de mîna dayikên me ne. Lê mixabin, min heta niha alîkariyek ji aliyê wan ve nedîtiye. Alîkariyê jî li aliyekî bihêle, bi ser de mirov diêşînin jî. Pêwîste mirov rê bide kesên ku piştî mirov derketine. Lê di encam de ez dixwazim bibêjim ku di nava me jinan de jî ew piştgirî û alîkarî tune ye.

Di dema dawî de em dibînin ku gelek hunermend diçin li Kurdistanê konsêran didin, gelo tu jî nafikirî biçî li bajarên Kurdistanê konsêran bidî?

Ez deh salan neçûbûm welat. Cara yekemîn par ez çûm. Lê ji bo dayîna konsêran, bi baweriya min pêşamadekariyeke xurt pêwîste. Çûyîna min girêdayî derketina CD ya min e. Kengî CD ya min derket ezê biçim. Lê dîsa jî ez dibêjim pêwîste mirov bi amadekariyeke baş biçe.

Fatê ji kîjan dengên kurdî û biyanî hez dike, li kê guhdarî dike?

Ez li herkesî guhdarî dikim, çi biyanî bin, çi kurd bin. Heger ez navan bidim, wê dilê hinekan ji min bimîne. Dengên xweş hene, ez li dengê Leyla Ferîqî guhdarî dikim, li Çopî guhdarî dikim, dengekî nû ye xweş e. Dengê şehrîban dengekî cûda ye, taybetiyeke xwe heye.

Lê belê ez dîsa jî dixwazim bizanibim, Fatê ji nava van dengan ji kîjanî bêhtir hez dike?

Mihemed Arif û Hesen Cizrawî. Bi taybetî jî Hesen Cizrawî, rûh dide min. Mirov dema li wî guhdarî dike, êşê tê de dibîne, eşqê tê de dibîne, xizaniyê tê de dibîne, her tişt tê de ye. Ez hezar carî dikarim li straneke wî guhdar bikim û jê aciz nebim.

Gelo Fatê, weke hunermendiya xwe, di kebanîtiya xwe de jî jêhati ye. Ew ji kîjan xwarinê bêhtir hez dike û kîjan xwarinê baş çêdike?

Ez cudabûnê naxim navbera xwarinê, ez her tiştî dikarim bixwim. Lê ez ji tiştên şor û tuj bêhtir hez dikim. Li cem me li Wanê penêrê bi pincar heye, û şor e. Masiyên golê jî şor in û em zivistanan wan dixin nava şoravê û dixwin. Îcar ez ji zarotiya xwe de fêrî şorayê bû me. Ez kîjan xwarinê baş çêdikim nizanim, pêwîste tu wê yekê ji zarokên min û zilamê min bipirsî. Lê ez dikarim bibêjim, bi giştî ez xwarinan baş çêdikim.

Xwarinên we yên taybetî li Wanê çi ne?

Keledoş heye, pir tişt hene ku bi keşkê û bi pincarên herêma me çêdibin. Ji gelek deveran xelk têne cem me pincar kom dikin. Li vir jî ew pincar tune ne, ji ber vê jî ez nikarim wan xwarinan li vir çêkim.

Li dawî em dixwazin bizanibin ka hêvî û daxwazên Fatê di vê sala teze de çi ne?

Xwezî her tişt weke hêvî û daxwazan bûya. Hêvî û daxwazî xelas nabin. Hatina Ewrûpayê hinekî ez dame sekinandin. Ev deh salên min in ez li vir im, lê min CD yek jî çênekir. Deh sal ji bo hunermendekî temenek e. Îcar min CD ya xwe amade kiriye û xwedê hez bike wê di Newrozê de derkeve. Dîsa ez dibînim, gel ji min stranên klasîk dixwaze, ez ji bo karekî wiha jî dixebitim û dixwazim biçim serdana Kurdistanê.

Ez bi vê danûstendinê pir kêfxweş bûm û hêvî dikim sala 2005 an bibe sala te.

Ez jî spas dikim, bi rastî suhbeteke xweş bû. Min beriya niha jî pir hevpeyvîn çêkirine, lê wiha rehet derbas nebûne. Ez spasiya Peyama Kurd dikim.

Hevpeyvîn: Hêvîdar Zana





Wêne: Ji arşîva Rohat Alakom

Osman Sebrî û malbata wî

Bajarê Şamê, cîhê zaroktiya min -1-

Bavê min hin helbestên xwe li ser kaxizên çarkoşe dinivîsî, dida destê min ku ez li di van rojên taybet de wan li pêşberî şagirtan bixwînim.

Hêvî Sebrî

Di sala 2002an de ez çûbûm şamê, li wir nivîskar Ramanê Kurd bi min re hevpeyvînek çêkiribû û di kovara El-hiwar (Dialog) de hatibû weşandin. Babeta hevpeyvînê zêdetir di derbarê bavê min Osman Sebrî de (1905-1993) bû. Wek welatparêzekî û wek bavekî wî roleke çawa lîstibû? Bi kurtî min bersîva van pirsan dabû. Piştî ku ez vegeriyam Swêdê min çend dîtin, raman û bîranînên xwe bi hinekî firehî nivîsîn. Di pêşerojê de dixwazim wek pirtûkeke piçûk biweşînim. Mêze bikin. Li jêr ez bi minasebeta sedsaliya bûyina bavê xwe, Osman Sebrî de şaxeke kurt ya vê nivîsa xwe bi kurdî pêşkêşî xwendevanan dikim.

Ez li bajarê Qamişlûyê, li bakûra Suriyê hatime dinê. Em du xwîşk û sê bira ne. Ez zarokê çaran yê malbatê me. Dema ez sal û nîvek bûme, mala me barî şamê kiriye. Diya min ji min re hertim behsa vî bajarê kurd dikir. Di xeyalên min de hin sûret û wêneyên Qamişlûyê yên ku diya min ji min re bi kêf û eşq vegotine hê jî mane.

şam bajarê min e, bajarê zaroktiya min e. Min bîst û heft salên xwe yên pêşîn li vî bajarê kevin derbas kir. Taxa kurdan taxa me bû. Ez tu car nefikirîm herim welatên wek Swêdê û Almanyê ku xwîşk û birayên min li wir diman. Tiştekî ku min berbi xwe bikşîne li wir tune bû. Lê belê min di derbarê van welatan de carina çend tiştên xwaş û qenc dibîhîstin.

Min dixwast berî şeş saliya xwe herim dibistanê. Min dibistana xwe hez dikir. Lê belê ez qebûl nedikirim. Ez digiriyam. Gelek baş tê bîra min dema bavê min ez dabûm hembêza xwe, ji dibistanê vedigeriyan malê. Mudira me prenseseke kurdan ya ji malbateke navdar bû. Navê wê Rewşen Bedirxan bû. Paşê ez fêr bûm ku ew jina zimanzanê kurd Celadet Bedirxan e. Ew hevalekî bavê min yê nêzîk bû. Me Rewşen Xanimê re digot "Meta Rewşen". Ew xatûneke gelek cihê bû. Rewşen Xanim keseke giran û xweyê şexsiyeteke bi otorîte bû. Mamosteyên din li dibistanê jê re hurmeteke mezin nîşan didan. Bi rastî rola mudirtiyê gelek bi wê dikir. Dema ew dihat dibistanê hingî derbasî oda xwe bibe, li baxçeyê dibistanê bêdengiyek peyda dibû.

Navê dibistana me Laila Al-axyalye bû. Di hin rojên taybet de wek roja dayikan û roja netewî de hemû zarok li baxçeyê dibistanê berev dibûn. şagirtan bi alikariya mamosteyan kabiliyetên xwe nîşan didan. Me teater dilîst û helbest dixwendin. Dema zarokên ku ji me mezintir bûn carekê di roja dayîkan de pîyesek lîstin, vê yekê gelek bala min kişandibû. Ew sahne hê jî li ber çavên min e. Bavê min hin helbestên xwe li ser kaxizên çarkoşe dinivîsî, dida destê min ku ez li di van rojên taybet de wan li pêşberî şagirtan bixwînim. Vê yekê bawerîke mezin dida min. Min gelek ji van kaxizên bavê xwe hez dikir.

Di sala 1967an de hemwelatiya kurdan ji destê wan şunda hate girtin, kurd wek "tirk" hatin hesibandin. Malbata me yek ji wan malbatan bû. Di van salan de kurdan gelek zordestî û lêdan dîtin. Bavê min gelek caran hate girtin. Rojekê zabitekî ereb hate mala me û gote bavê min: "Herdu kurên te divê herin leşkeriyê bikin!". Bavê min gote wan: "Zarokên min ne hemwelatiyên Suriyê ne, çawa dibe kesên ku ne hemwelatiyên Suriyê ne wek wezîfe herin leşkeriyê bikin?". Wî waha bersîva bavê min da: "Ez li vir notekê dinivîsim ku zarokên te hemwelatiyên Suriyê ne!" Bavê min bi hişkî û hinekî bi qirf gotê: "Na! dema zabitek wek te rojekê bi pênûsê binivîse em hemwelatiyên Suriye ne û rojtira din xetekê bikşîne ser! Ew ji vî welatî re xizmetê nakin!".

Dema em zarok bûn me di derbarê kurdan de hertim tişt dibîhistin. Me ev hişyarî û zanebûn dema zaroktiyê bi riya perwerdê ji malbata xwe wergirtibûn. Navê me navên kurdî bûn. Mamoste û hevalan hertim maneya navên me ji me dipirsîn. Di van deman de navên kurdî zêde nîn bûn. Mirovan cesaret nedikir navên kurdî li zarokên xwe bikin û gelek kes jî nezan bûn. Rojekê du kes bi kincên sîvîl hatin mala me û qala bavê min kirin. Bavê min li mal bi pîjemayên xwe ve bû, wan ew girtin û birin. Piştî demekê ew şunda vegeriya. Wî kincên xwe, xwe kirin û bi wan re çû. Ez û Kewê tenê bûn. Diya min û birayên min yên mayin Qunaytera (Golan) li bal nasên me bûn. Me zanibû bavo ji bo îfadeyê birin. Em gelek xemgîn bûn û berxwe ketin. Piştî çend rojan diya min û xwîşk-birayên min şunda vegeriyan. Di eynî demê bavê min û polês jî bi hevra ketin hundur. Wusan hat xuyan ku bavo wê bê girtin. Ew hatibû ji bo kincên xwe û hin tiştên mayin hilde. Ev yeka ji bo diya min gelek bi zehmet bû, lê belê qet nebe kurt be jî çav hev ketibûn û hev dîtibûn. Hê jî tê bîra min ku rûyê diya min çawa sor bibû, ew gelek bêhizûr dihate xuyan. Rojekê min û birayê xwe yê mezin Hoşeng bi diya xwe ve tevayî me bavo di girtîgeha bi navê Mezzê de ziyaret kiribû. Ev girtîgeha li serê çiyakî bû. Wusan hêsa nîn bû ku mirov bi buhakî erzan şoforê texsiyekê îkna bike û here vê girtîgehê. Lingên me ketibûn soleke teng, me nizanibû em çi bikin. Polêsên girtîgehê gelekî hişk bûn. Birayê min bi bavê min re peyivî. Lê belê polês pir caran dijî wê yekê derket wekî birayê min çima bi zarekî bilind deng nake. Herdu pevçûn. Wî bi sebireke bilind li vê yekê mêze dikir. Ez tu wext van nêrînên wî yên di girtîgehê de ji bîr nakim.

Paşê me mala xwe bar kire maleke nû. Bavê min jî ji wê girtîgehê derxistin birine girtîgeheke din, navê wê All Qalla bû. Niha ew êdî ne girtîgeh e, bûye cîhekî ji bo turîstan. Numra cihê bavê min 8 bû. Me di her sêşemê bavo zîyaret dikir. Ew roj ji bo min wek rojeke hezkirî bû. Min êdî bavê xwe dikaribû bidîta. Rewşa vê girtîgehê hebekî baştir bû. Me hertim kincên utîkirî, sebze û goşt jê re dibir. Polês hertiştên ku bi me re dibir, kontrol dikirin. Kêfa bavê min gelek dihat dema wî em didîtin û nêrînên wî yên germîn ji bo me gelek tişt îfade dikirin. Me nêrînên wî yên zelal yek bi yek tercime dikirin. Bavê min ji zarokan gelek hez dikir. Wusan jî zarokên cînaran bi me re dihatin girtîgehê. Ew zarok wusan piçûk bûn ku wan dikaribû di nav caxên girtîgehê re derbas bibin û bavê min hembêz û maç bikin. Wî carina diyarî didane me, ji xwe re kiribû edet kîsên pera yên bi morî-mircan dida çêkirin. Ev kara, pêşeyên hin girtiyan bû. Navên me bi kurdî li ser wan hatibû nivîsîn.

Ew xaniyê ku me nû li bar kiribûyê, bêbav ew xaniya hinekî xalî, vala û nexwaş bû. Lê belê hevalên wî yên qence hertim li mala me bûn. Em di dilê wan yên germ de bûn. Ew kesan wek pizmamên me yên rastîn bûn. Mirov tu wext wan ji bîr nake. Hevaltiya wan heta mirinê bû. Navên hinekan di bîra min de mane: Îzet Filo, Reşîd Galo, Reşîd şêx Alşabab û Salah Galo. Mirov dikare bêje heval wek xelatên jîyanê ne, eger şans û bextê mirovan hebe mirov rastî hevalên wusan tê. Ev hevalan hinekî ji bavê min ciwantir bûn. Wan bavê min wek hezkiriyê xwe û wek mirovekî bi nimûne didîtin.

Carekê dema bavê min ji girtîgehê derket, mêvan din dîsa yek bi yek dihatine malê. Dema bavê min ne li mal bû û yekî an jî hinekan rewşa bavê min dipirsîn, me zarokan navên wan ji bîr dikirin, me ew wek tîp didan nasîn û tarîf dikirin. Me hin caran ew bi heralî didan nasîn. Me gelekî hewl û zor dida xwe. Lê belê em gelek şa dibûn dema bavo zanibû ku ew kî ne. Çaya me hertim li ser sobê bû û bavo dikaribû bi herkesî re çayê vexwe. Hin caran têderdixist ku wî gelek vexwariye. Wî car-car işaret dikir ku çaya wî kêm be. Dema me wusan dikir, wî vê carê bi şadî qîrî me dikir: "We bavê xwe ji bîr kir!" Me digotê: "Tu wusan dixwazî". Wî bi ken digot: "Hûn çawa dikarin baweriya xwe bi min bînin, qet ez dikarim bê çay bimînim".

(hiviesabri@yahoo.se)



Jinekolog, mêrekolog, dînekolog Prof. Doc. Dr .
Fatê Were Civatê



Şêxbat

Kaka rojtan baş! Ê min nadzanim tu xaltîyî yan xaloyî yan mamoyî, belam bi serê tû min zor li tû hezkirdim kaka! Min êste derdî xom bo tû dilêm. Temenim 70 sal e belam wekû ciwanekî çalak im. Afretekanî min êdî natwanî yarîyên xoş bo min bika. Min jî dixwazim bi ew temenî ciwan tamek li ev dinyaye bikem. Parem niye min yek afretekanî taze bênem. Pîçek euro le dewletekanî Alman werdigrim belam ew pare didem bo qehpeciwanî çawşînekanî Alman. Êste parem jî tewa bû we natwanim ew îşekan jî bikem. Min qurbeserem çî gû bixom ke bitwanim çareserîyek bo îşekanî xom peyda bikem?

Silêmanî dirinde / Bochum

Bîsmîllah! Xoşewîstekem, bi serî tû kabirayekî xom jî ew gû xward we malî xo xira kird. Ew kabirayekem parê xo, malî xo, jin û mindalî xo we di encam de qûnî xo jî le ser ew îşekan kird we êste bûyî qûnde we ew qehpeîşekan dike. Min nalêm tû dê bibî wek ew kabiraya belam ditirsim pêşerojî tû bibî wekû Saddam Husên we şerî Iraq. An jî bibî wekû Ataturk we mêrhez bibî. Ê min bexom parem niye ke bitwanim bo ew îşekanî tû binarim, belam min ditwanim bo xatirî tû di naw rûpelî Peyamî Kurd de kampanya we reklamekî çak bikem. Ger zehmet nebê, le boyî em encamekî çak le reklamekan wergirin, wêneyekî xot bo min binare. Min dê li binî wênekanî tû binûsim " Ew qehpebawan îşekan dixwaze, parê wî niye, gan dike we gon dixwe!" Çone, çak niye?!

❁❁❁ ❁❁❁

Xaltîka Fatê, canim-cîgerim! Em bi navê komela heywanparêzên bajarê Amedê sersala te pîroz dikin û hêvîdarin ev sal bibe sala azadiya heywanan. Me ev komela pîroz nuh vekiriye û dixwazin hem li welêt û hem jî li derveyî welêt şaxên xwe vekin. Me sembola komelê kiriye "ker". Em niha dixwazin Leyla Nezan bidin mehkema heywanparêzan. Dewleta Tirk herroj êşkencê li heywanan dike lê Leylokê dibê "li Tirkiyê êşkence nîne". Ma ev heywanparêziye? Serok hema digot " Kurd ker in, eşekoxlîeşek in". Em jî mecbûr man di bin sembola kerê de bibin yek û mafên xwe biparêzin. Ji kerema xwe ma tu li Ewrûpa nabî berpirsiyarê komela me û heqê heywanan naparêzî?

Elî Kurtanker / Amed

Lao Elîkê kurtanker, ker kurê wî kerî, hûn bûne ker ma çavê we lê ye hûn min jî bi xwe re bikin ker oxlim! Sibê heta êvarî di vê kozika reş de qîrwîra min e, ez dibêm"rewşenbîrno, serokno, xirekno" ji bo xwedê bibin yek lao, bes e!! Ew dibên " te go çi?" û serê xwe ji înternetê dernaxin. Îcar lao Elîkê kurtanker, xwelî li ser, ez nikarim du berana bînim cem hev û heqê wan biparêzim, îcar ezê çilo heqê heywanên mîna te biparêzin te serê min xwaro! Heqê Evdo heye bavêmino! Heger Kurd ne ker bûna ma didan dû Tirkên sagur ez qurban. A baş bi a xaltîka xwe Fatê bikin û Leylokê nedin mehkema heywanparêzan. Sûretê wê û ê Kemalo jî li ber sembola kerê xin û tev ket û tev rabû!

fate@peyama-kurd.com

Pêkenîn

Sê dinya

Di sala 1980 î de, teoriya ser sê dinê a Mao-Zedung di nav şoreşgerên me de populer bû. Wek hemû rêxistinan xortên wan jî diçûn nav gundan û dengvedana rêxistina xwe dikirin. Herkesî digot: „ ez û ez". Wey li wî go xwe bi gundiyan bidin qebûl kirin û ji xwe re hevalbendan qezenc bikin.

Rojekê dîsa çend ji wan diçin li gundekî dibin mêvan. Gundî li wan dicivin û dixwazin zanibin bê ewê çi ji wan re bêjin.Piştî xoşbêşê, ê meyî xort destpêdike. Ji dîrokê destpêdike heta tê ser çîna karkeran. Ji çîna karkeran destpêdike heta tê ser emperyalîzmê - sosyal emperyalîzmê. Ji serokan destpêdike heta dor tê ser teoriyê. Xort dizîvire dizîvire û dorê tîne ser teoriya ser sê dinê a Mao-zedung. Dibêje û ha dibêje. Pesnê wê teoriyê dide û dibê: Sê dinya û sê dinya. Gundiyek ji nav civatê gotina wî dibire û jêre dibê:

- Xwarzê! ez bi qurban, tu tiştên xweş dibêjî lê bes ji me re behsa sê dinya bike.

- Çima Xalo ? teoriya ser sê dinê a herî rast e.

- Xwarzê! heyran, serê me bi herdû dinyaya re ketiye belê. Yek axret e û yek jî ev dinya ye, em ketine heyra van herduwan îcar ev dinya sisiyan ji me re ji ku derket!. Barê me girantir meke qurban !

Remildank

Beran (21.03-20.04)
Hinek bûyer serê we dêşînin, lê xwe di bin bandora wan de nehêlin. Bê tewr û helwest nemînin

Gamêş (21.04-20.05)
Têkiliyên we û derûdorê germtir dibin. Moralê xwe bilind bikin û evîna dilê xwe derxînin der.

Cêwî (21.05-21.06)
Gellek tişt karin bên guhertin. Li beramber hin bûyeran nekevin heyecanê, serhişkiyan nekin.

Kevjal (22.06-22.07)
Navbera we û hezkiriyê/ya we xweştir dibe. Hissên we diguherin, aramî dermanê hertiştî ye.

Şêr (23.07-22.08)
Hûnê vê heftê rehet bin. Hûnê bi helwesta xweya erênî bandorê li derûdora xwe bikin. Sebir baş e

Simbil (23.08-22.09)
Zêde nerin ser bûyeran, bi tedbîr bin. Jibo serketinê divê moral û daxwaza we bilind be.

Mêzên (23.09-22.10)
Baweriya we bi we tê. Di têkiliyên we de guhertin çêdibin. Heval û hogir we dipesinînin.

Dûpişk (23.10-21.11)
Bi we re xwestek û daxwazên bilind hene, serketinê dixwazin, lê bi hemd gavên xwe radin.

Kevan (22.11-21.12)
Hinek nûçe û mizgînî hene. Hûn di heyecanê de ne. Huner û afirmendiya we derdikeve pêş.

Kovî (22.12-19.01)
Hêviyên we yên pêşerojê xurt dibin. Hûnê xwe ji acizî û sergêjiyê xilasbikin û berfireh bifikirin.

Satil (20.01-18.02)
Hûn di bin bandora bûyer û xwediyên xwe de dimînin. Zêde hissî nebin, bi xwe biryarê bidin.

Masî (19.02-20.03)
Hûn xwe bihêz dibînin û ji xwe bawerin. Zêde zorê li xwe nekin, bêhnfireh bin, rehet bin.

Xaçerêz



SEREJÊR

1. Emir, jiyan / trimbêl, motor (paşûpê) 2. Jina şerkir, jina jêhatî / kirê, deman 3. Parêzger, xweda / fêkiyek 4. Deng, qîjewîj / qeşa, bûz / haydê, yalla (paşûpê) 5. Heywanek (paşûpê) / nivstran, himhim 6. Nexweşiyek, edr / meha nehan 7. Hitimo, çavnediyo (paşûpê) biyanî naveki jinan / notayek muzikê 8. Welatekî Ereban / tê de çayê çêdibe 9. Navê darekê (paşûpê) / xwarinek ji şîr / ji vir û pê de, îcar 10. Esmerî, genîmî, reşî / ciyê destavê, tuwalet

ÇEPERAST

1. Dengbêjekî Kurd 2 Nîşan, alamet, îm / fermana rabûnê, rûnenê 3. Ap, amo / tevlihevî, serûbinî 4. Keçik e, ne bi mêr e (paşûpê) / du tip / kurtenivîsa "pêşiya erebê" 5. Na, ne, rûj / kurtenivîsa "erê salih ti ye" / çawa, çilo, çeng 6. Welatî, warî 7. Nehişki, nermî 8. Naveki jinan / tiştên şewatê, qirş û qal (paşûpê) 9. Wega, wêca, încar / deng, awaz 10. Koma reh û damaran, bazû / din, baweri / ne mê, zilam, mêr 11. Agir, namûs / stîl, dibistan, awa / dayik, yad 12. Destvekirî, ciwamêr / heyat, berdewamî (paşûpê).

Bersivên hejmara 18an

Çeperast
1) Sermayedar 2) Jar / benî 3) Rant / sêl / qût 4) Mad / tanîn / bi 5) Arîfe / amîral 6) Ye / erk/ avor 7) Erkan / rj 8) Dewx / firansî 9) Aar / pîne / atl 10) Aj / roq / mab 11) Îbnet / vegere 12) Çetînahî / er

Serejêr
1) Sermayedarî 2) Aare / ea / bç 3) Rindî / ewrane 4) Fer / jet 5) Aj / terk / ti 6) Yasa / kafîr 7) Erêna / ninova 8) Lima / reqeh 9) Ab / nîvro / gî 10) Req / rojname 11) Nûbar / stare 12) Sîtil / dilber

www.arsivakurd.org

Zelal Cola



Navend:
Trink-Zel (Köln)
Tel.:0221 376 24 05

Bayiyên Zelal

AKCAN GmbH (HAMBURG)
Tel.: 040 723 402 96
LIZA GmbH (BERLIN)
Tel.: 030 390 380 30
ESD Softdrink GmbH (MANNHEIM)
Tel.: 0621 318 76 70
TRINK-ZEL II (DÜSSELDORF)
Tel.: 0211 49 62 150
CAN GETRÄNKE (ESSEN)
Tel.: 0201 289 74 17-18
TRINK-SEM (DORTMUND)
Tel.: 0231 981 86 23
HARRAN GmbH (FELLBACH)
Tel.: 0711 592 08 64
CHAPLIN GETRÄNKE (BREMEN)
Tel.: 0421 691 96 78
EURO-FRESH-FOOD GbR (ERFURT)
Tel.: 0361 26 27 516
TRINK-ZEL I (KÖLN)
Tel.: 0221 977 63 11
NERGIZ
Tel.: 02562 22 168

کیژۆڵەیەکی کوردی ١٠ ساڵان، پلەی سێیەمی دوانزەهەمین پاڵەوانێتی کاراتی نێودەوڵەتی کاسی "ئۆدن ڤالد "ی ساڵی ٢٠٠٤ بەدەست هێنا



ساڤین و کاسی پلەی سێیەم پاڵەوانێتی نێودەوڵەتی "ئۆدن ڤالد" ی ساڵی ٢٠٠٤



"خاتوو شەهرەزاد مەنسوری لەگەڵ ساڤین"
خاتوو شەهرەزاد هەشت جار پاڵەوانی ئەوروپا و سێ جار جیهانی بەدەستهێناوە

رۆژی شەممە رێکەوتی ٢٠٠٤/١٢/١١ لە دوانزەهەمین پاڵەوانێتی نێودەوڵەتی کاراتی کاسی " ئۆدن ڤالد " کە لە هۆڵی " ڤیشنتستال هالە "ی شاری "مۆیرلن باخ " لە ئەڵمانیا ساڵانە ساز دەدرێ ، کیژۆڵەی کوردی تەمەن ١٠ ساڵ ساڤین تاریق فەقێ عەبدوڵا توانی لە هونەری شەڕکردن " کیهۆن ئیپۆن کومیتی " مەدالیای برۆنزی پاڵەوانێتیەکە بەدەست بهێنێت، ئەمەش بۆ یەکەم جارە لە پاڵەوانێتیەکی ئاوا نێودەوڵەتیدا کە لەسەر ئاستی ئەوروپایە و تێکڕای یانە ناسراوە جۆدۆ و کاراتی بەشداری تێدا دەکەن، مندالێکی کورد بتوانێ یەکێک لە مەدالیاکانی ئەم پاڵەوانێتیە بەدەست بهێنێت. کیژۆلە خاتوو سیاڤین کە لە یانەی " ئێرستە کاراتێ _ دۆژۆی دارمشتاد کرانشتاین " یاری دەکات ئەوە بۆ سێ ساڵ دەچێ بەردەوام برە و بەتوانای خۆی دەدات و تا ئێستاش چەند جارێک خولی ڕاهێنانی بینیوە لەسەر دەستی پاڵەوانی کاراتێ خاتوو شەهرەزاد مەنسووری کە هەشت جار پاڵەوانێتی ئەوروپا وسێ جار پاڵەوانێتی جیهانیشی بەدەست هێناوە لە کاراتیدا.ساڵی پاریس ساڤین فەقێ لەسەر ئاستی یانەکانی کاراتی هەرێمی هێسنی ئەڵمانیا توانی پلەی سێیەمی پاڵەوانێتی کاراتی بەدەست بهێنێ. ڕاهێنەری ئەم کیژە کوردە بەڕێز مامۆستا یاسر فەتحی زەکی کە کوردە و هەڵگری پشتێنی ڕەش _ دانی سێیە، لەبارەی ساڤینی پاڵەوانەوە دەڵێ: " چاوەڕوانی ئەوەی لێ دەکەم کە لەداهاتوویەکی نزیکدا بتوانێ زۆر لەوە زیاتر بەرەو پێش بچێ و ئاستێکی بەرزی کاراتی پیشان بدات". هەرچی ئەم پاڵەوانە بچکۆلانەیەشە هیوادەخوازێ ڕۆژێک لەڕۆژان کە یاری کاراتێ بخرێتە ناو ئۆلمپیادەوە تاکو بتوانێ لەوێدا لەسەر ئاستی جیهانی یەکێک لە مەدالیاکانی ئەم یارییە بەدەست بهێنێ و ئالای کوردستان بەشەکاوەیی لەبەرزیدا ببینێ .

ژیاننامەی ئەم پاڵەوانە بچکۆلانەیە:

کیژۆلەی ژیکەلە ساڤین تاریق فەقێ لە ١٩٩٤/١٢/٦دا و لە کوردستانی عێراق لەدایک بووە، بەهۆی ناهەمواری ژیان وبارودۆخی نائارامی ڕەوشی سەردەمی ڕژێمی بەعسی فاشی، بەخێزانەوە ڕوویان لەهەندەران کرد و لە وڵاتی ئەڵمانیا مافی پەنابەرێتیان وەرگرتووە. لە ساڵی ٢٠٠٠ وە لە قوتابخانەی "ئێرش کاستنە " شاری دارمشتاد- کرانشتاین دەستی بەخوێندن کرد، ساڤین خان زۆر سەرکەوتوو بوو لەبواری خوێندندا و لەپۆلەکانی یەکەم و دووەم وسێیەمدا، دووەم بووە لەسەر ئاستی پۆلەکەی، بەڵام لەبواری وەرزشدا و لە یاری ڕاکردن، لە ساڵی ٢٠٠٢ بۆ ٢٠٠٣، دووەمی ڕاکردن بوو لە سەر ئاستی قوتابخانەکەی، لە ساڵی ٢٠٠٠دا لە یانەی " ئێرستە کاراتێ _ دۆژۆ"ی دارمشتاد - کرانشتاین وەرگیرا و بەماوەیەکی زۆر کەم و لەبەر چوست وچالاکی هەر زۆر زوو پشتێنی سپی ودواتر پشتێنی زەرد و دواتر پشتێنی پرتەقاڵی پێ بەخشرا، هەربۆیە لەکاتی پاڵەوانێتی یانەکانی ئەڵمانیا، ساڤین لەناو ڕێژەیەک یاریزانی یانەکەیدا دەست نیشان.کرا بۆ ئەوەی لەگەڵ دوو یاریزانی تری یانەکە بەشداری پاڵەوانێتی ساڵی ٢٠٠٣ی یانەکانی هەرێمی هێسنی ئەڵمانیا بکات و پلەی سێیەمی بەدەست هێنا. ڕۆژنامەکانی هەرێمی هێسن و شارەکە لەوبارەوە وێنەی ساڤەخان وهاوەڵەکانی بڵاو کردەوە وئاماژەی بەو سەرکەوتنەی ئەم ژیکەڵانەدابوو. دواتر لە تاقی کردنەوەی وەرگرتنی پشتێنی پرتەقاڵیشدا جارێکی تر ڕۆژنامەی دارمشتاد وێنەیەکی دەستە جەمعی ساڤین وهاوەڵەکانی بڵاو کردبۆوە. لە پاڵەوانێتی ئەم ساڵیشدا کە پاڵەوانێتیەکی نێودەوڵەتی ولەسەر ئاستی ئەوروپایە وتێکڕای یانە ناسراوەکانی وڵاتانی ئەوروپا بەشداری تێدا دەکرد، لەنێو ڕێژەیەکی زۆری یاریزانی سەرانسەری ئەوروپادا، ساڤین خان توانی پلەی سێیەم لە هونەری شەڕکردن "کیهۆن ئیپۆن کومیتی"ی پاڵەوانێتیەکە بەدەست بهێنێ ، ئەمەش بۆیەکەم جارە کوردێک لە پاڵەوانێتیەکی نێودەوڵەتی ئەوروپیدا بەشداری بکات وسەرکەوتنی ئاوا بەدەست بهێنێ،

شیاوی وتنیشە هەر پێش کۆتایی ساڵی ٢٠٠٤ لە ١٢/٢٠ لە تاقیکردنەوەی پشتێنی سەوزیشدا سەرکەوتنی بەدەست هێنا و ئێستا خاوەنی پشتێنی سەوزە.

وێڕای ئەمانە ساڤین خان لە بواری خوێندنیشدا زۆر سەرکەوتووە. ئەمساڵ کە قوتابی پۆلی چوارەمی سەرەتاییە، پلەکانی ئەمساڵیشی زۆر بەرزن و تائێستا دووەمی پۆلەکەیەتی. ساڤین خان هەر لە دوای پرۆسەی ئازادی عێراق و بەفەرمی بەرزکردنەوەی ئالای کوردستان، هەموو خولیا و خەیاڵێکی ئەوەیە لەسەر ئاستی جیهانی و لەپاڵەوانێتیەکی جیهانیدا بتوانێ یەکێک لە مەدالیاکان بەدەست بهێنێ و ئالای کوردستان بەشەکاوەیی لەبەرزیی ولەنێو یاریگا ناسراوەکانی جیهاندا ببینێ .

جێی ئاماژەیە کە ڕاهێنەری ئێستای مامۆستای بەڕێز کاک" یاسر فەتحی زەکی " کە بە ڕەچەڵەک خەڵکی هەولێرە و هەڵگری پشتێنی ڕەش _ دانی دووەم، پێشبینی ئەوە لە ساڤەخان دەکات کە لە دەهاتوویەکی زۆر نزیکدا بتوانێ لەسەر ئاستی نێودەوڵەتی بەشداری زۆرتر و ئاستی بەرزتر پێشکەش بکات. شیاوی ووتنە ساڤین خان، بەشێوەیەکی بەردەوامی هەموو ڕۆژانی دووشەممە وچوار شەممە وهەینی بۆ ماوەی سێ کاتژمێر مەشق و ڕاهێنانی هەیە لە یانەکەی و بە دریژایی ئەم سێ ساڵەی ئەندام بوونی لەم یانەی کاراتیەدا لەسەر ئەم پلانە ڕاهێنانە بەردەوام بووە.

تازەترین مۆدێلەکانی ئۆتۆمبیل لە پێشانگای دیترۆیت - ئەمەریکا









پۆلیسەکانی چین لە کاتی ڕاهێناندا دەفڕن!



پۆلیسەکانی چین بە خولی ڕاهێنانی سەختدا تێپەڕدەبن بە جۆرێک بیانکاتە خاوەنی باشترین توانای جەستەیی و ئەم وێنەیەش دیمەنێکی ئەو ڕاهێنانەیە.

بەکوردی بدوێ،
بەکوردی بخوێنە،
بەکوردی بنووسە،
بەکوردی بیربکەرەوە!

پەیامی کورد ئامادەی
بڵاوکردنەوەی ریکلامەی
بازرگانی و بروسکەی پیرۆزبایی
و پرسەنامە بەنرخێکی گونجاوە

ئاژانسی توریستی
NEW PLAN
ئێمە ئامادەی خزمەت کردنی هاوڵاتیانی کوردی عێراقین
کوردستان لە ڕێگای تارانەوە
ڤیزای ئێران لە ماوەی دوو هەفتەدا
خەڵات
لەگەڵ هەر بلیتێکی دووسەرەی تاران، مەودای خواردن لە شیکترین ڕێستوران لە تاران بە مۆزیکی زیندوو
بلیت بۆ سەرتاسەری جیهان
گەشتی توریستی بۆ سەرتاسەری جیهان
تاران لە ٣٢٠ یۆرۆ
Thomas-Mann Str, 24
53111 Bonn
Germany
Tel.: 0049 (228) 180 24 34
Fax: 0049 (228) 180 24 38
E.Mail: info@newplan-travel.de
www.newplan-travel.de

Yexînax, angu dîskotêka Kurdî

Keça Kurd



Dîsko an jî dîskotêk, ya ku îro ji kultûra welatên rojavayî ye û em weha dibînin ku di qewareya şaristanî de dilive; rengê pêşketina miletekî ye. Ev bêje di naveroka xwe de li rex bihtiriya gelê me nayête pejirandin û ji zaroyên xwe re qedexe dikin; ez maf didime wan, ji ber ku di dema îro de tevliheviya bêsînor ji keç û xortan re mejiyê min û yê bihtiriya civaka me nahilgire; em di rengê wê de ji neritiya miletê xwe dûr dibînin.

Raste ku her civakek di qewareya kultûra xwe de dijî, lê bi dirêjiya demê û di bin kutekên zor û sitema dewletên serdest de miletê kurd ji qewareya kultora xwe a resen derketiye û ji kultûra wî gelê serdest bi tehlî vexwariye, ta ku di hevêrê xwîn û mejiyê wî de hatiye strhan; nema kare li hin aliyên kultûra xwe bibe xwedî û nema kare bipejirîne.

Dema ku mirov qunaxên jiyana bihtiriya gelên cîhanê berberî hev dike, mirov dibîne ku di gelek qunaxan de şêweyê jiyanê weke yek bû ye; li gel wê dûriya ku bihezarên kîlometran di nav wan de hebûnye Ev dîskoya ku li van welatan heye û bi wî kirasê rojavayî gihaye gelek miletên dî. Li vir ez dixwazim bêjim ku dî nav civaka kurdî de jî ev dîskotêk hebûye û navê wê jî YiXiNAX bûye. Ev bêje, angu Yixinax di naveroka xwe de dîskotêk e û bi sedên salan di civaka kurdewarî de hebû ye; bêşerm û fehêtî xort û keç, jin û bûkên ciwan ji êvarê ta sibehê bi stran, mûsîqa, dîlan û helperkê di jorekî de û bi hev re dikirin. Yixinax ji bo ciwanan bû û bê çavdêriya dê û bavan bi şahî, ken û henek şeva xwe derbas dikirin. Ev hels û kewt ji kultûra gelê me bû, nemaze di şevên ziviztanan de, di jorekî de, yê ku bi levkirin ji xwe re li tarekê heldibijartin..

Û ji bo ku ez gotina xwe ji wer e bi cih bikim ji pirtûka ADAT ÊN KURDISTANê çav bidin nivîsîna di rûpelê38ê de, ku Mele Mehmûdê Bayezîdî bi vî rengê ha gotiye:"Û ciwanên wan(angu Kurd) law û keç û bûk , zivistanan her şevê li malekê YIXINAX dikirin û li wê malê ber hev dibin. Eger saz heyin sazan dikutin, eger saz tunînin lawêd dengbêj û bûk û keçên tevî hevûdu bêrita dibêjin û distirênin û govend digirin û direqisin, heta nêzûkî sibehê. Îcarê her kesek belav dibin û diçine malêd xwe. Ekserî du şev û sê şevan carekê elbete YIXINAXÊ di nava gundiyan ên ekradan dibîtin..."

Careke dî her di wê pirtûkê de û li rûpelê21ê Bayezîdî gotiye:"Û gelek caran dibe ku jin wead dikin ko filan şewla(kar)min bête serî û yaxud nexweş şefayê bibînîtin ez dê di riya Xwedê de YIXINAXekê ji boy ciwanan bikim. Paşê weko şewla(kar)wê hate serî, wê weadê bi cih tînin, ewê Yixinaxê dikin.Yixinax ew e ku bi dawat(vexwestin)verêdikitin. Her çi keç û kurêd bêkar heyîn û bûk û jinêd ciwan heyîn hemuyan bi şev gazî dikitin û xaniyekî mezin vala dikitin û çiraxan û dengbêj û sazan hazir dikin. Îcar bi şev her çî ciwan û keç û law di wê miheleyê(tarê) de û yaxud di wî gundî de heyîn hemû pêk têne wî xanî. Sazan dikutin û distrênin û govendan digirin û reqis dikin. Heta ko sibe dibitin. Îcarê her kes belav dibin û diçine malêd xwe..."

Vejîna YIXÎNAXÊ

Gelo em kurd çima vê Yixinaxê na vejînin? Di baweriya min de, bi vejandina wê berjewendiyeke gelêrî û civakî pêk têt. Li her bajarekî û di bin navê yixinaxê de em ji xwe û xort û keçên xwe re ahengan li dar xin; li mehekê an jî her du mehan li eywaneke piçûk em bicivin; xort û keç û hemî ciwanên me bi hev re dîlan bigirin û şahiyê bikin.Û li hin şevan jî em çêrok û helbestan jî bixwênin û ciwanên xwe bi aliyê toreya kurdî ve bidehfînin. Bi riya yixinaxan malbat, xort û keç hev nas dikin û bihtir hestê netewayetî xurt dibe; dûrbûna ji hev namîne. Û em vê bêjeyê bi naveroka wê ve divejînin, da ciwanên me bizanin ku zimanê me gelek têr e û têra her kar û alavan heye..

Têbînî:

Ez hêvî ji xwendevanê peyama kurd dikim, eger ev navdêr bi vê naverokê an jî bi naverokeke dî li deverekê hebe ji min re û li ser vê E.mail ê rêkin:

Kecakurd50@yaho.de

Li ser pêkenokan

Bavê Ronahî



Di jîyana mirovatiyê de girî û ken, xem û keyf, taziye û şahî bi hevre dimeşin û hevûdû temamdikin.

Ji roja destpêka mirovatiyê ve ev waha meşiyaye û dê waha jî bimeşe. ji ber ku" jiyan ji yêkîtiya dijberan pêk tê "dı jiyana milletan de jî evya hoye. Ken jiyanê dirêj dike, xem,keder û keseran redivîne ,belav dike. Jibo temenek dirêj ken pêwîst e. Xasma jibo milletek wek me, ew sedan salin di bin qetliam, talan, tajan, kuştin, lêdan,û hemû heqaretên nedîtî û nebînayî lê hatîne kirin re, ev pêwistî pêtir xwe dide pêş. Herçend dijminan tum xwestine em bigirîn, nekenîn lê nikarîbûne pêşiyê li kenê me bigirin. Heke em ne milletek henekkir, pêkenîçêker biwana, emê ji qehran bibeecîban, li hember hemû kirinên dijmin yên hovane, me moralê xwe xurab nekir, me li ser kirinên wan yên hovane pêkenok çêkirin, henekên xwe bi wan kirin. Ji ber ku me dizani bi kenîn û morala bilind mirov dikare li hember dijmin, liberxwe bide. Ji berko em dizanin kenîn dilê mirov geşdike. Kenîn dermanê gelek nexwesîya ye, derdê ko çu derman jêre nayên dîtin stres û serxişkîye, lê dermanê wan jî kenîn e. Lewre van çend salên dawî gelek dewletên pêşdeçûyî jibo moralxweşkirina gelê xwe berberî, berîyêkdan (berîyêkçûn zorahevbirin) û mihrîcanan (festîval) li dardixin. Bav û bapîrên me zûdan bi wê yêkê hesîyan e. Heke mirov bala xwe bide bajar, bajarok û gundên Kurdistanê, bi awayek berbiçav tê ditin, ko li her taxekê yek an du mirovên henekvan û muqelît hene, ku ken û keyfa xelkê xwecih li ser wan e. Herwaha li her deverên Kurdistanê jibo pêkenîn û dujmîndanê jî, kesekî ji xwere dikin dînik û bela xwe li wî dixin ko ew jî dujmînan wan bike û xelk pê bikene. Di nav Kurdan de eşîrek li ser eşîra dijber û cîran, gund li ser gundê dijber û cîran, axa liser axayê dijber û ciran pêkenok çêkirine . Herwaha gelê Kurd li ser şêx, mele û dedan, li ser Elewîtî û Sunîtîyê, li ser Filehtî, Musulmantî û Ezîdîyatiyê, li ser rêvebir û serokên xwe û yên dijmin, bê hejmar pêkenok pêkanîne. Di nav wan pêkenok û serpêhatîyên pêkenik de hinek jê hene tiştên gelek qedirbilind, têrnaverok ko mirov pirtûkeke bixwîne hindî wê pêkenokê dersan jê dernaxe û serwext nabe. Lê sed hehf û mixabin, ev pişka çanda me ya nirxbilind bi tinê di nava tixûbên wê devera ku lê hatîye çêkirin de maye, di kolan, sûk, qawexane û dîwanxaneyên wê deverê de hatine gotin. Mixabin bahrapêtir (piranî) ji wan pêkenokan, ji bavik ne gihiştîyebavikê dûv re tê. Hema wesan ji bo hewcedarîya wê demê û devera lê çêbûyî da hatine gotin û pêre hatine jibîrkirin.

Her çend di van deh salên dawî de li Ewrûpa hinek camêran bahreke biçûk ji van pêkenok û serpêhatîyên pêkenîk bi nivîsarî gihandibin destê xwendewaran û ji mirin û wundabûnê filitandibin jî, lê ne bes e. Dîsan jî mala wan camêran avabe, xizmetek baş ji bo milletê xwe kirine.Hêvîya me ewe ko rojekê şanogerên me destbavêjin van nivîsaran û li ser sehnan bigehînin temaşevanan.

PIŞO MIHEMED

Li Amedê (Diyarbekir) bi navê Pişo Mihemed pêxwasek hebû. (Hebû dibêjim jiber ko min bihîst kû wefat kirîye.) Li ser Pişo Mihemed gelek serpêhatî û pêkenok tên gotin, an jî hatine çêkirin. Dibe ko rojekê kesek rabe van pêkenokên wî kombike û bikêşe ser kaxezê. Ezê li vir çend kurte pêkenokên vî bigehînim hev û di nava vê pêkenîyê de, wek bitenê pêkenokekê binivîsim . Di sala 1980'an de, ko Generalên Tirkan Cunta xwe ya Faşîst bi cîh kir, li Kurdistan û Tirkîyê, ref- ref dest bi girtina girseyan kir. Di nava refek girtiyan de Pişo Mihemed jî tê girtin. Vî jî wek herkesekî dibin îfada vî distînin. Di nav pirsan de Leşker jêre dibên : Tû dewrimcîyê kîjan rêxistinêyî.? Ew jî dibê: Ez ne dewrimcî (şoreşger) me, ez esrarcî me. Lê Tirko jê bawer nakin û lêdixin . Pişo Mihemet ji wan re bi tirkîya xwe waha dibêje: Biz dîyîdix Mehmetçix-Mehmetçix ! Mehmetçix Qibriste Qehreman ema Dîyarbekirde Pûşt çiqtî. (me digot: Mehmetcîk, Mehmetçik li Qibrisê qehreman lê li Amedê bêjî - kurê zinayê - derket.) Li ser vê gotina ko ji leşkerê Tirkan re heqeret kirîye, bi lêdan û êşkencê wî dihavêjin girtîgehê. Heyamek di navberê de derbazdibe, rojekê ji rojên cejneke (îd) Olî Generalê Tirkan tê girtîgehê. Ji girtîyan re debêje: Îro îd e, lê jiber ko hûn bi ya me nakin ez Îda xwe bi we nadim pîrozkirin û destê xwe jî bi we nadim maçkirin. Herwaha îda we jî pîroz nakim! Pişo Mihemed hema ji Generalê Tirkan re dibê: Pîroz nekî pîroz neke. Em jî Îda te pîroznakin û destê te jî maçnakin. Qibrax!.

www.kurdishlibrary.org

Di hebûn û nebûnê de sînema Kurd



Fehmî Balayî

Dema mirov li dîroka jiyanê dinêre ,di hemû qonaxan de huner bûye şahidê bûyeran û bi şêweyekî hûnerî jiyan bihevre girêdaye. Her beşeke hunerî li ser destê hind kesên afrêner, ji aliyê xweve ev yeke pêk aniye. Dema mirov dîroka gelê Kurd dixwîne bi serhatî ,efsane, destanên qehremanî û evîndarî xwedî dewlemendiyek e. Her bûyerek bi serê xwe filîmekî sînemayî nîşan dide, senaryo hatiye nivîsandin, bûyer qewimiye û rejîsor jî amadeye, lê lêkdan û kamîre pêwîste. Dema ez van axaftina dibêjim, dewlemendiya kultur û dîrokê nîşanî me dide. Sînema di dîroka gelan de rolekî giring dîtiye û bûyer û serhatiyên gelan bi alîkariya kamîrê ji hestên guhlêbûnê xistîne hestên dîtinê, bi dirêjiya dîrokê gelek qonax bûrandîne û geheştiye qonaxa nû ya ku mirov hestên xweşiyê tê de bikar tîne, ew jî estetîka hunerê ye. Gelê Kurd di vê hêlê de hejar e, ew jî vedigere ser çendîn egeran, egerên siyasî, civakî, ekonûmî û nebûna serxwebûnek azad. Mirov dikare hind xalên giring pêşçav bike ku

li Kurdistanê bi giştî û hunerê sînema bi taybetî bûne di rêya pêşdeçûna hunerî de bûne asteng.

Yekem: Parçebûna Kurdistanê li ser destê çendîn welatên dagîrker û netewên cûda cûda, rê li pêşdeçûna huner û ziman û kultura Kurdî girtine ku nikarîne bi şêweyekî azad ramanên xweyên afrandinê pêkbînin.

Duem: Weke tê zanîn karê sînema karekî kolektîv e, ev jî wê digehîne ku hunermendên Kurd nikariye nêzîkî hevdû bibin ji ber, ku danîna sinûran, nefêmkirina zaraveyan û ta radeyekê li hind parçên Kurdistanê neserbestbûna zimanê Kurdî ye.

Sêyem: Nebûna saziyeke hunerî, serbixwe ku bikaribe ji aliyê organîze û madî ve alîkariya sînema Kurdî bike. Ev jî ji hejariya gelê Kurd tê. Çarem: Paşvemana civakî, nebûna akademiyên hunerî û nebûna kadiroyên hunera sînema li ser bingehekî zanistî û kêmbûna jina Kurd di xebatên filîmên sînemayê de. Ev jî ji aliyekî ve di bin bandora malbatê, eşîrê, olê û siyasî de ye.

Pêncem: Nebûna dezgehên ragehandinên navnetewîn û Kurdistanî ji bo piştgirtiya sînema Kurdî û derhênerên Kurd.

Ev û gelek xalên di di rêya pêşdaçûna sînema Kurdî de bûne asteng. Herçendê di van salên dawî de hind bizav tên kirin lê têr nake. Bi nêrîna min dîroka sînema Kurdî ji Yilmaz Guney destpêdike taku wergirtina xelata festîwala Kann ya sînemayê. Ji aliyê Guney ve ji bo destpêkek ku sînema Kurdî di qada navnetewî de deng vede, herçende dewleta Tirk ji xwere hesab kir, lê dîsan naverok bi Kurdî bû, ger ziman biTirkî jî be. Herweha li vê dawiyê Bahman Qobadî di sînema Kurdî de bûye navek, lê ta çi dem ew berdewamî dike. Piştî çendîn festîwalên Kurdî hatine encamdan, li Ewrûpa û Kurdistanê hêdî hêdî xebatên sînema tên kirin. Ez weke bînerekî çendîn festîwalên sînema Kurdî bi taybet li Berlîn, bi alîkariya çend hevalên din ve ji aliyê Memed Aktaş ve hatine organîze kirin. Bi beşdarbûna gelek filîmên Kurdî hind tablo li ba min peyda bûn ku weke pirsekê aya mirov dikare bêje sînema Kurdî heye yan na?

Li vir mirov dikare çendîn nêrînên cuda ji bo pêşdaçûna sînema Kurdî pêşçav bike, dibe aliyê rexnê jî bi xwe ve bigre.

Gelek kes weke derhêner li ser sînema Kurdî dixebitin. Ji hind aliyan ve, dema mirov ji bo hunermend û gelên biyanî nîşan bide, aliyekî nêgatîv di sînema Kurdî de pêşçav dibe. Ji ber ku bi kamerayeke vîdeo yan normal film kişandiye û naverokeke bê wate, kesên têda dilîzin jî cara yekeme tev li karekî sînema dibin û zanebûna wan li ser rewşa sînema tuneye yan hindik e. Bi nêrîna min mirov nikare bêje ev filmekî sînema Kurdî ye. Ji aliyê din ve, hind derhênerên Kurd di sînema biyanî de dixebitin û bi zimanên biyanî û naveroka civakeke biyanî, mirov nikare ji van re jî bibêje sînema Kurdî.

Hind kes jî hene zu dest bi vî karî kirin lê pêş de neçûn û di cîh de man. Lê hind kes jî dereng dest pêkir û zû pêşdeçun. Niha jî di qada navnetewî de hatine nasîn û bûne xwedî çendîn xelatên festîwalên sînemayê. Îbrahîm Selman, xwedîyê filmê Karwan, Nezamedîn, xwediyê filmê Stranek bo Beko. Behman Qobadî, xwediyê filmên Dema Hespê Serxweş, Def û filmekî nû bi navê Kûsî jî dikarin bifirin. Serbest Resûl, xwediyê filmê Dwênê û Emro. Ciwan Bamernî, xwediyê filmê wej bîr nakem û Girde sur e. Enwer Sindî, xwediyê filmê Berî Berbankê. Bêrîvan, Zülfiya Akulak, Kazim Mano Xelîl, Husen Hesen, Arman Nadem, Ozay şahin,Yusif Beşiloz...td. Bi nerîna min li destpêkê gelê Kurd di hêla helbestê stran, serhatî û çîrokên efsaneyî de gelek pêşketin kir, lê îro em dibînîn di her parçeyek Kurdistanê de şert û mercên xwe hene. Ev jî wê diyar dike ku em bixwazîn û nexwazin em ketine bin bandora wan rejîmên desthilatdarên Kurdistanê. Ji ber vê yekê jî ez her parçekî Kurdistanê di beşekî de dibînim. Mînak, Başûrê Kurdistanê di aliyê helbest û şêwekarî de pêşde çûye. Ji ber ku zimanê Kurdî serbest bû û li iraqê şêwekarî di pêşdeye ji hemû welatên erebî. Herweha şano ji ber hebûna peymangeh û akademiyên hunerî. Li Bakurê Kurdistanê ger direng jî destpêkir be pêşdeçûnek heye, bi taybet ji aliyê roman, sînema û stranê de. Ev jî bi nerîna min vedigere ser nêzîkbûn û têkeliya Tirkiya di gel civaka Ewrûpî û cîhana ji derve. Ji ber ku roman edebiyata bajara ye, herweha koçberiya gelek Kurdên Bakur, têkelî digel cîhana nû ya edebiyat û hunerê peyde kiriye. li Rojhelatê Kurdistanê sînema ber bi pêş ve diçe. Bi taybetî li ser destê hunermendên ciwan. Li Başûrê Rojava şêwekarî û hind aliyên romanê û helbest bi xweve girtiye. Mixabin ta niha ne bi tenê sinorên Kurdistanê nehiştiye em hevdû nasbikîn, belkû rênivîs û zaraveyên Kurdî û nebûna rênivîsek standart di edebiyata Kurdî de. Me nikariye dîroka hemû parçan bizanîn.

Li dawiyê hêviya min ewe ku festîwalên sînema Kurdî, xwe bikin yek sazî û pir belav nebin da bikarin xizmetekê ji bo sînema Kurdî biken. Weke mînak, li London, Berlin, Lozan, Paris, Kurdistanê û Îstanbûlê ev yeke pêk tên. Piranî jî filmên dubarekirî tên nîşandan. Herweha gelek filim bi zimanên biyanî û yên dewletên dagîrker tên pêşkêş kirin. Ev jî weke wan nivîskarên bi zimanên biyanî di nivîsin.Wek Yaşar Kemal bi Tirkî û Selîm Berekat bi Erebî û Ehmed Arif bi Tirkî li ser edebiyata wan tên hejmartin.





Torinên kurd bûn babeta lêkolînê

Stockholm - Pirtûka Rohat Alakom a bi navê "Arîstokratên Kurd: Torin" di nav weşanên APECê de hat weşandin. Di bergê pirtûkê de sûretek ji mezinên torinan, general Gulî Cewar Axa cîh girtiye. Nivîskar nîşan dide ku koka peyva "torin" ji peyva "tov" û "rind" pêk hatiye. Paşê ev herdu peyv di nav hev de keliyane, di dawiyê de peyva "torin" çêbûye ku tê maneya kesên bijarte, mumtaz û arîstokrat. Vê carê jî arîstokratên Kurd bûne babeta lêkolîna Rohat Alakom.



Gûlîzar

Stockholm - Pirtûka Lokman Polat ya bi navê "Gûlîzar" li Stenbolê di nav weşanên Helwest / Doz de hate weşandin. Pirtûk 112 rûpel e û berga wê gelek xweşik û rengîn e.

Gûlîzar ji 12 kurteçîrokên kurdî pêk hatiye. Her kurteçîrokek rengeke jîyana civakî ya kurdan radixe ber çavên mirov. Nivîskarê pirtûkê Lokman Polat van kurteçîrokên xwe bi stîleke nû nivîsîye. Ev kurteçîrokên ku di pirtûka wî ya bi navê "Gûlîzar" de cih girtine, neweke kurteçîrokên wî yên berê ne. Ev modern in û ji yên berê gelek baştir in. Naveroka pirtûkê, zimanê wê, teknîka nivîsê û metoda ravekirina çîrokan bi şêweyeke modern hatine pêkanîn.

Weşanên Helwest hêvîdare ku xwendevanên kurd pirtûka bi navê "Gûlîzar" bi dilxweşî bixwînin.

Weşanên Helwest

www.ekurd.net

Namê generalo zulumkar eşkira bi



Tirkiye- Tirkiya namê Tum general Yavuz Ertürk ke Amed û Dersim de mesulî vînkerdişî zaf Kurdan be, da Dadgehê Heqî Merdiman ê Ewropa (DHME).

Se ke ma yew mude cuwa ver rojname de nuştib, Pasûr de yew mezelo komikî vêcîyab werte. No mezel de mehitî 11 dewijî bi. Merdimanî nê dewijan sare da DHME re. Nê ser DHME Tirkiye ra namê mesulî leşkerîya persay. Tirkiye mecbur mend namê nê general eşkira kerd. Tumgeneral Yavuz Erturk o wext serleşkerî Alaya Komando ê Bolu bi.

Goreyî raporî komîsyonî TBMM û çapamenîya Tirkiye Yavuz Erturk wext ke Dersim û Silopî de wazîfe kerdo, uca de zi çend Kurdî kerdî vîn, werte ra daritî we.

Tumgenereal Yavuz Erturk nika teqawito.

Çewlîg de banî ke semedî erdlerza virazîyayî nêsaxlemî



Çewlîg - Çewlîg de aşmê Gulan 2003 de erdlerz(Banlerz) bi. No banlerza pey hukmat 2 hezar 16 ban viraşt. La nê banî daymişî zimistan nêbenî.

Nê banî ke hukmat viraştî zafê înan hê mehlay Uydukent di ê. Zafê banan de varayişa pey problem vecîyenî. Varayişa pey çati ra awe yena war heta qato binîn. Nê banî 4 qat î.

Hukmat nê banî 42 mîlyar ra ruetî Çewlîgijan, la Çewlîgij vanî ken ê banî 10 mîlyar zi nêkenî.

Perobîn ra banlerz ser yew serronêm vîyert, la hama tayê însanî hê tebera, konteynir de manenî. Keye Berk cuwa ver mehlay Yenîşehîr de yew bano tek qat de mendîyen û 30 mîlyon kîra dayn. Banlerzî 2003 de banî înan riciya, la hukmat heta nika înan re ban nêviraşto.

Muzafer Berk pa cinî xo û 4 qicanî xo ya no zimistan de no serd û xedeb de Konteynir de maneno.

Komîteyî Referandum ê Kurdistan; ganî îradeyî şarî Kurdistan vêcîyo werte

Haraketa referandum yew hareket cemaatî ya
Na hareket dinya de yena sinasmayiş û meşru ya
Wext ke prosesî vîcnayiş sernêkuiro, hareketa sîyasî ya Kurdistan eşkena referendum biwazo



Wêne: Peyama Kurd / Avesta.com

Bonn - 6î aşm de bajarî Almanya Bonn de HEVKARÎ (Hevpeymana Rêxistinên Kurdistanê li Almanya) semedî komîteyo berz ê Referandumî Başûrî Kurdistan yew semînar kerd hedre.

Na semînar de temsîlkaranî komîteyî referandum ra Helkewt Abdulla, Fewzî Etruşî û Barzan Hemesûr bi peroyî xebatê Hareketa referandûmî ser agahdarî da goşdaran.

Semîner bi qisêkerdişî nuştox Huseyîn Habaş dest ci kerd. Huseyîn Habaş qisêkerdişî xo de bi kilmkî behsa hareketa Referandûmî kerd, nê hîrê kesî dayi sinasnayiş û mîkrofan da Helkewt Abdulla.

Helkewt Abdulla silûm da goşdaran û dest bi qisêkerdiş kerd: „ Hareketa referandûm miyanî şar de dest ci kerd, cîyer ra yena, yew hareketa gelî ya û sîvîl a. Qet alaqayî na hareket û partîyanî sîyasî çîno.Welatanî demokratîk de wext ke yew pers nêameyî çarekerdiş, na pers seri referandum beno. Ma zi wazenî semedî çarekerdişî persa Kurdistana no rayero demokratîk kar biyari. Herkes ke na hareket de ca geno bi namê xo ya ca geno, nê bi namê partîya. Partî heta ewro midahalê karî ma nêkerdo, la ma re ardim kerdo. Partîyan bi destî sendîqa û komelanî xo ya, paşt daya ma. Ma televîzyonî kar ardî. Hîrê husîsîyetî muhîm ê na hareket estî:

- Na hareket cemaatî ya
- Na hareket dinya de yena sinasmayiş û meşru ya
- Wext ke prosesî vîcnayiş sernêkuiro, hareketa sîyasî ya Kurdistan eşkena referendum biwazo

Helkewt Abdulla ya pey Fewzî Etruşî qisêkerd. Fewzî Etruşî kongrê Beyrut ra heta kongrê Sellahaddîn tim partîyanî Ereban federasyon qebul kerdîyen, la Saddama pey xo çarna va û qisêkerdişî xo îna rûmna:" Binatê Kurdan û Ereban de pirt ricîyayi, zaf bajaranî Iraq de însan têna semed ke Kurdî yenî kiştiş. Ez komîsyonî yasayî esasî ê Iraq de bîya. Yew tek roşnvîr û polîtîkwan Ereban federasyon qebul nêkeno. Goreyî BAASîyan Îsraîla veri duşmenî înan Kurdî. No hal de gereka Kurd tedbîrî xo bigrî.

Endamî komitê referandûm ê Ewropa Barzan Hemesûr xebatê komitê ê Ewropa ser agahdarî da goşdaran. Barzan va; " Ma wazenî piyerê dewletanî Ewropa û YE ya alaqa ruen û nê îmzayî ke amê topkerdiş înan bidi parlementoyî nê dewletan"

Goreyi agahdarîya komîteyo berz ê Referandumî înan 1 milyon 750 hezar îmza 22î aşmê kanûne de Newyork de daya Rexistinê Yewbîyayê Miletan(RYM). Kesî ke RYM de persî vîcnayişa alaqadar benî ne îmzê girotî û soz da ke înan bidî sekreterî RYM Kofi Annan.

Komîteyo berz ê Referandumî 5î na aşm de zi Cenevre de bi temsîlkaranî komîteyî heqî merdiman ê RYM a amê pîye het. Ni komite wazeno him heti sîyasî ya û him zi hetî heqî merdimana persa Kurdistan biyaro rojev. Di hedefî komîteyî referandûm estî.

Ê wazenî vîcnayişî Iraq (30.01.2005) a veri Kurdistan de yew referendum viraziyo. No referandûm ganî bi destî RYM virazîyo.

No nêbo ê wazenî rojê vîcnayişi yew referandumo nêfermî virazî. Ê wazenî forman vilakirî û îta de war ra yew pesr pers kirî. Goreyî nê pers îradeyî warî Kurdistan biyarî werte.

Semdî referanduma têna yew pers esta. Na pers înaya.

- şima wazenî Kurdistan Iraq ra abiriyo yan zi Iraq a pîya bimuno?

7î aşm de PSK Köln de wer da nê komîteyî.

Tirkî qisêmekîyen



Selim Çürükkaya

Yeno vatiş ke Tirkiye de yew qanûn vêcîyawo, goreyî nê qanûnî ha to yew merdim kişt, ha to kirdkî xeber da.Ti yew merdim bikişî, ti vîst kîlo eroîn birueşî, ti yew bomba berzî zerê yew camî, ti qicanî berî sarebibirnî, cezayê înan pîyerin zor vîst serribo.

Ti yew vîcnayiş de Kirdkî xeber bidî, cezayê nê zi vîst serr a.!

Şima tehmîn bikerîyen yew na serra pey wa vîcnayiş bibo.

Yew merdim ke biwazo wekîlî miletib, wext ke o pê ziwanî xo însanan ra rey biwazo; ca de miyerîkî tepişenî û benî mehkima vîst ser ceza dûnî ci.

Uca re zi ey erzenî hepisxane.

Miyerik şino hepisxane, roja bîn gardiyan yew kaxit dûnû ci.

Kaxitî ser de nê pers hê nuşte:
Namê to yo verîn:
Namê to yo peyîn:
Ti çi wext ameyî dinya:
Sucî to çina wo:
To kam ca de suc kerd:
To pê kamî hacetî suc kerd:
Ti qey suc kerd:
Embazî to ê suc kam o:
Wext ke to no suci kerdî, to zûnayn no suco, yan to nêzûnayn:

Miyerik wext ke nê persî wend,o berma!
Qelemê xo girot û nuşt

Namê to yo verîn: Mehmud
Namê to yo peyîn: Kerra
Ti çi wext ameyî dinya: 1950
Sucî to çina wo: Qisêkerdiş
To kam ca de suc kerd: Verî sehenzar însanî de.
To pê kamî hacetî suc kerd: Pê ziwanî xo
Ti qey suc kerd: Mi suc nêkerd.
Embazî to ê suc kam o: Embaz mi sehenzar ten bi.
Wext ke to no suci kerdî, to zûnayn no suco, yan to nêzûnayn: Mi zûnayn

Miyerîk kaxit kerd de, da gardîyan, uca ra pey zîyaretçî ey ûme. O şi zîyaretçî xo veri û va:
Xeber bide milete ma wa kes Tirkî xeber nêdo.
Wa pîyerpiya tim Kirdkî xeber bidî

Konferansa Ziwanê Kurdî Ya Dîyarbekirî

Hêvîya mi a ya ke, sek beyannameya peyêna konferansa ziwanê kurdî de qerar dîyayo, heme dezge û komikê ma û bi taybetî zî şarê ma, wa her wareyê ciwîyayişê xo, pey ziwanê xo bivîyarno... Hêna hêvîya mi a ya ke ma heme kurdî: Xo mîyan de mixil werdişê û zermendişê wedarî, Rêberê ma qefesan de wa nêbê zerencê şarî, Yewbînan rê sîneye bî, sey kekbiraran, Pêropîya biwarzî, govenda azadîya xo, Destan û kiftanê xo têyorkirî û Têfek ra tîlîlîyê xo biqîrî ke; Dost pey şad bo, dişmen şeq biteq o.

Ehmedê Dirihî



Rojanê 2-3yê Kanûne 2004î de salona şaredarîya Rezan ê Dîyarbekirî de Konferansa Ziwanê Kurdî virazîya. Par payîzî de zî na salone de 3 rojî Konferansa Edebîyatê Rojhelatê Mîyanênî û Zafkulturîye amebî viraştiş.

Bi munasebetê Rojanê Edebîyatî par zî û emserr zî hewteyêk salonanê şaredarîyan û merkezanê kultur û hunerî de semîner û panelî amey viraştiş.

Çîyo acêb zî no bi ke nê Rojanê Edebîyatî de û ne zi nê Konferansan de ca nêdîya lehçeya kirdkî (zazakî). Tenya mamosteyo erjaye Malmîsanijî seba kirdkî û kirdan bi kurmancî qisey kerd.

Eke zafkulturîya rojhelatê mîyanênî de ca dîyeno ziwananê tirkî, erebî, farisî û lehçeyanê kurdî ra zi kurmancî û soranî çî rê cayê kirdkî çin o? Halbukî nifûsê Dîyarbekirî hîrêne ra yew kird ê. Bajarê kirdan ra o yo tewr pîl Dîyarbekir o. Eke Dîyarbekir de zi kirdî, bi ziwanê xo ya nêeşkê edebîyatê xo bîyarî ziwan, ganî kamca kultur û hunerê xo ramojnê?

Par beyannameya peyên ê Konferansa Edebîyatê Rojhelatê Mîyanênî û Zafkulturîye de wina qerar dîya bi:

"Konferansa ma resa na netîce ke ganî vera lehçeyan, helwestê ma helwestêko demokratîk bo. Ganî seba averşîyayîşê heme lehçeyan î mkanî bêrî peydakerdiş. Ganî tekîlîyê mabeynê lehçeyan bêrê xurtkerdiş. Viraştişê termînolojî, îmlaya yewbîyaya û hewldayîşê seba ver bi yewbînîardişê lehçeyan zaf muhîm û lazim o. Bi taybetî sazgehê ke ziwan û edebîyatê kurdî ser o xebate kenê; sey merkezê kulturî, zaningeh û enstîtuyan, ganî no ware de xebatêka taybete bikî û wahîrê programêkê muşterekî bî. Nuştoxî, ganî bifekanê mehellîyan nê, bi formanê standardan ê lehçeyan binusî. Ancî heme nuştoxê kurdan ganî wendişê edebîyatê bi lehçeyanê bînan xo rê bikî bar û hewl bidê ke lehçeyanê ziwanê xo bimusî."

Emser beyannameya peyên ê Konferansa Ziwanê Kurdkî de zî wina qerar dîya:

"Lehçeyanê ziwanê kurdî heta nika bîyî dakeraya gelek munaqeşe û nakokîyan, labelê pêserbîyayoxê Konferansa Ziwanê Kurdî bawer kenê ke cêra abirnayîşê lehçande kurdî wa bibo wezîfeyê zanayandê kurdan. Eynî wext zanayan û dezgeyê zanayandê kurdan ser o ferz o, ke reng û rîçikê lehçeyanê ziwanê xo û naye reyde zî nexşeya lehçe û şêweyanê ziwanê xo, bi metodêko îlmî reyde dîyar bikê."

Ez zî wazena ke herkes goreyê nê qeraran têbigêro.

Nê xeletî yan zî mavajî şaşîtî ça ra yenê? Her çî ra ver na kemaneya ma Kirdan a. Vateyê verênanê ma ya, "Eke engimênê to bibo, mêse Bexda ra yena". Heto bîn ra na xeletî, ê kesî ke nê rojan organîze kenê, înan ra yena. Madem ke şima vengdanê Malmîsanijî û Haydar Diljenî, nê hurdîme zî zanayeyê kirdkî yê, şima çî rê pêşenê înan ver o, vanê ke, "şima ganî qiseyê xo kurmancî bikê, çunke ê ke yenî pêser, înan ra zaf tay merdimî kirdkî zanî, zêdaneyê înan kurmancî zanî." Îna nêbeno, biverdê wa kirdkî qiseyê xo bikê ke wa kirdkî zî aver şîyor o.

Par mi bi xo konferanse de ardibi ziwan ke rojanê winasîyan de ca bidîyo kirdkî ke şarê ma kirdan wa xo bişinasno, ziwanê xo ra hes biko û ziwanê xo ra wayîr bivecîyo. Saeta peyine de qerar dîya bi ke beyannameyê konferanse yo peyin sey tirkî, kurmancî, soranî û kirdkî zî bîyorc nuştiş. A şewe Malmîsanij ranêkewt, beyanname kurmancî ra açarnabi kirdkî. Labelê emserr qerarê parî reyna xo vîr a kerdo, ancî konferanse de ca nêdîyayo kirdkî. Reyna şan de saeta peyine de waşto ke beyannameyo peyin wa açarnîyo kirdkî. Roja bîne salona şaredarîye de beyannameyo peyin kurmancî û kirdkî dîyayî wendiş. Bultenê xizmetî yê şaredarîya Dîyarbekirî de hurdîme zi ameyî nuştiş. Keyeyê şaredarê ma Osman Baydemirî wa awan bo.

Na şaşitî tenya rojê edebîyatî û konferansa ziwanî de nêbena, çar serrî yo ke peynîya wisarî de festîvala kultur û hunerî virazîyenê, la bêrê û bivînê ke uca de zî ca nêdîyeno kirdkî. Rey-rey yew di şîîrî yenî wendiş û sey "Erê Eyşê" zî dihîrê deyîrî yenî vatiş. Ehendey!

Mavajîme Baroyê Dîyarbekirî emserr çîyêdo weşik dest pê kerd, buroşurê xo yê "Projeya Ji Bo Herkesî Edalet" pey kurmancîya zaf weşike nuştê û kerdî vila. Înan gore zî kirdkî her çî zanî, coka seba înan edalet lazim nîyo! Eke lazim bibêne ka nê buroşuranê xo biaçarnî kirdkî zî û vila bikerdêne!

No payîz de Kongreya Enstîtuya Ziwanê Kurdî ya Amed virazîya. Verî na kongre de seba mêmanan tekstêk kerdibi vila. O zî tenya kurmancî amebi nuştiş. Yanî hema her kes xo rê wina hesibneno ke tenya kurmancî ziwanê kurdan o. Sek lehçeyêka sey kirdkî çin bo, xo rê wina hesab kenê yan zî vanî ke heminê kirdan kurmancî zanenê. Serokê Enstîtuya Amedî kird o, heyran êdî ma kamî ra lome bikeri?

Xeletîyêka muhîme zî na ya ke qiseykerdişê qiseykerdoxanê Konferansa Edebîyatê Rojhelatê Mîyanênî û Zafkulturîye, Enstîtuya Kurdî ya Îstenbolî sey kîtabî dayo çap ro û konferansa emserrî de kerd vila. Labelê ê merdimê ke par qisey kerdîbî, înan ra tay tira no kitab de ca nêgirewto, la tay merdimî estê ke qet nêameybî konferanse ca dîyayo înan. Sey nimune, Dîlawer Zeraq qet nêamebi na konferanse, Deham Evdilfettah zî roja diyêne de resa Dîyarbekir û konferanse de qiseykerdox nêbi, hêna Torî peynîya konferansî de çend çekuyî vatî, qiseykerdişê Rohat Alakomî rexne kerdî la no kitab de seke înan zî qisey kerdo ca dîyayo meqaleyanê înan.

Merdimê ke par konferanse de qisey kerdî la ca nêdîyayo qiseykerdişê înan zî nê yê:

Helîm Yûsiv (Qiseykerdişê ey Taha Xelîlî wendbi), Khalid Khalife, (Bi erebkî qisey kerd û Yûnis Behramî zî açarna kurmanckî), Rohat Alakom, Khaled Tewekole ûêb.

Û qismê "Nîqaşa Serbest" de zî: Edîp Polat, Roşan Lezgîn(kirdkî û kurmancî qiseykerdi), Ahmet Kasimoşlu (mi kirdkî qiseykerdi) ûêb qisey kerdî.

Dr. Ferhad şakelî qiseykerdişê xo soranî kerdibi, labelê no kitab de kurmancî nusîya yo. Beyannameya peyêne ya konferansî bi kurmancî, soranî, kirdkî û tirkî amade bîye la no kitab de tenya ca dîyayo kurmancî. Coka zî o kitab raşt nîyo û merdim nêeşkeno sey çimeyêdo sehîh biewnîyo ey kitabî ra. Yanî tu hetan ra yew sîstematîk no kitab de çin o. Çî rê?

Hewteyê heqê merdiman ê emserînî de, merkezê pêroyî ya Tirkîya na komele, pey des ziwanî ke şaranê Tirkîya mîyan de yenî qeseykerdişî, sloganê xo ya emserîn, "Herkes farklı, herkes eşit" heme bîlbordanê şaredarîya Dîyarbekirî de zî aleqnaybî. Na reya verîna ke Kirdane de sloganê kirdkî (zazakî) yeno nuştişi û aleqîyeno. "Her kês zavînao, her kês vêraneo." kurmancî "Her kes wekhev, her kes bi rengê xwe." Çi heyfo ke kirdkîyê înan ra, kesî çîkek fehm nêkerd, coka şarê ma ra çew bin ra pey nêhesiya. Qey Homaya na kirdkîya kam ca ya û şima çira pey ziwanê ma kay kenî ?

Emser Dîyarbekir de serrnewaya ma tabelayê şewqînan ser o; pey kirdkî, kurmancî û tirkî pîroz bî. şaredarê ma wa her tim berxudar bo.

Hêvîya mi a ya ke, sek beyannameya peyêna konferansa ziwanê kurdî de qerar dîyayo, heme dezge û komikê ma û bi taybetî zî şarê ma, wa her wareyê ciwîyayişê xo, pey ziwanê xo bivîyarno...

Hêna hêvîya mi a ya ke ma heme kurdî:

Xo mîyan de mixil werdişê û zermendişê wedarî,
Rêberê ma qefesan de wa nêbê zerencê şarî,
Yewbînan rê sîneye bî, sey kekbiraran,
Pêropîya biwarzî, govenda azadîya xo,
Destan û kiftanê xo têyorkirî û
Têfek ra tîlîlîyê xo biqîrî ke;

Dost pey şad bo, dişmen şeq biteq o.



Alaqa: seyidxan@peyama-kurd.com

پاشماوەی ناسیۆنالیزم و....

بەرهەمی سەرهەڵدانی بورژوازی نوێ بوو لە ئورووپادا. کوردستانی سەدەی حەڤدەش لە قۆناغی دەرەبەگی دا، رایدەبوارد، یانی لە روالەتا بیری خانی نایەتە ریزی ناسیۆنالیزمەوە. ڕێزدار مەریوان وریا قانع بە پێوانەی ئەم فاکتە مێژووییە و هەروەها بە پاڵپشتی بیرورای ئەحمەدی خانی دەباتەوە قۆناغی " بەرەو ناسیۆنالیزم"«٧». لەمەڕ پێوەندی نەپساوەی سێ فاکتی: نەتەوە، ناسیۆنالیزم و دەوڵەت پێک بێنێ، بەڵکوو ئەوە بیری ناسیۆنالیستییە کە نەتەوە و دەوڵەت دێنێتەدی. چون نەتەوە پێکهاتێکی سیاسی هەیە نەک مێژوویی و دابین بوونی چەند مەرجی پێویست کە لە رەوتی پراکتیزەکردنی دروشم و مەبەستەکانی ناسیۆنالیزم بەر لە پێکهاتنی نەتەوە و دەوڵەت (بە مانای زانستی ئەمرۆیی) دێتە ڕوو. هەرچەند بەر لە ئەحمەدی خانی، شەرەفخانی بەدلیسی، فەقێ تەیران رچەیان شکاند و ڕێیان بۆ ئەو خۆش کرد؛ بەڵام ئەم بلیمەتە وەک هەڵگیرسێنی بیری نەتەوەخوازانە لە پێناو بەهێزکردنی پڕۆسەی کامڵ بوونی نەتەوەیی کورد و پێک هاتنی دەوڵەت، هەستی بە بەرپرسیارێتی و ئەرک وەخۆگرتی کردووە، هەڵوێستێک کە شوێنی خستە سەر بزووتنەوەکانی فەرهەنگی و سیاسی و سەدەکانی دواتر، یانی ئاواتەکانی خانی لە سەردەمی خۆیدا بوو بە بانگەوازێک بۆ ناساندنی پێناسەی فەرهەنگی کورد، تا رادەیەک کە ڕۆدینکۆ " مەم و زین " وەکەی بە هەمبەری شانامەی فیردۆسی و ئیلیاد و ئۆدیسەی هۆمێر دادەنێ کە لە دوایی دا بوو بە بزوێنەرێک بۆ ڕاپەڕین و هەوڵی سەرلەنوێ. هەروەک نەمر حاجی قادری کۆیی (١٨١٧- ١٨٩٧) ئەم هەلە دەقۆزێتەوە و هەڵدەکوتێتە سەر بیری چەوت و خورافی جەماوەر بە مەبەستی وەپێش خستن و بەرزکردنەوەی ئاوات و ڕێبازی نەتەوەیی کورد. یان بزووتنەوەی ئەمیر بەدرخان لە ساڵی ١٨٢١ز کە کریس کۆچێرا«٨» بە باوکی ناسیۆنالیزمی کوردی ناودەبا و هەروەها شۆڕشی شێخ عوبەیدوڵڵای شەمزینان لە ساڵی ١٨٨٠ز بەم ڕێبازەدا ئاژاوتوویانە، وێڕای شەپۆلی ناسیۆنالیزمی نوێی ئورووپایی - یەکێ لە خاڵە گرینگەکانی ناسیۆنالیزم تێکۆشانە بۆ سەقامگیربوون و ناساندنی پێناسەی نەتەوەیی، فەرهەنگی. لەم بەستێنەدا دەوڵەمەندکردنی زمان وەک ئامرازێکی کاریگەر، دەوری بەرچاو دەگێڕێ لە بەئەنجام گەیاندنی ئەم ئامانجەدا. بەشێک لە داڕشتنی مەم و زین، ناساندنی ئەم گەلە چەوساوە و لە مێژینەیە بوو لە ڕێی : یەکەم ، رەنگدانەوەی خۆزیا و ئاواتەکانی بە مەبەستی خێراکردنی پڕۆسەی بە نەتەوەبوون. دووەم، ناساندن و دەوڵەمەند نیشان دانی زمانی ئەدەبی نووسراوەی کوردی لە قاڵبی چیرۆکێکی تراژیدی بە هەموو داب و نەریت و فەرهەنگی کوردەوارییەوە. هەروەک خۆی دەڵێ:

" بێگانە نەڵێن کە کورد نەزانن
بێ نووسەر و هۆنەر و زمانن
پێمان نەڵێ وێژەوانی بیرورد
دڵداری نەبوو لەناو گەلی
کورد"«٩»

بە بیانووی جەخت کردن لەسەر زمان، سەر لەنوێ تاقگەی ئاواتە خەوتووەکانی دێنەوە خرۆش و یەکسانی و دادپەروەری خۆی ئاوا دەنوێنێ و خۆزگە وەی دەخوازێ کە بڕیا سەردارێکی کورد دڵنوایی بکردایە و نرخی گەوهەری شیعرەکەی زانیبا:

"کورد هێندە نە گێل و گێژ و کاسن
داخم ئەوە بێ کەسن، کەساسن
ژیر و بەدڵن گەلێک دەزانن
بێ خێرییە بێسەر و زمانن
بۆمەش کە هەبایە خێو و سەردار
بەخشندە و ژیر و زیت و وشیار
ژیری و هونەری بەدڵ کڕیبا
ژەنگی لەدڵی هەژار سڕیبا
من ئێستە لە کۆڕی وێژەوانان
ئاڵم دەشەکا لە عاسمانان"«١٠»

بەم چەشنە 'مەم و زین' ی خانی لە گوێن میراتێکی نەتەوەیی کورد لەلایەک کەوتە بەر سەرنجی لێکۆڵەرانی وردبین لە هەندەران. بۆ وێنە تا ئێستا چەند جار لە وڵاتانی : ڕووسیا، فەرانسە، ئاڵمان، سوئێد، ئێران، عیراق و سووریا چاپ و بڵاوکراوەتەوە. لەلایەکی تر کەوتۆتە بەر ڕق و تووڕەیی نەیاران وەک، دەوڵەتی تورکیا سێ هەزار نوسخەی جڵدنەکراوی چاپی ١٩٦٨ی سووتاند و وەرگێڕ و بڵاوکەرەوەکەی دایە دەست دادگا. وەک پوختەی مەبەست، ئەگەر لە ڕوانگەی مێژووی سەرهەڵدانی نەتەوەخوازی، بیری ئەحمەدی خانی نایەتە ریزی ناسیۆنالیزمەوە، بەڵام بە پاڵپشتی تێبینی و بۆچوونەکانی بەرباس، ئەو بەسەرقافڵە و ئاڵا هەڵگری "ناسیۆنالیزمی سوننەتی کورد" دەناسین. شێوازێک لە ناسیۆنالیزم کە بووژانەوە و گەشە و پەرەسەندنی ناسیۆنالیزمی ئێستای کورد لە دەسکەوتەکانی ئەو دێتە ژمار. ئەگەر ڕەوتی مێژووی سەرهەڵدانی مەکتەبە فەلسەفی و ئەدەبییەکان بەگوێرەی : سوننەت - مۆدێرن - پاش مۆدێرن، بەڕێوە چووە، ڕەنگە پێوەندی نێوان ناسیۆنالیزمی سوننەتی خانی و ناسیۆنالیزمی ئەمڕۆی کوردیش هەر بەم شێوازەبێ. بەڵام دەسپێک و سەرەتای بیری نەتەوەخوازی ئەم مەزنە پیاوە لەونێکی تر و ڕێبازێکی تری هەبووە، بەم چەشنە کە دەربڕینی بنەماکانی تیۆرێکی ناسیۆنالیزم لەلایەک لەباری قۆناغی مێژووییەوە ناتەبایی هەبووە لەگەڵ بارودۆخی نێوخۆ، لە هەمان کاتا لەگەل هەل و مەرجی ئورووپای سەدەی حەڤدەدا هاوڕێک و هاو سروشت بووە. سەردەمێک کە لەودا بورژوازی نوێ، دوای دامەزرانی خێرای دەوڵەت بەرەو دابین کردنی بنەماکانی دێموکراسی و لیبرال دەئاژوا، مارتین برۆنسین ناحەقی نەبووە ئەگەر شک و گومان بکا لە دەربڕینی ئەم چەشنە بۆچوونەی خانی لە کوردستانی ژێر رکێفی نیزامی دەرەبەگی دا، بۆچوونێک کە خاوەن و هەڵگری بنەماکانی سەرەکی دیاردەیەک بێ کە چەند سەدە دواتر پێ دەنێتە جیهان. ئەگەر مەم و زین دژ بە ویست و زاکوونی دڵڕەشان، سۆز و گڕی ئەوینیان کردە مەشخەڵ و بەرە و نووچکەی بەرزی ئاوات ڕێیان بڕی، بەڵام بە دنیایەک حەز و تاسەوە سەریان ناوە ژێر بارستی گڵ، خانیش بە دڵی کەیلی تاسە و ئاوات هەروەک ئەوان .....

• • • • • • • • • • • • • • •

سەرچاوەکان:

١- حەسەنپوور - ئەمیر، گۆڤاری گزینگ، ژمارە ١٢.
٢- ئەبریشەمی - عەبدوڵڵا، نقد و بررسی ناسیۆنالیزم، چاپ اول ١٣٧٣هـ .
٣- شەرەفکەندی - عەبدورەحمان " هەژار"، مەم و زینی خانی هەژار کردوویە بە موکریانی.
٤- هەمان
٥- برۆنسین - وان مارتین، گۆڤاری گزینگ، ژمارە ١٤.
٦- سەرچاوەی ژمارە ٣.
٧- وریا قانع - مەریوان، گۆڤاری ڕاڤە، ژمارە ٢، ١٣٨١هـ
٨- کۆچێرا - کریس، جوولانەوەی ڕزگاریخوازانەی کورد.
٩- سەرچاوەی ژمارە ٣.
١٠- هەمان.

پاشماوەی لە نەێنییەکانی ناو....

سیستەمەکانی گەردوون و بە نەێنیبوونی سیستەمی سەربەخۆی خود بۆ پێکهێنانی کۆمارێکی نوێ تێیدا خود بە شێوەیەکی دی دەسەلات دەگرێ ئیتر یاساکان دەبنە هێمای جەستە و وەک بیابانێکی وشک و بێڕەنگ دەمێنێتەوە بۆ یارییەکانی خودی تاک، لەبەر ئەوە جەستە شوێنی سەنگەربەستنی شەڕە دەروونییەکانی تاک و یەکایەتی هەمیشەیی سیستەمە واتە هێمای جوولانە بۆ ئاراستەکردنی لایەک لە جەمسەرەکانی شەڕی خود. دەمانەوێت بگەینە ئاستی ئەو دەرچوونە گەردوونییەی نەێنییەکان دەیکەنە کۆمارێکی ئارام و ڕەنگا و ڕەنگی جەستە لە دەرەوەی خود، ئەوەش لە دەستپێکردنی بوون کێشە هەرە سەرەکییەکانی تاکی خودە بووەتە هێمای ترس و پر لە دڵەڕاوکی چۆن ئەو دەرچوونە بسازێ لە ڕووی خەیاڵی ترسی سروشت یان لە ئاستی هێماکانی ژیرییەتی خود خۆی، ترسە گەورەکەی خەیاڵ تاک دەخاتەوە ناو نەێنییەکی زەبەلاحی بێ بەرجەستەی نادیار بە گەلەکۆمەکەیەکی جەستەکان لە نێوان خود و گومانی سروشتدا، نادیارەکان نەێنییەکی ترسناک دەخەنە ئاستی ئەودیو فەنتازیاوە ئیتر بارسیتەی تێڕوانینی جوولەی خودی تاک دەشکێ و بەرجەستە دیارەکان وندەبن و دەگۆڕێن بۆ کۆتەلێک تا لە سەرەمەرگیشدا بە گومانەوە خود کۆتایی پێدێت، تاکەکان زۆر خێرا لە ڕووی هێماکانی ژیرییتیدا بە دابڕانی ئەو دەستوورە هەمیشەییەی دنیا نادیارە خەیاڵییەکان زۆر زوو دەردەکەون و وێنەیەک لە بارستەی جوولەوە یان عەقڵی تاکی خود بەرجەستە دەبێت و دنیایەکی نوێ و گەردوونێ سروشتی پڕ لە پەیپێبردن و تێڕوانینی خود پێکدێ ئەوەش لە کاتێکدا ترازانی سنووری جەستەی خودە لە دڵەڕاوکێ ترسناکەکاندا خەیاڵی لێکچووی سیستەمی کۆمەڵ و خەیاڵە نادیارەکانی دەسەلاتی تاک و گۆڕینی بۆ نابەرجەستەیی و خۆبەدەستەوەدانی سروشت، ئیتر ئەوە دەبێت کە خود دەفڕێ بەنێو هەموو بۆشاییەکانی گەردوون و هیچ بەربەستێک نامێنێ بۆ شەڕی سیستەم و چەسپاندنی بوونی نادیار. نەێنییەکان هێمای ئەو دەرچوونەن تەنها پەیوەندی بە بزێوی خود خۆیەوە هەیە و هەر ئەوەش دەتگەیەنێتە ئاستی خۆبەخۆیی و نەمانی سنووری شتەکان. نەێنییەکان بەرجەستەیەکن بۆ خود زۆر بە ئاسانی تێدەڕژێ و تاک دەخەنە گومانێکی ترەوە واتە لە سنووردەوە بۆ بێ سنووری و بەگژداچوونی بەردەوامی لەیەکچوون، لەگەڵ ئەوەشدا زۆرکەم لە خودەکان توانای ئەم شکانەوەیان هەیە و دەتوانن نەێنییەکان بەرجەستە بکەن و خۆ لە دەسەلاتی دەستووری جەستە دەرکەن، لەبەر ئەوە شەڕەکە دەبێتە هێمای دیار و نادیار، سنوور و ناسنوور، خەیاڵ و یاسا و پێکهێنانی سروشتێکی تر لەناو گەردونی بوواندا. کەواتە دەگەینە ئەوەی خودی تاک زۆر پێویستی بەو بازدانە هەیە لەناو تونێڵی جەستەو دنیای دوبارەبوونەوە بۆ ناو نەێنییەکانی کۆمارە سەربەخۆکەی خود تا ئیتر جەستە جوانتر و تێڕوانین نوێتر و ژیرێتیش تیژڕەوتر و بەرجەستە تر بێت، بە نەێنییەکانی ناو خودی تاک ئیقاعی سیستەمی کۆمەل دەگۆڕێ بۆ جۆرێ لە بەرپابوونی شکانی سیستەم و سڕینەوەی گومان و دڵەڕاوکێی جەستە.

کەلووەکانی هەفتە



کاوڕ ٣.٢١ تا ٤.٢٠
هەوڵ بدە سوود بە خزم و کەس و کارت بگەیەنیت بەتایبەتی کاتێک توانای دارایی باشتر دەبێت، لەگەڵ خێزانەکەتدا ڕێک و پێکتر بە.



گا ٤.٢١ تا ٥.٢٠
بار و دۆخی ژیانت بەرەو باشتر دەڕوات کەچی هەر گلەیی لە بەختی خۆت دەکەیت؟ ئەوەندە ناشوکر نەبە و گەشبین بە بەژیان.



دوانە(جمک) ٥.٢١ تا ٦.٢١
گیر و گرفتەکانت لەگەڵ خێزانەکەتدا بەرەو کۆتایی دەڕوات و لاپەرەیەکی تازەی پڕ لە خۆشی و کامەرانی دەست پێ دەکات.



قرژاڵ ٦.٢٢ تا ٧.٢٢
لەبواری کار کردنتدا سەرکەوتنێکی باش بەدەست دێنیت، هەوڵ بدە ئەو سەرکەوتنە پەرە پێ بدەیت چونکە داهاتوویەکی گەشی بە دواوەیە.



شێر ٧.٢٣ تا ٨.٢٢
هەرچییەک بکەیت هاوڕێ کۆنەکانت لە تازەکان باشترن چونکە کۆنەکان خەمخۆرتن و پتر بیر لە بەرژەوەندی تۆ دەکەنەوە.



فەریک ٨.٢٣ تا ٩.٢٢
ژیانت بەشێوەیەکی ساده دەڕوات و هیچ جۆرە گۆڕانکارییەکی ئەوتۆ لە ئارادا نییە.



تەرازو ٩.٢٣ تا ١٠.٢٢
هێشتا هەر پێویستیت بە هاوسەنگکردنی باری دارایی هەیە، تێکەڵاوی کەسانێکی ڕێک و پێک دەبیت، سوودیان لێ وەربگرە.



دوو پشک ١٠.٢٣ تا ١١.٢١
سوود لە هەڵەکانی پێشووت وەربگرە، ڕێگەی ئایندەیەکی گەش کەمە کەمە والا دەبێت لەبەردەمتدا.



کەوان ١١.٢٢ تا ١٢.٢١
نەرم و نیانتر بە لەگەڵ خێزانەکەتدا و تۆزێک لەو تورەبوونەت کەم بکەرەوە.



گیسک ١٢.٢٢ تا ١.١٩
باری هزری و دەروونیت یەکجار خراپن بەڵام لەگەڵ ئەوەشدا داهاتووت زۆر ڕوونە و سەرکەوتنی گەورە بەدەست دێنیت.



سەتڵ ١.٢٠ تا ٢.١٨
پرۆژەیەک یان بڕیک پارە بەڕێگەوەیە بۆت، دڵی خۆشەویستەکەت بدەرەوە چونکە لێت ڕەنجاوە.



نەهەنگ ٢.١٩ تا ٣.٢٠
ئەو هەنگاوانەی کە لە هەفتەکانی ڕابردوودا ناوتن لەجێی خۆیانبوون و سوور بوونت لەسەرن ئەو ڕێبازە واتای سەرکەوتنی گەورەیە لە ژیانتدا.

بۆ ئابونە بوونی پەیامی کورد فورمی خوارەوە پرکەنەوە و لەگەڵ حەوالەی بانکی بە ناونیشانی ڕۆژنامە بە ڕێگای پوستدا ڕەوانەی بکەن.

ناو/ پاشناو : .....
ناونیشان : .....

ئەڵمانیا:
٦ مانگ ٤٠ € ساڵێک ٧٠ €

وڵاتانی یەکێتی ئورووپا:
٦ مانگ ٦٠ € ساڵێک ٩٠ €

ئەمریکا، کانادا، ئوسترالیا:
٦ مانگ ٧٠ € ساڵێک ١٢٠ €

Commerzbank Bonn
V. Efe / peyama kurd
konto: 1007947
BLZ: 380 400 07

Commerzbank Bonn
V. Efe / peyama kurd
IBAN DE38 3804 0007 0100 7947 00
BIC: COBADEFFXXX

Peyama Kurd, Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn, Germany
Tel. : +49 (228) 18 00 654 - 18 00 655, FAX: +49 (228) 18 00 656
www.peyama-kurd.com, email: info@peyama-kurd.com

کورد لە دۆسێی هەڵبژاردنەکانی عێراقدا



زیرەک کەمال ئەندامی سەرکردایەتی حزبی شیوعی کوردستان و ئەندامی لیژنەی باڵای بزووتنەوەی ریفراندۆم لە کوردستان



سەلاحەدین بابەکر ئەندامی سەرکردایەتی و بەرپرسی مەکتەبی راگەیاندنی یەکگرتووی ئیسلامی کوردستان

جارێکی تر کورد بە ئەزموونێکی تری چارەنووسسازدا تێدەپەڕێتەوە ، ئەویش ئەزموونی هەڵبژاردنەکانی پەرلەمانی عیراقی و پەرلەمانی کوردی و هەروەها نوێنەرەکانی ناو شارەوانییەکانی ناو عیراق . جارێکی تر کورد خۆی دەداتەوە دەست ئەزموونێکی تر لە شێوەیەکی تر ، ئەزموونی پراکتیزە کردنی دیموکراتییەت لە ڕێی هەڵبژاردنەکانی پەرلەمانی عیراق لەدوای ڕووخانی ڕژێمی گۆڕبەگۆڕی سەددام حوسێنی. ڕۆژی ٣٠ جەنیوەری ٢٠٠٥ ڕۆژێکی زۆر گرنگە بۆ هەموو عیراقییەکان بە گشتی و بۆ کورد بەتایبەتی ، ماوەیەکە لەلایەن نووسەر و شارەزایانی بواری سیاسەت و بیرەجیاجیاکانی کورد و هەروەها عەرەبیش ، ڕێ ئەوانەی دژستی کوردن و ڕێ ئەوانەی دوژمنی کوردن، باس و خواسێکی زۆر لە ئارادایە دەربارەی بەشداری کردنی کورد لەو هەڵبژاردنانە، و هەروەها ئاگەری بەشداری نەکردنی کورد لەو هەڵبژاردنانەدا .

ئایا بەشداریکردنی کورد لە هەڵبژاردنەکانی داهاتووی عیراق لە ٣٠ جەنیوەری ٢٠٠٥دا بە یەک لیست مانای چی دەدات بەدەستەوە و ڕێ ئامانجێک دەپێکێت؟ ئەی ئایا بەشداری نەکردنی کورد لەو هەڵبژاردنانەدا ڕێ ئاکام و ئەنجامێکی لێدەکەوێتەوە؟ ئایا جیاوازی چیە لەنێوان ئەوەی هێزە کوردییەکان بەشداری هەڵبژاردنەکان بکەن بە لیستێکی هاوبەش لەگەڵ خۆیاندا ، یان بەلیستێکی هاوبەش لەگەڵ هێزە سیاسیە عەرەبیە "سوننیەکان" بۆ نموونە ، و کاریگەری ئەوەش چی دەبێت لەسەر ئاکامی هەڵبژاردنەکان؟ ئایا چۆن دەتوانین داهاتووی سیاسی کورد هەڵسەنگێنین لەدوای بەشداری کردنی لە هەڵبژاردنەکاندا ، لە چوارچێوەی سیستەمێکی فیدرالی لە عیراقی داهاتوودا؟

ئەمانە و گەلێ پرسیاری تر کە لای خەڵکی سادە و خەڵکی تایبەتمەند و بەدواداچوو دروست دەبن ، بۆ وەڵامدانەوەی ئەو پرسیارانە و خستنە ڕووی ڕێنوێنیەکان لەو بارەیەوە بەباشمان زانی هەتا ڕۆژی بە ئەنجام گەیاندنی هەڵبژاردنەکان لاپەڕەیەکی تایبەت بۆ تاووتوێکردنی هەموو لایەنەکانی ئەو مەسەلەیە، ئەوەش بە ڕووبەڕووکردنەوەی ئەو کۆمەڵە پرسیارە لە کۆمەڵێ نووسەری عەرەبی شارەزا و تایبەتمەند لە بواری فیکر و سیاسەتدا ، هەروەها نووسەر وشارەزای کورد لە هەمان بواردا .

ئامادەکردنی : ڤینۆس فایەق

دیمانە: سلێمان یاسین ـ هەولێر
فۆتۆ: کەمال ئاکرەیی ـ هەولێر

•گرنگی بەشدرایکردنی کورد لە هەڵبژاردنەکانی داهاتووی عیراقدا:

سەلاحەدین بابەکر: هەر یەک لەو سێ هەڵبژاردنانەی کە بڕیارە لە ڕۆژی ٢٠٠٥/١/٣٠ ئەنجامبدرێت، گرنگی تایبەتی خۆی هەیە بۆ کورد، بە نیسبەت هەڵبژاردنی ئەنجومەنی نیشتمانی عێراقی واتە پەرلەمانی عێراقی، ئەوە هەتا (لیستی هاوپەیمانی کوردستان) کە لیستی هاوبەشی سەرجەم حزب و هێزە سیاسی و نەتەوەیی و ئایینیەکانی کۆمەڵگەی کوردستانە، دەنگ زیاتر بهێنێ، ئەوە کورسی زۆرترمان لەپەرلەمانی عێراقیدا بەردەکەوێت، ئەو کات باشتر و بەهێزتر دەتوانین داواو بەرگری بکەین لە مافە ڕەواکانی کوردو گەلی کوردستان و لە دەستووری نوێی عێراقدا بیان چەسپێنین، ئاشکراشە کە یەکێک لە ئەرکە گرنگ و سەرەکییەکانی پەرلەمانی داهاتووی عێراق بریتییە لە دانانی ڕەشنووسی دەستووری نوێی عێراق، جا لەبەرئەوە ئەرکێکی مێژوویی و نەتەوەیی و نیشتمانی هەر تاکێکی کورد و گەلی کوردستانە کە بەشداری لەو هەڵبژاردنەدا بکات.

بۆ هەڵبژاردنی پەرلەمانی کوردستانیش، کە بە داخەوە دەبوو تا ئێستا چەند جارێکی دیکەش ئەنجامدرابایەوە، ئەوە هەر گرنگە بۆ کورد، چونکە پەرلەمانێکی نوێی بنکە فراوانی لێدەکەوێتەوە، دوای ئەوەش هەر دوو ئیدارەکە یەکدەگرنەوەو دەبینە خاوەنی حکومەتێکی بنکە فراوانی یەکگرتوو، بەمەش پێموایە کۆتایی دێت بە دوو پارچەیی و دوو ئیدارەیی کە خەونێکی چەند ساڵەی خەڵکی کوردستانە.

هەرچی هەڵبژاردنی پارێزگاکانیشە، ئەوە ئەزموونێکی نوێیە لە عێراقدا، ئەنجومەنی پارێزگا کە لە ٤١ ئەندام پێکدێت، دەسەلاتێکی بەرفراوانی هەیە لە سنووری پارێزگاکەیداو میزانیەی تایبەتیشی دەبێ، دەتوانێ خزمەتگوزاری زۆرباش پێشکەش بە هاوڵاتیانی سنووری پارێزگاکەی بکات، ئێمەش لە کوردستاندا پێویستمان بەو جۆرە ئەنجومەنانە هەیە لە پارێزگاکانماندا.

زیرەک کەمال: سەرەڕای ئەوەی لە ٩ی نیسانی ٢٠٠٣ دەوڵەتی عێراق لەسەرجەم ئاستەکاندا هەڵوەشا، بەڵام لەگەڵ ئەمەشدا عێراق لەسەر ئاستی شەرعییەتی یاسایی نێودەوڵەتی وەک یەک قەوارەی سیاسی- جوگرافی مامەڵەی لەگەڵدا دەکرێت، بۆیەش هەر بڕیارێک کە بۆ عێراق وەکو دەوڵەت بدرێت دەبێت بەشەکانی دیکەش، بۆ نموونە کوردستانیش دەبێت جێبەجێی بکات و بۆیەش هەڵبژاردنی کۆتایی ئەم مانگە لە عێراقدا بڕیارە بەڕێوەببێت کوردستانی ئێمەش دەگرێتەوە، لەبەرئەوە من بە مەسەلەیەکی ئاسایی دەزانم کەوا گەلی کوردستانیش بەشداری ئەم پرۆسەیە بکات، بەڵام نایشارمەوە خۆزگەی ئەوەم دەخواست کە لە ساڵی ١٩٩٢ کەوا گەلەکەمان پێشەنگە سیاسییەکانی یەکەم ئەزموونی دیموکراتی خۆیان لە هەڵبژاردنێکی سەرانسەریدا تاقیکردەوە، دەبووا بەردەوام بووینایە لەسەر نمایشکردنی ئەم ئەزموونو هەرگیز لێنەگەڕابان کەلتووری ئەڕی نێوخۆ خۆی بخزێنێتە نێو هەناوی کۆمەڵگای کوردستان. خۆزگەی ئەوەم دەخواست کە هەرچوار ساڵێک جارێک لە ڕێگای سندوقی دەنگدان و ڕای گشتی جەماوەرەوە پایەو ناسنامەی دەسەڵاتی یاسایی و حکومی خۆمانمان نوێ بکردبایەوە، بەڵام ئەمە نەبوو کە نەشبوو هەموومان باجەکەمان دا.

هەروەها مایەی نیگەرانیشە بەشداری ئێمە وەکو گەلی کوردستان لەم پرۆسە هەڵبژاردنە لە بڕوابوونمان بەمەسەلەی هەڵبژاردن سەرچاوەی نەگرتووە، بەڵکو لەژێر فشاری ڕای گشتی جیهانی و ناوەندی سیاسی عێراقدا دەچێتە نێو ئەو پرۆسەیەوە.

• کاریگەری بەشدرایکردنی کورد بە یەک لیست لەگەڵ هێزە کوردییەکاندا یان لەگەڵ هێزێکی عیراقیدا بەتایبەت هێزێکی سیاسی سوننی:

سەلاحەدین بابەکر: هێزە کوردی و کوردستانییەکان بڕیاریانداوە بەیەک لیست بەناوی " لیستی نیشتمانی دیموکراتی کوردستان" دابەزن، ڕاستە ئەو لیستە سەرجەم حزب و هێزەکانی تێدا نییە، بەڵام زۆربەی هەرە زۆری حزب و هێزە سیاسییەکانی کورد و کوردستانییەکانی تێدا بەشدارە، بێگومان بەیەک لیست دابەزینی هێزە کوردی و کوردستانییەکان کاریگەری زۆرترو باشترەو لەبەرژەوەندی گەلی کوردستاندایە، چونکە ئێمە داواکاری و بەرژەوەندی تایبەتی خۆمان هەیە لە کوردستانداو باشترواییە بە هەموو لایەکمانەوە هەوڵی هێنانەدیان بدەین، پێموایە ئەمڕۆ لەبەرژەوەندی کورددا نییە بچێتە ناو هاوکێشەی مەزهەبییەوە، مەگەر وەختێ بزانین بەرژەوەندی نەتەوەیی و مەزهەبیمان وەکو کورد و سوننە کەوتۆتە مەترسییەوە لەلایەن عەرەبی شیعە مەزهەبەوە، ئەوکات دەکرێ لەگەڵ هێزێکی سیاسی سوننەی عەرەبدا شتێک بکەین، بەڵام هیوادارین تووشی ئەم جۆرە حاڵەتانە نەبین.

زیرەک کەمال: کورد کارێکی باشی کرد کەوا لەسەر ئاستی عێراق و کوردستاندا بەیەک لیست چووە نێو کۆڕی هەڵبژاردن، چونکە یەک لیستی بەڕووی ناوخۆی کوردستندا گەلەکەمانی لە هەر جۆرە سەرلەنوێ پارچە پارچە بوون و کولاندنەوەی برین و بۆژانەوەی ڕقوکینەی شەڕی نێوخۆ پاراست، بەڕووی دەرەوەشدا کورد سەلماندی کەوا ئەگەر لەقۆناغێکدا نەشیتوانییێت جیاوازییەکانی خۆی لەچوارچێوەیەکی عەقڵانی دابڕێژێت و لەسەر مەسەلەی دەسەڵات دیموکراسیانە ڕێکبکەون، ئەوا توانای ئەوەشی هەیە لەنێو ڕاڕەوە چارەنووسسازەکاندا بەیەک گوتاری سیاسی وەڵامی پێشهات و دەرکەوتەکان بداتەوە.

• هەڵسەنگاندنی پاشەڕۆژی سیاسی کورد لە چوارچێوەی سیستەمێکی فیدرالی لە عیراقدا:

سەلاحەدین بابەکر: فیدراڵییەت بۆ کوردستان خیاری گەلی کوردستانە و پێش زیاتر لە ١٠ ساڵ لەمەوبەر لەلایەن پەرلەمانی کوردستان بڕیاری لەسەر دراوە، پێموایە پاشەڕۆژی سیاسی کورد و خەڵکی کوردستان لە چوارچێوەی سیستەمی فیدراڵی لە عێراقدا پاشەڕۆژێکی ڕووناک و پڕشنگدارەو، پێویستە لەسەر هەموو لایەکمان لە دەستووری نوێی عێراقدا ئەو فیدراڵییە بچەسپێنین.

زیرەک کەمال: من ناتوانم نە بەئیجابی و نە بە سلبی یاخود نە لەسەر بناغەیەکی ڕەشبینی ڕەها و نە لە دەروازەی گەشبینییەکی مژدە ئامێزیش بڕوانمە ئایندەمان لە عێراقی نوێدا، چونکە ئەمە بەندە بە چۆنیەتی خۆ ئامادەکردنی گەلی کوردستان و پێشەنگە سیاسییەکانی، واتە بوونی ئێمە وەکو میللەتێکی خاوەنی ماف و قەوارەو ئاسوودە بەندە بە لێزانی و عەقڵیەتی دیپلۆماسی و هونەری کارکردنی خۆمان نەک پەیوەست بێت بە شتی دیکەوە، نەک نابێت ئێمەی کورد هەرگیز ئەوەمان لەبیربچێت کەوا لە دنیای سیاسەتدا ئەخلاقیاتی هاوبەشی نییە، بەڵکو ئەوەی هەیە تەنها بەرژەوەندی هاوبەش هەیە، واتە ئەوەی لەنێو کایەی سیاسەتدا سەرە جەمسەرەکان بەیەک دەگەیێنێت بەرژەوەندی هاوبەشە نەک ئەخلاقیات و بەهای مێژوویی هاوبەش، بە تایبەتیش لە ڕۆژگاری ئەمڕۆدا سیاسەت لە هەموو جوانی و مرۆڤدۆستی هەحیقیقەت و ئیستاتیکایەک بەتاڵ بۆتەوەو خودی سیاسەت خۆی بارگاویکراوە بە دەمارگیری و توندڕەوی، واتە لەجیاتی ئەوەی ببێتە هونەری ئیدارەدان و میکانیزمی ڕێکخستنی کۆمەڵگا بۆتە مایەی پارچە پارچەکردن و لەیەکترترازانی بەشە جیاوازەکانی کۆمەڵگا.

• بەشدارینەکردنی کورد لە هەڵبژاردنەکانی عیراقدا چی دەگەیەنێت؟

سەلاحەدین بابەکر: وا نازانم ئەوە خیاری کورد بێت، بێجگە لە هەر هەڵبژاردنی پارێزگای کەرکوک ئەویش لەبەرئەوەی مادەی ٥٨ی قانونی ئیدارەی دەوڵەت جێبەجێ نەکراوە، چونکە ئەمڕۆ کورد هەژدەیێکدا نەشیتوانیبێت جیاوازییەکانی لەگەڵ ئەوەی هەیە لەگەڵ ئەوانەی دیکەدا بەڕێوەببات، ئەوا چۆن دەتوانین بەرپرسیارانە بڕیار لەسەر چارەنووسی خۆمان بدەین، ئەوە ئەرکی سەرشانمانە بەرەوپێش بچێت.

زیرەک کەمال: ڕێکخراوی مالی کورد و ئەڵمان پاش نیوەڕۆی ٢٠٠٥/١/٨ لە **Alterfeuerwache** لە شاری کۆڵن. بە بەشداری نوێنەرانی چەند پارت و ڕێکخراوێکی کوردستان و یاساناسانێک و ڕۆژنامەنووسێک، مێزگردێکی بۆ گفتوگۆ کردن دەربارەی هەڵبژاردنەکانی کوردستان و عێراق ساز کرد، کە پێکهاتبوون لە بەڕێزان خالید مەجید "یاساناس" و دانا عەلی"ڕۆژنامەی پەیامی کورد" و شاهۆ تۆفیق"ڕۆشنبیر"و جیهان بەخش ڕوستەمی" نوێنەری مالی کورد و ئەڵمان" و عەدنان بەکر"نوێنەری پ.د.ک" و سەیدا ئاراس" نوێنەری یەکگرتووی ئیسلامی" و قادر وەرتێ" نوێنەری ی.ن.ک" و محەمەدی میسری" نوێنەری کۆمەڵەی زەحمەتکێشانی کوردستان" و حەمەلاو کەریم" بەرپرسی ڕێکخراوی کورد و ئەڵمان". سەرەتای کۆڕەکە کاک حەمەلاو کەریم دوای بەخێر هاتنی هەمووان باسی لە هەل و مەرجی ئەمڕۆی کوردستان و ئامانجی مێزگردەکە کرد بۆ تیشک خستنە سەر بەرنامەی لایەنەکان بۆ هەڵبژاردن و مسۆگەرکردنی مافەکانی گەلی کوردستان. پاشان هەر یەک لەو بەڕێزانە ڕاوسەرنجی خۆیان بۆ ئامادەبووان شیکردووە. لەو ناوەندەشدا بەڕێز هەڵکەوت عەبدوڵا وەک نوێنەری بزووتنەوەی"ڕیفراندۆم" بۆچوونی ئەندامانی کارای بزووتنەوەکەی لە بڕوانەبوون بەو هەڵبژاردنە و بەشدارینەکردنیانی ڕوون کردەوە. ئەوەی شایەنی باسە ئەو پرسیارانەی" ڕێکخراوی مالی کورد و ئەڵمان" کردیە بە دەسپێکی مێزگردەکە سەبارەت بە کێشەی کەرکوک و ناوچە بەعەرەبکراوەکان و جێبەجێ نەکردنی مادەی "58 " لە دەستووری کاتی عێراقدا و ئەو بەرنامە و چالاکی و ئامادەکارییانەی بۆ هەڵبژاردن مێزگردەکەی بەسەر دوو تەوەردا دابەش کرد بوو، کە پێکرا ئاماژەیان بۆ ئاماری پرۆسەکە و قەوارەی خواستەکانی گەلی کورد و شێوەی بەشداریکردنی دەنگدەران دەکرد. هەربۆیە چەندین ڕاو بۆچوونی جیا جیا سەبارەت بە پرۆسەکە و قەیرانەکانی هەڵبژاردن خرایەڕوو، کە تێکڕا دڵسۆزی و بەهەندگرتنی ئەو ئایندە چارەنوسسازە بوو کە ڕووبەڕووی دەبینەوە. لە کۆتایی مێزگردەکەدا کە نزیکەی سێ کاتژمێری خایاند، بەڕێز حەمەلاو کەریم ئامادەیی خۆی و ڕێکخراوەکەی نیشاندا بۆ هەموو هاوکاری و پشتگیرییەک لە گرێدانی سیمینار و ڕوونکردنەوە و گواستنەوەی دەنگدەران بەئوتومبێلی تایبەتی خۆیان، لەپێناو هەرچی جێگیرکردنی قەوارەی ڕاستەقینەی کورد لە عێراقدا.

ڕێکخراوی مالی کورد و ئەڵمان و مێزگردێک دەربارەی هەڵبژاردن



لە نهێنییەکانی ناو خودەوە بۆ شکانی سیستەم

زمکان عەزیز - بۆن

نهێنییەکان ئەو گەردوونە شاراوەیەن کە هەمیشە بەداویدا دەگەڕێین و زۆر جار لە مەرگیشدا نایدۆزینەوە، فەنتازییایەکە لە یەکە چرکەی هەموو خەیاڵامێزێکدا هەیە و مرۆڤی سۆپەرمانی لە خۆی دەگرێت، لە شتە راستەقینەکانی دنیای لەیەکچووە و راستترین و جوانترین وینەی کێشە ئاڵۆزەکانی ناو دەروونی خودە، تەنها خودیش دەستی ئەو هێزەیە و شکانەوەیەکە بەسەر وینە دوبارە هەمیشەییەکانی دنیای بوون، لە کاتێکدا ئەو سۆراخەی دێتە ناو جەستەوە هاوکێشە دەروونییەکان دەشێوێنێ و بۆ یەکخستنەوەی گەڕانێکی سەرگەردانی دەخاتە ئەودیو خودەوە، کەسی سۆپەرمان لەم سۆراخەدا لە شێوەی رەوشتی کەسایەتی ئەترازێ و بە فیگۆرێکی جیاواز دەکەوێتە روو، ئەمەش بۆ تاکی سادە دوور لە سیستەمە و یاساکانی سیستەم دەشێوێنێ و وێنەیەکی رووتە. کەچی هەرچی لە یاسا و هاوکێشەکانی بوون هەیە بۆ هەمان خود وێنەیەکی رەش و سپییە و شێوە زنجیرەیی دەماودەم دەکشێ، نهێنییەکان دنیا شاراوەکەی نێوان جەستە و خودە، شەڕێکە بە تەنها لە تاکدا و هەمیشە هەوڵی دابڕانییەتی لە کۆمەڵ و پەیوەستکردن و بردنەوەی بە دنیای دوور لە سیستەم. خودێکی هەمیشە سەرگەردانە بەدوای ئەوەی کە نییەتی و بژشاییەکە پڕییەتی لە نهێنییەکان ئەوەش بەرەو تێپەڕاندنێکی جیاوازتر وبارستەیەکی نوێتر تاک پەلکێش دەکات بە تێفڕاندن و بازدانێکی نامۆبوونەوە لە جیهانێکی تر خود خۆی دەبینێتەوە ئەوەش بەبێ خەیاڵی نهێنییەکان ناکرێ، هەر بۆیە تاک بۆ خۆی هەیکەلێکی بزوێنەرە لەبەردەم سیستەمە کۆمەڵایەتییەکەدا و کار بەخۆی دەکات و لەسەر ئاستی بەڕێوەچوونی خۆبەخۆیی و بەرامبەرەکەی دەوەستێتەوە،هەر لە سەرەتای بوونەوە قۆناغەکان هەروەک خۆیان هاتوون و هەردەم لە بەردەواميیەکی شێواوی هەمیشەییدایە بە لەتکردنی زەوی و، پەرتکردنی جیهان بۆ کۆمەڵێ سنووری لێکپچڕاوی لێکنەچوو، ئەمەش جۆری کلتوور و دەستووری کۆمەڵی رێکخست تا پێکهاتنی یەکەی خێزانی و ئیتر یەکەکانیش خۆیان دابەشبوونەوە بۆ بەڕێوەبردنی کاری دەستوور ئەوەتا لەدوای هەموو رووبەڕووبوونەوەیەک نهێنییەکان خۆیان تێدەهاوێن و شتەکان سنووردار دەکەن و تایبەتمەندێتییان پێدەبەخشێن، هەموو جوولەیەک لە بارستەی عەقڵەوە نهێنییەکی خۆی هەیە و چەند خۆی پیشان ئەدات هەر ئەوەندەش لەخۆی ئەترازێ و وەک تاکێک لە گۆڕین و خۆئامادەکردنی لەبەردەم خوێندنەوە و خۆبینینەوەیەکی خۆیدا ئیتر نهێنییەکان بەربەستەکانی بۆ دەشکێنن، واتە هەموو ترازانێک خود دوانە لەگەڵ هەیکەلی نهێنیدا ئەو خۆد دووانەش جەستە و دەرەوە رێکدەخات، دەرەوە دەروازەیەک بۆ تێڕژانی نهێنییەکان بە گشتی و خۆبەستنەوەیەکی ناوەکی بەتایبەتی بە چەمکی نهێنییەکەوە ئەو شەڕە دەروونییەش پێکدێنێ کە هەردەم تاک پێی ناسڕێ دەبێ. زۆر لە نهێنییەکان دەمانبەن و وێنە شکاوەکانمان بۆ زیندوو دەکەنەوە ئەم راستکردنەوە لەتبووەش سەرلەبەردەرکردنی هێندەی تر لەناو سۆراخی خوددا تاک ون دەکات ئەمەش بەرەو جۆرێک لە خۆدۆزینەوەمان دەبات تا بەو دوا خۆگەڕانەدا لە نهێنییەکان بگەین، نەێنییەکان زۆرن و چۆن پەیبەردنیشیان لەسەر...

بوون کە دەبێ ئەگەر ببێ ئەوە لە سەرەتایەکی دیاریکراودا خۆی دەستپێدەکات و هەروەک پێشتر سیستەمی کۆمەڵ پێکدێ و ئەویش زنجیرەیەکی تر ئەدا بەدەم سیستیمێکی تروە، ئەم تەوژمە بەردەواميیەکی خۆی هەیە و ئاسایی دەروات، خۆ ئەگەر لەهەر لایەکی ئەم دنیایە بارستەیە خۆی لەم سەفەرە دوور و درێژە خستبێ و بە لایەکی تردا هەڵگەڕابێ ئەوە بووەتە سەرگومانی سەردەمەکە و بەجیابوونەوەیەکی کۆشندە هێمای بۆ کێشراوە. بەرەو نهێنیبوون سرینەوەیەکی تەواوی جەستەی گەرەکە تا لە شێوە ئاساییەکەی دەردەچێ و دەستپێدەکاتەوە بۆ پڕبوونەوەیەکی نوێ وەک ئەوەی لە خود خۆیەوە بێت و دوور لە ترس و گومان ئەمەش لە کاتێکدا خود ئامادەی گۆڕانەکەیە و جەستەش پڕ دەبێتەوە بە وەرگرتنە وێنە خەیاڵییەکانی خود، هەموو شتەکان زۆر بە شاراوەیی لەگەڵ خودی تاکدا گەردوونێک لەو نهێنییە پێکدێنن کە دنیای دەرەوەی گەردوونی بوونە، نهێنییەکان کۆشکێکی گەورە و بەرزی داخراون خودیش دەبێتە پاشا و سوپا و خەڵک و وێنەکانی تر کە جەنگی کێشەکان بەرپا دەبێت خودی تاک دەبێتە بەرەیەک و جەستەش بەرەی دووەم کێشەکان زیاتر دەروونین و لە نێوان عەقڵی دەرەوە و ناوەوە پێکدا هەڵدەگڕێن بۆ راستکردنەوەی ئەو شێواوییەی لە بوونەوە بەردەوامە یان دەرچوونە لەو بەردەواميیە کە بوونێکە لە تاساندنی بوون خۆی وەک دەڵێین شەڕی نهێنی خود و جەستە، خود بۆخۆی دەکەوێتە نێوان لێکچوونی بۆ لاپەڕەی ٧

پانۆرامایەک لە تراژیدیای وڵاتەکەم



کەرکوک- یوسف - ماوەیەکی زۆرە هونەرمەندی شێوەکاری گەورە دارا محەمەد عەلی دەیویست ئەو خەمە گەورانەی لە دڵیایە و بە فڵچە دەریبڕیون و لەگەڵیاندا سالانێکە گەورە بووە، بۆ کەرکوک پێشەنگایەک بکاتەوە. بۆیە لە رۆژی ٢٠٠٥/١/١٠ رۆژانی دوایی و بە ئامادە بوونی ژمارەیەکی زۆر لە هونەردۆستان، وەزارەتی رۆشنبیری هەولێر بە هاوکاری سەندیکای هونەرمەندانی کەرکوک لە هۆڵی سەندیکادا پێشەنگایەکی بۆ کردەوە. دارا کە زیاتر لە ٦٠ تابلۆی خۆی تیا نمایش کرد، لە ئاخاوتنێکی کورتدا باسی لە خۆشەویستی خۆی بۆ کەرکوک و پانۆرامای ئەو تراژیدیایانە کرد کە کۆمەڵە بەرهەمێکی هونەری جۆراوجۆری تەکنیکین بە شێواز و بژچوون و روئیا و کەرەستە و قەوارە و میژووی هەمەرەنگ ئامێزەوە. بەڵام بەرهەمەکانی لە یەک خاڵی سەرەکیدا یەک دەگرنەوە و هاوژانی یەک مەسەلەی پیرۆزن، ئەویش مەسەلەی بوون و نەبوون، مان و نەمانی میللەتێکی ستەمدیدەی وەک میللەتەکەمان لەم چەرخەدایە... پانۆراما و تراژیدیای وڵاتەکەم دڵۆپێکی دەریای ئەم مەبەستە پیرۆزەیە و بووەتە هەوێنی هزر و بیری جەنجاڵی جیهانی پاکی هونەرەکەی. ئەم تراژیدیانەی هونەرمەند، رۆژانی ٢٠٥/١/٣ لە شاری مەزنترین تراژیدیا (هەڵەبجەی شەهیدە) نمایش کرا. ئەمەش دوانزەهەمین پێشەنگای تایبەتی هونەرمەند دارا محەمەد عەلی یە.

بۆ ڕێنمایی کار و باری باج و دارایی لە ئەمانیا

Dipl. Volksw. Hoschnav Sleman

Steuerberater Dipl. Ing. Hannes Elter

بەڕێوەبەری کاری ژمێریاری و دارایی

Von Guericke Alle 21 53125 Bonn
Tel. : 0228 / 29 83 07 Mobil : 0170 32 44 831
e-Mail : sleman@web.de

دیداری هەڵکەوت زاهیر لەگەڵ:

هونەرمەندی دەنگ خۆش ئالان عومەر



گەر بە وردی سەرنج لە گۆرانی و مۆسیقای کوردی بدەین، دەبینین چەند دەنگ خۆش و هونەرمەندی بەتوانای تێدا هەڵکەوتووە، یەکێک لەو خانمە دەنگ خۆشانەی شاری سلێمانی هونەرمەند " ئالان عومەر"ە کە دەتوانین بڵێین خاوەنی دەنگێکی پڕ لەسۆز و خۆشەویستی و ڕەسەنایەتییە. عەشقی کوردی، سۆزی دایک بۆ کۆرپەکەی، عیشقێکی نەفەس درێژ... خانمێکی عاشق بە خاکی کوردستان، بووکە رازاوەکەی شاری شێخ مەحمود، شاری هەڵەمەت و قوربانی خاتوو ئالان عومەر.

هەڵکەوت: چۆن ئالانی هونەرمەند بناسین؟

ئالان: لەدایک بووی شاری سلێمانیم لە ساڵی ١٩٧٥، دەرچووی پەیمانگەی پزیشکیم، ئەندامانی خێزانەکەم یەکەم هاندەرم بوون بۆ چوونە ناو جیهانی هونەر و جوانی و خۆشەویستییەوە.

هەڵکەوت: ئەمڕۆ چۆن دەڕوانیتە هونەری گۆرانی لە ناوکوردستان و لەتاراوگە؟

ئالان: بەشێوەیەکی گشتی هەوڵی باش دەبینم بەتایبەتی لەتاراوگە، چەند هونەرمەندێک هەن کاری زۆر باشیان کردووە. هەڵبەتە دەگەڕێتەوە بۆ ئەوەی کە هونەرمەندانی تاراوگە زۆر ئازادن و هەروەها لەگەڵ هونەرمەندانی وڵاتانی دیکەدا تێکەڵ دەبن و کاریگەری ئەوەش لە بەرهەمە هونەرییەکاندا دەردەکەوێت. لە کوردستانیش چەند هەوڵێک باش هەیە بە هیوام بەرەو پێشەوە بڕوات.

هەڵکەوت: ئالانی دەنگ خۆش حەز بە دەنگی کێ دەکات؟

ئالان: زیاد ئەسعەد، ئایاد، پەیمان عومەر، لە عەرەبەکانیش " ئەساڵە" و لە تورکیش "سیبیلکان".

هەڵکەوت: وەک بیستوومانە دەڵێن ئالان عومەر شێوەی لە " ئەساڵە" دەچێت، تۆ چی دەڵێیت؟

ئالان: " بە پێکەنینەوە" بەڕاستی پێم خۆشە من یەکێکم لەوانەی دەنگیم پێ خۆشە، ئەگەر لەویش بچم ئەوا خراپ نییە! بەڵام بروات هەبێت من خۆم ئەوە نازانم و تا ئیستا بە خۆمیان نە وتووە.

هەڵکەوت: بەرهەمەکانی پێشووت چی بوون؟

ئالان: لەساڵی ٢٠٠١ یەکەم **CD**م بڵاوکرایەوە و لەساڵی ٢٠٠٢ دووەم **CD**م بڵاوکرایەوە، دیارە سوپاسی هەموو بەشدارەکان دەکەم لە ئاواز دانەر و ژەنیارەکا ن، شاعیرەکان بەتایبەتی لەکۆمپانیای چوارچرا.

هەڵکەوت: کاک چەتۆ نەورۆز تا چ ئەندازەیەک ماندەر و هاوکاریت دەکات ؟

ئالان: بێگومان مامۆستا چەتۆ نەورۆز هونەرمەندێکی زۆر بەتوانایە و زۆر تایبەتمەندی لای من هەیە و لەسەرەتای دەست پێکردن و تۆمارکردنی **CD** و لە کۆنسێرتەکانم هاندەر و هاوکاری کردووم، سوپاسی دەکەم.

هەڵکەوت: کێن ئەو ئاواز دانەرانەی کاریان لەگەڵ کردووی و چ بەرهەمێکی دیکەت بەدەستەوەیە؟

ئالان: هونەرمەندان چەتۆ نەورۆز، سەید ئەحمەد، فەرهەنگ عەبدلغەفور، ئەحمەد چاوشین. هەروەها بەرهەمێکی نوێ لە ئاوازی مامۆستا" سەلاح رەئوف"م بەدەستەوەیە و تازەترین بەرهەم کە بەدەستمەوەیە **CD** کە بە هاوکاری کۆمپانیای چوارچرا.

هەڵکەوت: کەلووەکەی ئالان عومەر چییە؟

ئالان: دووپشکە!

هەڵکەوت: من وای دەبینم گۆرانی بێژان، ئاوازدانەران بەگشتی کاریان نەکردووە بۆ دەست نیشانکردنی ستایل بۆ گۆرانی کوردی؟

ئالان: ڕاستە من وای دەبینم. کە ئەمە کارێکی زۆر گرنگە پێویستە لەسەر هەموو هونەرمەندانی موزیک بەتایبەتی شارەزایانی زانستی موزیک کە بتوانن کار بکەن بۆ جیاکردنەوەی ستایلەکان وەک کلاسیک، فۆلکلۆر،پۆپ، ئەرەبیسک و تەرەب وراپ و ...هتد، هەوڵ بدەن جیایان بکەنەوە بۆ ئەوەی هەر هونەرمەندێک کارێک دەکات بزانێت ئەو کارە هونەرییە چ ستایلێکی لە خۆ گرتووە تا زانستانە وەک هونەرمەندانی جیهان هەر یەک لە ئێمە کارەکانی خۆی بزانێت و هونەرەکەی ئێمە پێشکەشی دەکەین خۆمان بیناسین.

هەڵکەوت: ئایا تا چ ڕادەیەک هونەرمەندی کورد ئازادە لە هەموو کارەکانیدا و چۆنییەتی بیرکردنەوەی بەتایبەتی ئالانی هونەرمەند چۆن دەبینێت؟

ئالان: من هەست دەکەم ئێمە کورد ئازاد نین لە بیر و ڕامان و دەست نیشانکردنی بیرۆکەی خۆمان، چونکە ئێمە لە کۆمەڵگەیکدا دەژین زۆر داخراوە دەبێت هەموو حیساب و کاردانەوەیەک لە بەرچاو بگرین تا دەگاتە جل و بەرگ، ئەمە لەخۆیدا ڕێگە گرتنە لە بیری هونەرمەند. بەڵام گەشبینم بەوەی چەندین هونەرمەند هەن کاردەکەن بۆ ئەم نەخۆشیانە هیوادارم ئێمەی هونەرمەندی کەرد بتوانین بە ئازادی وەک هونەرمەندانی جیهان بەرهەمە هونەرییەکانمان بڵاو بکەینەوە.

هەڵکەوت: چی بکرێت تا هونەری کورد بگاتە ئاستی هونەری جیهان؟

ئالان: زۆربوونی کۆمپانیا هونەرییەکان و نەهێشتنی گیر و گرفت لەبەردەم هونەرمەندان، ڕێگەدان دان بە هونەرمەندانی کورد وەک هونەرمەندانی جیهان بە چ زمانێکی دیکە گۆرانی بڵێ بۆ ناساندنی کولتوری کوردی بە جیهان، هەروەها زیادکردنی باری زانستی هونەری و ناردنە دەرەوەی هونەرمەندی مۆسیقی بۆ خوێندن. تێکەڵکردنی ئێمەی کورد بە هونەرمەندانی جیهان، هاوکاریکردن لەگەڵ یەکتری، هەموو ئەمانە هەنگاوی سەرەتایین بۆ پێشخستنی هونەری کوردی.

هەڵکەوت: دوا وتەتان بۆ پەیامی کورد چییە؟

ئالان: بەهیوام سەرکەوتووبێت پەیامی کورد و بگاتە هەموو جیهان و سوپاسی ماندووبوونتان دەکەم بۆ بەسەر کردنەوەمان

ناسیۆنالیزم و "مەم و زین"ی خانی



عەزیز وەلیانی ـ مەهاباد

پرۆسەی بەجیهانی بوون و هەروەها پەرەگرتنی ڕەوتی نۆخوازی لە گشت بوارەکانی سیاسی، ئابووری، فەرهەنگی و ئەدەبی و.. ..دا تیشک و ڕووناکییان بەخشیوە بە مانا و نێوەرۆکی دەق و بەرهەمە ئەدەبییەکان یانی لە بار و دۆخێکی وەهادا، وردبوونەوە و پێداهاتنەوەی سەرلەنوێ وەک پێویستێکی ئەمڕۆیی خۆدەنوێنێ. لایەنێکی گرینگی ئەم پێویستییە، لێکۆڵینەوە و هەڵسەنگاندنی بابەتە فۆلکلۆرییەکانی کوردین بە پێوانەی زانیارییەکانی سەردەم. ڕوون و ئاشکرایە ئەم شیوازە بە مانای پشت لە ئێستا و داهاتوو یان پاشگەزبوونەوە بەڕەو ڕابردوو نیە و هیچ دەبەردانیم ئالای دوێنێ لەسەر نووچکەی ئەمڕۆ شەکاوە ڕاگرم. بەڵکوو نرخاندنی بایەخی هونەری، ئەدەبی و سیاسی کەلەپووری نەتەوایەتییە بە مەبەستی دارشتنەوەی سووچێک لە پێناسەی فەرهەنگی ـ نەتەوەیی گەنج و لاوەکان و لە ئەنجاما، بووژانەوەی ژیلەمۆی ئەم میراتە تا ڕادەی مەشخەڵێکی پڕ هەڵەمووتی گەیشتن بە تڕوپکی بەختەوەری نیشتمان. ئێستاش لەم دەلاقەوە دەڕوانینە "مەم و زین"ی خانی نەمر بە گشتی و پێشەکییە پڕ مەبەستەکەی بەتایبەتی.(ع.و.)

ناسیۆنالیزم یان نەتەوەخوازی وەک دیاردەیەکی گرینگی سیاسی بەتایبەت لە سەدەی بیستەما دەورێکی بەرچاوی هەبوو لە هەڵگیرسانی بزووتنەوەی ڕزگاریخوازی گەلانی جیهان بەڕەو سەربەخۆیی و دیاری کردنی مافی چارەنووس.

ئەم ڕەوتە سیاسییە وەک دیاردەیەکی سەرچاوەگرتوو لە ویست و پێداگری گەلان بۆ ناسین و بەرزکردنەوەی پێناسەی نەتەوەیی بە گوێرەی ئەزموونی پڕ هەوراز و نشێوی گەلان بۆ ڕزگاری و وەدەستهێنانی دەسەلاتداریێتی سیاسی، تایبەتە بە نەتەوەکان نەک دەوڵەتان. بەپێی مێژووی سەدەی نۆزدە و بیستەمی ڕۆژهەلات، چینی بۆرژوا بە کەڵک وەرگرتن لە ڕێبازی نەتەوەخوازی لە ڕێی خەباتی فرەلایەنی هەموو گەلان و هەل و مەرجی جیهانی، سەرکردایەتی بزووتنەوە دەگرێتە دەست و لە پاش داکوتانی گوڵمیخی دەسەلاتداریێتی سیاسی، بە پێچەوانەی بەڵێن و دروشمەکانی سەردەمی خەبات لە پێناو پتەوکردنی دەسەلات و بەرژەوەندی چینایەتی و سیاسی، سەرکوت کردنی هاوسەنگەرانی پێشوو دەگرێتە پێش، کە گەلی کورد لە بەرچاوترین قوربانییەکانی ئەم فەرتەنە و پیلانانەن. پەیماننامەی لۆزان و ... بەڵگەی حاشاهەڵنەگری ئەم مەبەستەن. شک لەوەدا نیە کە لە ڕوانگەی مێژوویی یەوە، ناسیۆنالیزم بەرهەمی سەردەمی دەسمایەداری یان ساقامگیربوونی دەسەلاتی بۆرژوازی نوێیە لە وڵاتانی ئوروپایی دا. کەوابوو بە پێ ودانی ئەم بۆچوونە، هەر چەشنە بزووتنەوەی ڕزگاریخوازانەی بەر لە سەردەمی ناوبراو نایەتە بیری نەتەوەخوازی. ئێستاس بە سەرنج دان بە مەبەستی باسکراو، بزانین خانی نەمر (١٦٥٠ ـ ١٧٠٦ ز) لە دەیەی حەقدەدا چ دەفەرمێ؟

کورتە ئاماژەیەک بە ژیانی شاعیر:

هەر لە سەرەتای سەدەی پازدەوە تا ئێستا بە شایەدی مێژوو، تایبەتمەندی ناوبراو، هیچ کات بە شێوەیەکی گشتی نەهاتۆتە ڕیزی ئامانجەکانی بزووتنەوەی کوردی. بەم پێیە " هەر گەلێک کە ڕووحی دەسەلاتخوازی بەسەر گەلانی ترا هەبێ، زۆر بەساکاری دەکەوێتە ژێر دەسەلاتی ئیستبداد و پەلکێش بوونیان بەڕەو پاوانخوازی و ڕەگەزپەرستی"«٢». لە سەردەمی ژیانی شاعیر، میرنشینە کوردەکان بلاو و



یەکنەگرتوو و دژ بە یەک و بێبەش لە بەختەوەری و هێمنایەتی بوون و هەرچەند جاری دەکەوتنە بەر پەلاماری بێ بەزانە و بڕستبڕی دەوڵەتە زلهێزەکانی ڕووس، ئێران و عوسمانی و داسەپاندنی ئابووری شەڕ بەسەر خەڵکی لەش بەزامی کورد. خانی نەمر بەم دەردەوە دەنالێنێ و نەبوونی سەرۆک و دەوڵەت بە سەرەکیترین هۆی قەرقەشی و پاشکەوتوویی کوردان دەزانێ. ئەم حەز و خۆزیا و ئاواتە بۆتە هۆی سەرەکی لە دارشتنی دیباچەی مەم و زین دا:

" بەدبەختی سەری لە ئێمە داوە
تۆزکاڵێ کەمایەسی نەماوە
تۆ بڵێی کە هەڵێ چ زوو چ دێرێک
بۆ ئێمە لە عاسمان ستێرێک
بەختی مە لەخەو هەڵستێ جارێک
جارێک بکەوێتە کاروبارێک
لێن هەڵبکەوێت جیهان پەنایەک
پەیدابێ بۆ مە پادشایەک
ئەم بەختە ڕەشەی لەسەر مە ڕاکا
کوردیش لە جیهان برەو پەیاکا
بۆمەش کە بیایە سەربڵندێک
زۆرزان و بەبیر و مەرد و ڕەندێک
نەخشی لە دڵاوی مەش درابوو
بێ نرخ و چرووک و باو نەمابوو"«٣»

هەروەها وەدیهاتنی ئەم ئاواتە بە هۆکارێکی بنەڕەتی دەزانێ لە پێناو بەختەوەری نیشتمان و لەژێر چەپۆکە بوونی دراوسێکان.

" بۆمەش کە هەبایە پادشایێ
خوا تانجێکی پێ ببەخشایێ
ئێمەی لە کەساسی دەردەهێنا
بێستانی هیوای وەبەر دەهێنا
ترکان نەدەبوون بەسەر مەدا زاڵ
بۆ کوند نەدەبوینە لانە و ماڵ"«٤»

ئەگەر بە پێوانەی زانیارییەکانی بەردەم تێی فکرین و لێی وردبینەوە، سەلماندنی ئەم ڕاستییە مسۆگەر دەبێ کە دەربڕین و ڕاگەیاندنی گەلاڵەی ناوبراو (ئاواتی دەوڵەتێکی نەتەوەیی) لە سەردەمی دەرەبەگیدا بیرێکی نۆخوازییە لە بواری سیاسی و فەرهەنگی دا. لەم بابەتەوە لێکۆڵەری وردبینی هۆڵەندی ڤان مارتین بڕۆنسێن هەرچەند خانی بە ناسیۆنالیست نازانێ بەڵام سوورە لەسەر ئەم ڕوایە کە دیباچەکەی "مەم و زین"ی خانی، شێوازێکی ناسیۆنالیستی مۆدێرنی هەیە و تەنانەت لە وتارێک لە ژێر سەردێڕی "مەم و زینی ئەحمەدی خانی و دەوری لە دەرکەوتنی وشیاری نەتەوایەتی کوردی دا" دەڵێ : " وەک ئەوەی بڵێی ئەو قسانە لەلایەن ناسیۆنالیستەکان بەرایی سەدەی بیستەمەوە کراون تا ئەوەی کە قسەی سێ سەدە لەمەوپێش بن"«٥». بایەخی ئەم گەلاڵەیە بە ڕوون کردنەوەی پێگەی چینایەتی و کۆمەلایەتی شاعیر باشتر دەردەکەوێ. جەخت کردن لەسەر ئەم بابەتە، بۆ لێدوان و تۆێژینەوەی بەرهەمەکانی سەدەی کلاسیک یان دواتر بە تایبەت هەڵوێستێکی وا بە دەگمەن ڕەهەندێکە بۆ گەیشتن بە مەبەست. خانی خۆی لە بنەماڵەی خانیانی بایەزید بووە و لەگەڵ پیاوماقوولانی بارەگا، دانیشتن و ڕاوێژی هەبووە. بە وتەیەکی تر خانی قسەکەر و نوێنەری ئەدەبی و فەرهەنگی نیزامی ناوبراوە لە سەدەی حەقدەدا. هەر لە ڕووی پێوەندێکانی کۆمەلایەتی خۆی، بە پێچەوانەی دەقی بەیتی مەم و زین، هەندێ لە کەسایەتییەکان بە شێوەیەکی تر دەنوێنێ، بۆ وێنە ناوێک لە نۆکەری بەئەمەگ و تۆڵەستێنی مەم یانی بەنگینە نیە. هەروەها بەکری مەرگەوەڕ وەک کەسایەتێکی چەپەڵ و دڵڕەش، لە دەقی بەیتەکە لە ڕێزەی ئاغا و مەزنە پیاوانی نێو بارەگا بووە، کەچی خانی درکاندنی ئەم ڕاستییەی پێ شوورەیی بووە و داییەڕاندۆتە ڕێزەی " دەرکەوان"ێک.

میر لای هەبوو یەک بە دەرکەوانی
ناوبانگی هەبوو بە دووزمانی
لە پیاوەتیا چرووک و ڕووەڕەش
دڵپیس و لە شەرم و شووڕە بێ بەش
بەدفەڕ بوو"، بەگەڕ بوو، دەم گەوەڕ بوو
ئەم بیژووە بەکری مەرگەوەڕ بوو"«٦»

یانی چەپەڵی و شۆفاری هەر لە چینی بەرەوژێری کۆمەڵ دەوەشێتەوە! بەڵی خانی نەمر بەم پێگە کۆمەلایەتییەوە و لە چوارچێوەی نیزامی دەرەبەگی سەدەی حەقدەدا ئاواتێکی بەرز و ژیرانە دەخوازێ کە لە ڕوانگەی تیۆڕرییەکانی نەتەوەخوازی دەکەوێتە بەر پرسیار و لێدوان. گوتمان ناسیۆنالیزم

بڕ لاپەڕەی ٧

دراماتووسانی جیهان

مەهدی مجید جاف



١٢- پێر کۆرنی
Pierre Corneille

شاعیر و دراماتووسی بەناوبانگی فەرەنسی پێر کۆرنی لە سالی ١٦٠٦ لە شاری ڕوئن لە فەرەنسا لەدایک بووە. پێر کۆرنی خوێندنی سەرەتایی و ناوەندی لە ڕوئن تەواو دەکات و پاشانیس بەخواستی دایک و باوکی و دوور لە خواستی خۆی لە زانکۆ و لە بەشی (حقوقدا) دەست بە خوێندن دەکات، پێر کۆرنی هەر لە تەمەنی هەژدە ساڵییەوە ئارەزووی لە شیعر نووسین هەبووە و ئاواتی ئەوە بووە ببێتە شاعیر. لە ماوەی (١٦١٥ ـ ١٦٢٢) کۆمەڵە شیعرێکی بە زمانی لاتینی بڵاوکردەوە و دوو خەڵاتیشی پێ بەخشرا. یەکەمین بەرهەمی درامای پێر کۆرنی کۆمیدیای (مەلیت) دەبێت کە لە ساڵی ١٦٢٩ نووسیویەتی و لە هەمان ساڵدا لەسەر شانۆی شاری پاریس پێشکەش بە بینەران کرا و سەرکەوتنێکی مەزنی بەدەست هێنا. زۆر لە مێژوونووسانی شانۆ باوەڕیان وایە کە کۆمیدیای (مەلیت) کۆمیدی نووسیی لە فەرەنسادا بە قۆناغێکی نوێ و سەرکەوتوو گەیاندووە. لە ساڵی ١٦٣١ بەرهەمی دووەمی تراژیدیایەک بوو بە ناوی (کلی تاندر) و پاشان وەک درامای نووسێکی بە توانا ناوبانگی دەرکرد. دوبەدوای ئەمانە چەند شانۆنامەیەکی تری نووسی وەک:

- شانۆنامەی بێوەژن ، ساڵی ١٦٣٣.
- شانۆنامەی کۆشکی گالیڕی، ساڵی ١٦٣٢.
- شانۆنامەی گۆڕەپانی پاشا، ساڵی ١٦٣٦.
- شانۆنامەی خزمەتکار، ساڵی ١٦٣٣.

لە ساڵی ١٦٣٢ و لە ژێر کاریگەریی ئەدەبی یۆنانیدا شانۆنامەی "میدیا"ی نووسیوە. بەناوبانگترین بەرهەمی درامیی پێر کۆرنی شانۆنامەی"سید" کە لە ساڵانی ١٦٣٦ ـ ١٦٣٧ دا نووسیویەتی. درامای سید ناو و ناوبانگی پێر کۆرنی و درامای فەرەنسی بە دنیا ناساند.

لە ساڵی ١٦٤٠ دا پێر کۆرنی، ماری دولامپریخواست و پاشانیش بوونە خاوەنی شەش زارۆکان. لە دواییدا یەکێ لەو منداڵانە لە شیرێکدا کوژرا. لە نێوان ساڵانی ١٦٤٠ ـ ١٦٤٤دا چەند شانۆنامەیەکی بەپێز و بەهێزی نووسی وەک :

- شانۆنامەی " هۆراس ".
- شانۆنامەی " سینا ".
- شانۆنامەی " پۆلیۆکیت".
- شانۆنامەی " مردنی پۆمپئی ".

لە ساڵی ١٦٤٧دا پێر کۆرنی بوو بە ئەندامی فەرهەنگستانی فەرەنسی و هەر لە هەمان ساڵدا بە گەورەترین دراماتووسی فەرەنسی لەقەڵەم درا.

پاش ئەو گۆڕانە مەزن و پڕ سوودە، پێر کۆرنی چەند درامایەکی تری وەک: شانۆنامەی "هیراکیۆس"، شانۆنامەی " دۆن سانجۆ لە ئەراگۆن " و شانۆنامەی " ئەندرۆمیدا "ی نووسی.

لە ساڵی ١٦٥١ شانۆنامەی " پێتریس پادشای لمبادی " نووسی کە هیچ سەرکەوتنێکی بە دەست نەهێنا و جێگای ناڕەزایی خەڵکی بوو. ئەمە بووە هۆی ئەوەی کە پێر کۆرنی بۆ ماوەیەک گۆشەگیر و لە نووسین دووربێت. پاش پێنج ساڵان شانۆنامەی " ئۆدیپۆس"ی نووسی کە لە بەرهەمێکی نووسەری مەزنی یۆنانی سۆفۆکلیسەوە وەریگرتبوو.

دوا بەدوای ئەمەش چەند شانۆنامەیەکی تری نووسی، وەک :

- شانۆنامەی " سیرتۆیۆس ".
- شانۆنامەی " ئەگسیلاوس ".
- شانۆنامەی " ئەتیلا ".
- شانۆ نامەی " تیتۆس و برنیس ".
- شانۆنامەی " سەرنیۆس ".

پێر کۆرنی بۆ باسی شانۆنامەکانی سوودێکی زۆری لە ڕووداوە مێژوویەکان وەرگرتووە.

پێرکۆرنیی مەزن لە ساڵی ١٦٨٤دا و لە تەمەنی ٧٨ ساڵیدا کاروانی مەزنی شانۆی بەجێهێشت و ماڵئاوایی لە ژیان کرد و مرد.

سواره محەمەد ئەمین... ئەندامی پەرلەمانی کوردستان:





. ئەو شۆڕشە خوێناوییانەی کە کورد زیاتر لە نیو ملیۆن شەهیدی تیا بەختکردووە ...بۆ سەربەخۆیی کوردستان بووە.

. ئەمڕۆ ئەو شەهیدە قارەمانانەم دێتەوە یاد کە خۆیان بۆ ئەم ڕۆژە پیرۆزە بەخت کرد.

. هیوای هەموو پەرلەمانتارێکە، جگە لە ئاڵای کوردستان هیچ ئاڵایەکی دیکە لە کوردستاندا نەبێت.

بەڕێز سواره محەمەد ئەمین پێشمەرگە و کادرێکی شۆڕشگێڕ و ماندووناسی پارتی دیموکراتی کوردستانە و ساڵی ١٩٤٤ لە گوندی " زییە"ی ناوچەی شارباژێڕ لە بنەماڵەیەکی نیشتمان پەروەر هاتۆتە دنیاوە. لە ژیانی دوورو درێژی پێشمەرگایەتی و حیزبیدا چەندین ئەرک و لێپرسراوێتی گرینگی ڕاپەڕاندووە و ئێستا ئەندامی پەرلەمانی کوردستانە و، کاندیدی لیستی ئەنجوومەنی نیشتمانی کوردستان (لیستی هاوپەیمانی کوردستان)ە.

پەیامی کورد: بەبەراورد لەگەڵ قۆناغە جیاجیاکانی شۆڕشی ڕزگاریخوازی گەلی کورد.. ئەمڕۆ کوردستان چۆن دەبینن؟

کاک سواره: ئامانجی هەموو شۆڕشێک کە لە ئەنجامی غەدر و زوڵمەوە سەرهەڵدەدات، گۆڕانکاری ژیانی کۆمەڵگایە بەرەو باشتر. میللەتی کورد بۆ بەرەنگاربوونەوەی ئەو هێزە ترسناکەی کە ئەو هەموو زوڵمەی دەرهەق کردووە؛ ناچاربوو پەنابەرێتە بەر شۆڕشی چەکدارانە، شۆڕشی مەزنی ئەیلول بە یەکێک لەو شۆڕشە پیرۆزانە دەژمێردرێ کە توانی لە کاتی خۆیدا دەستکەوتی گەورە بەدەست بهێنێ، قۆناغەکانی دوای شۆڕشی ئەلوولیش بەهەمان شێوە گەلێک سەروەری لە ژیانی سیاسی گەلەکەماندا تۆمار کرد، تا ڕاپەڕینی گەلەکەمان و ئەزموونی پەرلەمانی و دیموکراسی ئەمڕۆ، بەڵام قۆناغی ئەمڕۆ بەبەراورد لەگەڵ هەموو قۆناغەکانی دیکەی گەلەکەمان، بە قۆناغی زۆر پیرۆز و پرشنگدار دەژمێردرێ، کە بۆخۆم ئەو خەونە مەزنەیە کە ساڵەهای ساڵ بە ئاواتیەوە بووم. ئەمڕۆ لە هەموو کاتێک زیاتر ئەو شەهیدە سەرکردانەم دێنەوە یاد کە خۆیان بۆ ئەم ڕۆژە پیرۆزە بەخت کرد.. مەخابن هێندە زۆرن ناتوانم ناوی هەموویان بێنم.

پەیامی کورد: پێکهاتەی سەرەکی پەرلەمانی کوردستان هەردوو لیستی زەرد و سەوزن، ئایا ئێوە نەیوونەتە پاشکۆی بۆ ئەو دوو لیستە؟

کاک سواره: پەرلەمانی کوردستان یەکێکە لەو دامەزراوە دیموکراسیانەی کە کورد شانازی پێوە دەکات، بۆیە هەمیشە پیرۆزی پەرلەمان پارێزراوە. هەموو بڕیارێکیش بە ڕاشکاوی و ئازادانە گفتوگۆی لەسەر دەکرێ و ئنجا بەپێی دەنگەکان بڕیاری لەسەر دەدرێت، بەبێ هیچ دەستتێوەردانێک.

پەیامی کورد: واتە سەربەخۆیی خۆی هەیە؟

کاک سواره: سەربەخۆیی تەواو، زۆر جار بۆ وەرگرتنی بڕیارێک سێ ڕۆژ گفتوگۆ کراوە تا بڕیاری لەسەر وەرگیراوە.

پەیامی کورد: قەت بووە بڕیارێک ڕەت بکەنەوە کە لە سەرکردایەتی سیاسی ئەو دوو حیزبەوە هاتبێت؟

کاک سواره: بەڵێ زۆر بڕیار هەبوو کە بۆ جاری دووەمیش دوای دەسکاریکردنی هەر پەسند نەکراوە.

پەیامی کورد: وەک پەرلەمانتارێک چەند گەشبینن بەرامبەر هەڵبژاردنەکانی عێراق؟

کاک سواره: ئایندەی عێراق و دروستکردنەوەی دەوڵەتی عێراق، من وەک خۆم ئەو گرنگیەی نییە لام، چونکە ئەو شۆڕشە خوێناوییانەی ئێمە کە زیاتر لە نیو ملیۆن شەهیدمان تیاداوە، بۆ سەربەخۆیی میللەتەکەمان بووە، بۆیە ڕەنگە بە بۆچوونی تایبەتی خۆم بڕوام بە دروستبوونەوەی ئەو عێراقە نەبێت کە خەڵکی دیکەی عێراق و عەرەب دەیخوازێ.

پەیامی کورد: پەرلەمانی کوردستان نەیتوانی لەسەر زۆر کێشەی گشتگیر بڕیاری سەرتاسەری بدات، لەوانە ئاڵای کوردستان و عێراق. بڕیار نییە یان هەیە و کاری پێناکرێت؟

کاک سواره: پەرلەمانی کوردستان بڕیاری هەیە لەسەر هەڵگرتنی ئاڵای کوردستان و لە تەلاری پەرلەمانیش ئەو ئاڵایە دەشەکێتەوە لەگەڵ هەموو دژایەتییەکی دەرەکیش بۆ ئەو بڕیارە، بەڵام هەر جێبەجێ کرا.

پەیامی کورد: ئەی ئاڵای عیراق؟

کاک سواره: ئێمە بڕیارماندا‌وە کە لە هەرێمی کوردستاندا ئاڵای کوردستان هەڵبکرێت، ئەوەش ئاڵای میللەتی کورده و هەر ئاڵایەکی تر زیادەیە.

پەیامی کورد: ئاڵای عیراق تایبەتمەندێتی ڕژێمی بەعسی هەڵگرتووە، هیچ بڕیارێکی تایبەت بە داگرتنی لە هەرێمی کوردستاندا هەیە؟

کاک سواره: نەخێر، ئەوەش دەگەڕێتەوە بۆ هەڵ و مەرجی سیاسی کوردستان.. هیواخوازم ئەو بڕیارەش لە ئایندەیەکی نزیکدا دەربچێت و ئەوەش هیوای هەموو پەرلەمانتارێکە کە جگە لە ئاڵای کوردستان هیچ ئاڵایەکی دیکە لە کوردستاندا نەبێت.

پەیامی کورد: بوونی ئەو پەرلەمانتارانەی کە سەربە لیستی زەرد و سەوز نین، ڕۆڵیان لە دروستکردنی بڕیاردا هەیە؟ یان تەنها بوونێکی شکلییە و بۆ بە دیموکرات نیشاندانی پەرلەمانە و بەس؟

کاک سواره: نەخێر هەرگیز وانییە، ئێمە لەناو پەرلەماندا وەک تاکێکی سەربەخۆ گفتوگۆ دەکەین و بڕیار دەدەین، لە چوارچێوەی یاسای پەرلەماندا ئازادییەکی تەواو هەیە بۆ هەر هەڵوێست و بیر و بۆچوونێک.

پەیامی کورد: بڕیارێک هەیە بۆ قەرەبووکردنەوەی زیانلێکەوتووان یان پێشمەرگەو کادێرە دێرینەکان کە ئەرک و زەحمەتی زۆریان کێشاوە و لە زۆر ڕووەوە زەرەرمەند بوون؟

کاک سواره: لە ڕاستیدا میللەتی کورد هەمووی کەم یان زۆر زەحمەتی کێشاوە و زیانی بەرکەوتووە، بۆ ئەم مەبەستەش کاک مەسعود دەستپێشخەرییەکی زۆر پیرۆزی کرد و دەزگایەکی بەناوی " دەزگای ئەیلول " دروستکرد، ئەم دەزگایە ئەگەر نەیتوانیبێت قەرەبووی هەموو پێداویستی و زیانەکان بکاتەوە، لە ڕووی وەفادارییەوە ڕێزلێنانێک بوو بۆ ئەو پێشمەرگە تێکۆشەرانە، هیوادارم هەموو چین و توێژێکی خەڵکی کوردستان بەگشتی بە ژیانێکی ئاسوودە و ئایندەیەکی پڕ لە ئازادی و شانازی قەرەبووبکرێتەوە، کە ئەوە ئاواتی گەورەی پەرلەمانی کوردستانە.

پەیامی کورد: پەیوەندی نێوان پەرلەمانی کوردستان و ئەنجوومەنی نیشتمانی عیراق چۆن بوو؟

کاک سواره: تا ئێستا هیچ پەیوەندییەکی یاساییمان نەبووە.

پەیامی کورد: ئەی لە ئایندەدا؟

کاک سواره : بەنیازین ئەو پەیوەندییە دروستبکەین، بەڵام هێشتا شێوازی چۆنیەتی ئەو پەیوەندییە دیاری نەکراوە.

پەیامی کورد: مەرجەکانی کاندیدکردن بۆ پەرلەمان چین؟

کاک سواره: کەسایەتی و توانای ئەو کەسە و متمانەی ئەو پارت و ڕێکخراوەی کاندیدی دەکات بۆ نوێنەرایەتی خۆی لە پەرلەماندا.

پەیامی کورد: وەک حەزی خۆت، لیستی هاوبەشت پێ باشتر بوو یان ململانێی هەڵبژاردن؟

کاک سواره : ململانێ نەبێت پێشکەوتن نابێت، بەڵام بەرژەوەندی گەلەکەمان لە هەموو بەرژەوەندییەکی شەخسی و حیزبی گەورەترە.

پەیامی کورد: کەواتە بەرژەوەندی ترسە لە قبوڵنەکردنی ئەنجامەکانی هەڵبژاردن؟

کاک سواره: نەخێر تەنها بەرژەوەندی بالای ئەم قۆناغەی گەلەکەمانە کە ڕووبەڕووی هەڵبژاردنێکی گەورەترین وەستاوە کە عێراقە.

پەیامی کورد: باسی پەرلەمان و کوردستانمان کرد، پێمانخۆشە بیرەوەرییەکی تایبەتی ژیانی پێشمەرگایەتیمان بۆ بگێڕیتەوە..

کاک سواره: بیرەوەرییەکان زۆر زۆرن، حەز ئەکەم باسی پێشمەرگەیەکی قارەمان بکەم، کە پاش بریندارببوون و لەدەستدانی چاوێکی لە شەڕێکی ئازایانەی ناوچەی حاجی هۆمەران، لە نەخۆشخانە هاتبووە دەر و بە برینداری گەڕابۆوە بەرەی شەڕەکە، کە گەیشتە بارەگای هێز زۆربەی بەرپرسەکانی هێزەکان و بەتالیۆنەکان لەوێ بوون، شەهید فەتاح ئاغا ئەو کاتە ئامر هێز بوو، لە سەروو خۆیەوە دایناو پێی وت: "تالیم" تۆ لە هەموومان زیاتر خزمەتت بە میللەتەکەی خۆت کردووە، تۆ ئازیزترین ئەندامی لەشی خۆت پێشکەش بە میللەت کردووە کە " چاو"ە ئێمە کەسمان پێشکەشمان نەکردووە.

پەیامی کورد: شەهید فەتاح ئاغا وەک سەرکردە و شۆڕشگێڕێکی گەورەی گەلەکەمان لێدوانی زۆر و تایبەتی دەوێ... بەڵام وەک برا و وەک سەرکردەیەک کە لە نزیکەوە خەباتی پێشمەرگایەتیتان کردووە، لەم دەرفەتەدا چۆن یادی دەکەنەوە؟

کاک سواره: کاک فەتاح خاوەنی فکرێکی زۆر گەورە بوو... هەستێکی زۆر بەرزی کوردانەی هەبوو، یەکێک بوو لەو پیاوانەی ساڵی 1956 لە سەر تەرمی شێخ مەحمود شەڕە دەمانچەی کردووە، جوانترین قسەی کە هەتا ڕۆژی شەهیدبوونی هەمیشە بە قەناعەتەوە دووپاتی دەکردەوە.. ئەوە بوو دەیگوت: " ئەو کاتە خۆم بە پێشمەرگە دەزانم کە شەهید دەبم".

پەیامی کورد: دوا وتەی بەڕێزتان بۆ پەیامی کورد چییە؟

کاک سواره: ئەرکەکەتان زۆر پیرۆزە... لە دڵەوە هیوای بەردەوامی و سەرکەوتنتان بۆ دەخوازم.

بۆچی ڕژێمی ئیسلامیی ئێران داکۆکی لە عەرەبایەتی عێراق دەکات؟!

سەڵاح شوان

کۆماری ئیسلامی ئێران میراتگری ڕژێمی شاهەنشایی ئێرانە و لە پێناو ئەو ئاواتە پانئێرانیستییانەدا هاتە کایەوە کە ڕژێمی شاهەنشایی پێی وەدی نەهێنرا و بە ناچاری و بە کارتێکردنی بەرەو مۆدەرنیزمی چوون، پشتی تێکرد. چونکە دەستەڵاتە نوێیەکانی ئێران تا ئێستا گورگە خەو بەو ئاواتەوە دەبینن کە ڕۆژێ لە ڕۆژان ئیمپراتۆریەتی ساسانی زیندوو بکەنەوە ببنەوە بە ئاغای ناوچەی خاوەرمیانەی دواکەوتوو.

لە پێناو ئەم ستراتیجیەشدا هەموو تاکتیکێ لەلایان ڕەوایە، کە تاکتیکی پێشڕەوبوونی مۆدەرنیزمی دەستی کرد بە پاشەکشێ، سیاسەتمەدارانی ئێران زوو لە ڕەوتی بەرەو دواوەچوونی ناچەکە تێگەیشتن و پێش ئەوەی خاوەنی سەرکیی ڕێبازی ئیسلامی کە عەرەبە عەقڵی پێدا بشکێ کە ناوچەی خاوەرمیانەی ئیسلامی بەرەو کوێ دەچێ، سیاسەتمەدارەکانی ئێران قۆزتیانەوە بە هاسانیش توانییان ئەو هەلە مێژوویە بۆ بەرژەوەندیی نەتەوەگەریی خۆیان بەکاربهێنن، دیارە یەکەم هەنگاویش لەسەر ئەو ڕێگەیەدا دەستەڵات گرتنە دەستە، لە کاتێکدا ڕژێمی شاهەنشایی باری سیاسیی خەڵکی ئێرانی زۆر گران کردبوو، شیعەگەریی باشترین ڕێگایەک بوو بۆ وەدیهێنانی ئەو ئامانجە، بە هاتنی شیعەی فارسی بۆ سەر حوکم نەتەوەی کورد بووە خاوەن دوو جۆرە جیاوازی لەگەڵ ڕژێمی ئێراندا، کە جیاوازییە نەتەوایەتیەکە جاوازیی مەزهەبیشی هاتە سەر.

کێشەی کورد کێشەیەکی سەرەکییە لە ناوچەکەداو بەشێکی گەورەشی بەر دەستەڵاتی ئێرانی دەکەوێت و هەڕەشەی ڕاستەوخۆ لە گورگە خەونەکانی فراوانکاریی ئێران دەکات، هەر وەکو لە تورک و عەرەبیش دەکات، بۆیە ئەو سێ نەتەوە دژ بەیەکە لەسەر هیچ شتێ تەبا نین تەنیا لەسەر دژایەتیکردنی ئاواتە ڕەواکانی نەتەوەی کورد نەبێ، هەر سێکیان ستراتیجی فراوانکارییان هەیە لە بەرامبەر ئەو دووەکەی دیدا، بەڵام مەسەلەی کورد هەرسێکیان لەو خاڵدا کۆدەکاتەوە کە بزووتنەوەی ڕزگاریخوازی تەتەوەی کوردو سووربوونی لەسەر مافی ڕەوای خۆی لە دیاریکردنی چارەنووسی خۆیدا بەپێی جارنامەی مافی مرۆڤی نێودەوڵتان، هەڕەشەیەکی ڕاستەوخۆ لەو سێ ستراتیجە فراوانکارییە دەکات، بۆیە هەر سێکیان بە تاکتیک واز لە ستراتیجەکانیان دەهێنن بۆ گەلەکۆمەکی کردن لە کورد.

دوایین هەنگاوێک کە ئەم سێ نەتەوە داگیرکەرەی کوردی یەکخست، کۆبوونەوەی وڵاتانی دراوسێی عیراق بوو لە ئوردون لە مەڕ هەڵبژاردنەکانی عیراق ڕۆژی ٢٠٠٥/١/٧، کە ڕژێمی ئیسلامیی شیعەی فارسی پێی داگرت لەسەر عەرەبایەتیی عیراق، بێگومان نەک لەبەر ئەوەی فارس خۆشیی بە سێبەری سەری عەرەبدا دێت، بەڵکو لە دژی کوردو هەڵچوونی تێکۆشانی بۆ دانانی کۆمەڵگای نێودەوڵتان بە مافی ڕەوای دیاریکردنی چارەنووسی خۆیدا، کە لەم قۆناغەدا هەنگاوی شارستانانەی کاریگەر دەنێت بۆ وەدیهێنانی.

بێگومان ئەم ڕاستییە لە کەس شاراوە نییەو پێویستیی بە شارەزاییەکی زۆر نییە بۆ خوێندنەوەی بە شێوە ڕاستەکەی، بەڵام ئەوەی جێگای سەرسوورمانە ئەوەیە سیاسەتمەدارانی کوردی باشوور لەم پیلانە چەپەڵەدا نەک هەر دەورێکی پۆزەتیڤیان بۆ مەسەلەی چارەنووسی کورد نەبێ، بەڵکو دەوری پۆزەتیڤییان لە تێپەڕاندنی پیلانەکەدا هەبێ دڕی کورد! ئەویش بە هەوڵ و کۆششی بەردەوامیان لە بەستنەوەی عیراقی داهاتوو بە کۆمەڵگای عەرەبییەوە لەڕێگای ڕێکخراوی وڵاتە عەرەبییەکانەوە، لەکاتێکدا زۆر لە عەرەبە لیبرالکانی دژایەتیی دەکەن!

بەستنەوەی عیراق بە وڵاتە عەرەبییەکانەوە هەنگاوێکی گرنگە بۆ خنکاندنی هەموو هیواو ئاواتێکی سەرفرازیی کوردی باشوور لە داگیرکاریی عەرەب، کە هەنگاوێکی گرنگیشە بۆ تورک و فارسیش بۆ لەناوبردنی هەموو هەوڵێکی ڕزگاربوونی کورد لە داگیرکەرانی.

بۆیە دەڵێین سەیر نییە کورد تا ئێستا گەورەترین نەتەوەی سەر ڕووی زەمین بێ کە هێشتا ژێردەست و دایرکراو مابێتەوەو هیچ مافێکی ڕەوای مرۆڤانەی نەبێ.

وتەکانی سەلیم کۆچلی وەکو بۆمبێک لە ئەستەمبوڵ تەقیەوە!

پەیامی کورد - نامە- ئیوارەی ڕۆژی٢٠٠٥/١/٩ لەمێزگەردێکی کەنالی تەلەفیزیۆنی **FLASH.TV** تورکی بەناوی "ئەلتەرناتیف" کە تایبەتبوو بەکێشەی کورد لە کوردستانی باکور و چەندین کەسایەتی کوردو تورک بەشداری بیون. ئیبرهیم گویچلو باسی لەو یاداشتە کرد کە نزیکەی ٢٣٠ ڕۆشنبیر و سیاسەتوانی کورد لە پاریس ئیمزایان کردبوو تیایدا داوای ڕەوای کورد دەکات لە کوردستانی باکور. هەروەها بەڕێز کۆچلی یەکەم کوردە لەسەرکەنالێکی تورکی لە تورکیا بەڕاشکاوی باسی کوردستانی کەورە و دابەشکراو بەسەر چوار پارچەدا و داوای مافی فدرالی بۆ کوردستانی باکور دەکات. ئەو وتانەی سەلیم کۆچلی وەکو بۆمبێک لە ئەستەمبوڵ تەقیەوە و بووە مایەی سەرسوڕمانی ئامادەبووان. مەتین هێرشی کردە سەر بەڕێز ئیبراهیم گویچلو و گوتی ئۆجەلان داوای فیدرالی و خودمختاری ناکات و یەکێتی تورکیا دەپارێزی، ئێوە بۆچی دژایەتی پرۆژەکەی ئۆجەلان دەکەن بە داواکاری فدرالی. پرۆفسێرێکی تورک کە لە مێزگەردەکەدا بەشداربوو هێرشێکی زۆردژواری کردە سەر سەرکردایەتی کورد لە کوردستانی باشور کە گوایە تورکمانەکان تەپەسەر دەکەن و مافەکانیان پێشێل دەکەن. بەڵام بەڕێز گویچلو ئەو پرۆپاگەندانەی ڕاگەیاندنی تورکی بەدرۆخستەوە کەڕاستیەکان ئاوەژوودەکەن.



ئیبراهیم گویچلو لە میتینگی "لە ئامەدەوە بۆ بڕۆکسل" ڕۆژی ٢٠٠٤/١٠/٣ لەبەردەم پەرلەمانی ئەوروپا

شاندی باڵای ڕاپرسی "ریفراندۆم" لە ئێواره کۆڕێکدا لە بۆن





پاش نیوەڕۆی٢٠٠٥/١/٦ڕێکخراوی کۆمکار لە هۆڵی **Stadthalle** "**Badgodesberg**" لە شاری بۆن کۆڕێک بۆ بەڕێزان فەرزی ئەتروشی و هەڵکەوت عەبدوڵا ئەندامانی دەستەی باڵای بزووتنەوەی ڕاپرسی "ریفراندۆم" ساز کرا. هەر لەسەرەتاوە هەڵکەوت عەبدوڵا بەوردی باسی لە یەکەمین سەرەتای دامەزراندنی بزووتنەوەکە و ئامانجەکانی کردەوە و سەبارەت بە کۆکردنەوەی ئیمزاکانیش کە یەک ملیۆن و حەوسەد و پەنجا هەزارە لەسەر ١٠ **CD** تۆمار کراون و کاری لەسەر دەکرێ و هەوڵی گەیاندنی بۆ دەزگا و دامەزراوە جیهانی و ناوچەییەکان دەدرێت. پاشان فەرزی ئەتروشی گەشتەکەیانی بۆ بارەگای نەتەوە یەکگرتووەکان و کۆمیتەی باڵای مافی مرۆڤ و پەرلەمانی ئەوروپی و کامکاری عەرەبی بۆ ئامادەبووان ڕوون کردەوە و ئەو سەردانەشی بە دەستکەوتێکی گەورە لەقەڵەمدا و بەسەرکردنەوەی هەر یەکێک لەو دەزگا و دامەزراوە مرۆیی و نێودەوڵەتی و سیاسییانە، بەگەرمییەوە پێشوازی لەو کارە پیرۆزەی خەڵکی کوردستان کراوە. هەروەها ئاماژەی بەوە کرد کە بەڵێنیان پێدراوە ئاماری ئەو ئیمزایانە بدرێتە وڵاتانی ئەندام و لە کۆنفرانسی سالانەی " کۆمیتەی باڵای مافی مرۆڤ " جێگەی بۆ بکرێتەوە. لەپاڵ ئەم هەوڵانەشدا جەختی لەسەر تێگەیشتنی نادروستی ڕای عەرەبی و دەوڵەتانی دراوسێ و ڕێکخراو و گروپە تووندڕەوەکان کردەوە، بەرامبەر بە کێشەی کورد و مافەکانی گەلی کوردستان. هەر بۆیە خەباتی بزووتنەوەی ڕاپرسی"ریفراندۆم" خەباتێکی مۆدێرن و پێویستی ئەم سەردەمەیە بۆ پشتگیریکردنی باری سیاسی گەلەکەمان و ئایندەی چارەنوسسازەکەی و هیوای خواست تاوەکو بەدەستهێنانی ئامانجەکان کە سەربەخۆیی و سەروەری کوردستانە، متمانەی گەلەکەمانی لە پشتەوە بێت. هەر لەمیانەی کۆڕەکەدا، ئامادەبووان چەندین پرسیار و ڕاو سەرنجیان ئاراستەکردن و ئەوانیش بەڕاشکاوانە وەڵامیان دانەوە و کۆڕەکەش نزیکەی سێ کاتژمێری خایاند.

Impressum
خاوەنی ڕۆژنامە
Peyama Kurd Verlag
Peyama Kurd
Thomas-Mann-Str. 22
53111 Bonn / Germany
For: +49 (0228) 18 00 654
+49 (0228) 18 00 655
Fax: +49 (0228) 18 00 656
www.peyama-kurd.com
info@peyama-kurd.com
دەستەی نووسەران
کرمانجی ژوری:
دانا عەلی، فیتوس فایەق، زەکەن عەزیز، نزار جاف، جوتیار دارفروش، مەنسور سیدانی
مستەفا چوارتایی
کرمانجی ژوری:
فایل ئەزیزبەگ، سیروان حاجی بەرکۆ، سلێمان ئالیخانی، ن. بیرکەمال
کرمکی (زازاکی):
سەیدخان کۆرێ
بەیامی کورد بە مافی خۆی دەزانێ کە ئەو بابەتانەی پێی دەگات کورت بکاتەوە و لە بەری ڕێزمان ڕاستیان کاتەوە و بابەتی بڵاوکراوە لە شوێنێ چاپ نەکات.
بەیامی کورد نازانە ئەو بابەتانەی کە پڵار و هێرشی تیایە بڵاو نەکاتەوە.

خۆپیشاندانی کورد لە سویسرا

ڕۆژی ٢٠٠٥/١/٢٢ لە شاری جنێف لە سوێسرا خۆپیشاندانێکی جەماوەری گەورە سازدەکرێ بۆ داواکردنی گەڕانەوەی کەرکوک و خانەقین و شەنگار و مەخمور و بەدرە و جەسان، گشت شوینە دابڕاوەکانی کوردستان بۆ ناو سنووری جوگرافی هەرێمی کوردستان و دواخستنی هەڵبژاردنی ئەنجوومەنی کەرکوک.

مەهاباد قەرەداغی لە ژن وسیاسەت دەدوێت

نامق-هەولێر- ڕۆژی ٢٠٠٥/١/١٠ لە هوتێلی تاوەری هەولێر ولەدرێژەی چالاکییەکانی خۆیدا گژڤاری گوڵان کۆڕێکی بەناونیشانی (ژن وسیاسەت) بۆ خاتوو مەهاباد قەرەداغی سازکرد ، تەوەرهکانی کۆڕەکە بریتی بوون لە ئەکتیف کردنی زیاتری کاری سیاسییانەی ژنی کورد وکەمکردنەوەی نۆرمەکانی باوکسالاری ودەپسەلاتی باوی ئایین وکۆمەڵ لە پەراوێزکردنی ڕۆڵی ژناندا ، پاش تەواو بوتی بابەتەکەی نوسەر لەلایەن ئامادە بوانەوە گفتوگۆی چڕو پڕ لەسەر تەوەرەکان کرا

پاشماوەی K.TV ستۆدیۆی....

خەلیل سنجاری: بارودۆخی کوردستان ئاستەنگی زۆری لەسەر کارەکانمان هەبوو، بۆ نموونە ماوەیەک کاسێتمان بۆ نەدەگەیشتە کوردستان و ناچار بووین کاسێتەکان بۆ چەند جارێک تۆمار بکەینەوە، پێش ڕووخانی ڕژێمی عیراقیس بە هۆی تەنگژەی دارایەوە چەند مانگێک کارمەندان هاوکارییان وەرنەگرت.

پەیامی کورد: ئامانجی ئەم ستۆدیۆیە چییە؟

خەلیل سنجاری: پردێکە بۆ دروستکردنی پەیوەندی لە نێوان ناوەوە و دەرەوەی کوردستان. ئومێدەوارم مینبەرێک بێت بۆ ڕۆشنبیران و هونەرمەندان و ڕەوەندی کورد بەگشتی، تاکو بتوانن دەنگ و بەرهەمەکانی خۆیان بگەیەننە کوردستان.

پەیامی کورد: کەی سەرەتای دەستپێکردنتان دەبێت؟

خەلیل سنجاری: ٢٠٠٥/١/١٧ دەستبەکار دەبین و هەروەک بەڕێوەبەری گشتی **کاک" کاروان ئاکرەیی"** ئاگاداری کردم لە سەرەتاوە جگە لە هەواڵ و چالاکییەکان دوو بەرنامەشمان دەبێت.

پەیامی کورد: بەرهەمی هونەری، مەبەستم " کلیپی گۆرانی ودراما" بەرهەمدێنن؟

خەلیل سنجاری: لەژێر چاودێری و ستراتیژی **K.TV** دا لە کوردستان هەموو چالاکییەکمان دەبێت.

پەیامی کورد: ئەی هەواڵ و چالاکی؟

خەلیل سنجاری: ئێمە هەموو ئەو چالاکی و هەواڵانە دەگەیەنینە کوردستان، بەڵام بڕیاری بڵاوکردنەوەیان لە کوردستانە.

پەیامی کورد: داواکاریتان چییە؟

خەلیل سنجاری: داواکارین لە هەموو کوردێک و لە تێکڕای هونەرمەندان و ڕۆشنبیران بەبەرهەم و چالاکی خۆیان دەوڵەمەندمان بکەن، ئێمەش هەمیشە پردێک دەبین بۆ گەیاندنی ڕاو بۆچوون و بەرهەمی داهێنەرانەیان، هەر کەسێک لە توانایدا هەبێت هاوکاریمان بکات بۆ سەرخستنی ئەم دەسکەوتە پیرۆزە.

پەیامی کورد: لەگەڵ ئەوپەڕی دەستخۆشی و پیرۆزباییمان، جارێکی تریش سوپاس بۆ ئەم دیمانەیە.

خەلیل سنجاری: منیش سوپاسی پەیامی کورد دەکەم.

لە کەرکوکەوە.... یوسف

ئەوەی لە هەڵەبجە ڕوویدا شورەییە بۆ عەرەب

ژمارەیەک ئەندامانی کاتی نیشتمانی عێراق. کە پەرلەمانتارانی سەر بە ئەنجوومەنی باڵای شۆڕشی ئیسلامی و حیزبی دەعوەیان لە نێودا نەبوو. ڕۆژانی ٢-٢/١/٢٠٠٥ دوو دانیشتنیان لەگەڵ ژمارەیەک لە پەرلەمانتارانی کوردستاندا کرد، کاری ڕۆژی یەکەمی ئەو دانیشتنە قسەکردن بوو لەسەر لیژنەی تەرحیل و ڕاگوێزراو کۆچکردوان کە سەر بە ئەنجوومەنی نیشتمانییە هەروها ئەوەش دوپات کرایەوە کە پێویستە حکومەتی عێراقی ئەمڕۆ هەوڵ بدات بۆ دابینکردنی ژیان و پێداویستی بۆ ئاوارەی کەرکوک و ژمارەیەک ئاوارەی تورکمان لە کەرکووک هەروها جێی خۆیەتی بۆ ئەو مەبەستە حکومەت لە بودجەی ساڵی ٢٠٠٥دا بڕێکی گونجاو پارە تەرخان بکات تا کارئاسانی پێبکرێت بۆ گەڕانەوەی ئاوارەکان، هەروها ڕۆژی دواتریش قسە لەسەر هەڵبژاردن کرا و بە ٢٦ ئیمزای پەرلەمانتاران بەرزکرایەوە بۆ سەرۆکایەتی کاتی نیشتمانی عێراق کە بڕیتی بوون:

ئەنجومەنی کاتی نیشتمانی عێراق، ئەنجوومەنی وەزیران بۆ دانیشتنێکی تایبەت بانگەێشت بکات کە تیایدا ڕۆژنەی ئەندامانی ئەنجومەنی نیشتمانی و سەرکردەی هێزە سیاسییەکان و کەسایەتی سەربەخۆ ئامادەبن، ئەنجومەن کارنامەیەک ئامادە بکات و ئەم تەوەرانە بگرێتە خۆ

- هەڵبژاردنەکان
- کەرکوک و ماددەی ٥٨ لە یاسای بەڕێوەبردنی دەوڵەت
- کاری حکومەت و گەندەڵی ئیداری و چارەسەری.

شایانی باسە شاندی ئەنجومەنی کاتیی نیشتمانی عێراق سەردانی هەردوو سەرکردە و شاری هەڵەبجە و مۆزەخانەی شەهیدانی هەڵەبجە و گۆڕی بەکۆمەڵی شەهیدانیان کرد. ئەندامی ئەنجومەنی کاتیی نیشتمانی عێراق لە هەڵەبجە ئاسەواری ئەو تاوانانەی دیت و گوتی: من شەرمندەم کە عەرەب و موسڵمانم. چونکە ئەوەی ئەو تاوانانەی کردوە عەرەب و موسڵمانە.

دوانزە کوردی دی لە گۆڕێکی بەکۆمەڵدا

لە گەڕەکی واستی لە ئەنجامی کارکردنی شۆفڵ لە شاردا تەرمی ١٢ لاوی کوردی تر بە جل و بەرگی کوردییەوە لە گۆڕێکی دی بەکۆمەڵدا دۆزرانەوە. ئاماژەکان بەو ئاراستەیەن ئەوانیش لەو کاروانە بن کە ڕژێمی پێشوو کوردی دەگرت و لە گۆڕە بەکۆمەڵەکاندا دەیشاردنەوە.

شارەوانی کار بە بڕیاری ١١٧ ناکات

لە کۆبوونەوەی ئەم هەفتەیەی بەڕێوەبەرایەتی شارەوانی کەرکوک. لەگەڵ بەڕێوەبەرەکانی شارەکانی سەر بە قەزاو ناحیەکان ئەنجامیدا. سالار حەمە حوسێن بەڕێوەبەری گشتی شارەوانی کەرکوک ئاکامی کۆبونەوەکەی ڕاگەیاند کە چیتر شارەوانی کار بە بڕیاری ١١٧ ناکات سەبارەت بە فرۆشتنی زەوی نیشتەجێ بوون وادانرا کە بە زیادکردنی ئاشکرا بێت. بەو مەبەستەی کە هۆکارە لە کەمکردنەوەی تەنگژەی نیشتەجێ بوون. سەبارەت بە وەرگرتنی کرێی دوکانەکانیش کرێ تەنها لەو دوکانانە وەربگرێت کە سەر بە شارەوانین و پارەکەشی بۆ مەکائن و کاری خزمەتگوزاری تری زیاتر خەرج بکرێت.

لایەنی کوردی داوای دوو خاڵی تر لە کۆمیسیۆنی باڵا دەکات

محەمەد کەمال ئەندامی گرووپی کورد لە ئەنجوومەنی پارێزگای کەرکوک لە بارەی دوایین پەرەسەندنی پرسی هەڵبژاردنی کەرکوکەوە لە ئاخاوتنێکیدا وتی: لیستی برایەتیی کەرکوک بۆ ئەنجوومەنی پارێزگای کەرکوک لە لایەن پارتی و یەکێتی و لایەنە سیاسییەکانی دیکەی کوردستان و حزبەکانی عەرەب و هاوبەندی نیشتمانیی تورکمان و لایەنەکانی کلدان و ئاشووریەوە ئامادە کراوە ولەسەری ڕێککەوتوون و ڕێژەی هەموو لایەنەکانیش دیاری کراوە. لەم ڕووەوە بۆ بەشداریکردن لە هەڵبژاردن چاوەڕوانی وەڵامی کۆمیسیۆنی باڵا دەبن. ئەندامی ئەنجوومەنی کەرکوک ئەوەشی ڕاگەیاند، کە هەرچەندە د. حوسێن ئەلەیەنداوی سەرۆکی کۆمیسیۆنی باڵا وەڵامێکی هەشت خاڵی داوەتەوە، بەڵام کەموکورتی تێدایە و لایەنی کورد بە نووسراوێکی دی داوای دوو خاڵی دیکەی کردووە: ١- سندووقی دەنگدان بۆ هەرەبی هاوردە جیا بکرێتەوەو ئەوان هەر یەکەیان دەنگ بۆ ئەو پارێزگایانە بدەن کە لیێەوە هاتوون.٢- قەزاکانی کفری، کەلار، چەمچەماڵ، خورماتوو، دەنگیان بخرێتە سەر پارێزگای کەرکوک.

کوژرانی سەرپەرشتیارێکی پەروەردەیی

گۆران جاف - ڕۆژی ٢٠٠٥/١/٩، کەمال محەمەد کەسەرپەرشتیاری پەروەردەیە لەکەرکوک لەکاتی گەڕانەوەی لەسەر کارەکەیەوە بۆماڵەوە لەلایەن نەناسراوانەوە کوژراوە

هۆی کوشتنەکەی دیار نییە، بەڵام سەرچاوەیەک بە ڕۆژنامەکەمانی ڕاگەیاند کە ناوبراو کاتی خۆی لەریزەکانی بەعس دا کاری کردوە و پلەی حزبی هەبوە

ڕفاندنی دوو کەسایەتی ناسراوی کەرکوک

گۆران جاف - مقەدەم یادگار ئەحمەد بەڕێوەبەری مەڵبەندی پرۆسە هاوبەشەکان لە پۆلیسی کەرکوک ڕایگەیاند کە ڕۆژی ٢٠٠٥/١/٩ کۆمەڵە چەکدارێکی نەناسراو، ئەحمەد خدر ئەمین بەرپرسی لقی(ریاز) ی ڕێکخراوی مافەکانی مرۆڤیان ڕفاندوە لە ناحیەی ریاز کە لە٥٠ کیلۆمەتری باشوری ڕۆژئاوای کەرکوکە. هەر هەمان ڕۆژدا هاوڵاتییەکی سەید ئیبراهیم خاوەنی ئوتێلی " کۆشکی کەرکوک "ە کەیەکێکە لە دیارترین ئوتێلەکانی کەرکوک.

کورتە هەواڵ

- لیژنەی ڕاوێژکاری هەڵبژاردن لە ڕۆژی ٢٠٠٥/١/١٠ لە کۆبونەوەیەکیاندا بڕیاریاندا بانگەشە بۆ لیستی هاوپەیمانانی کوردستان بکەن و ئەو لیستەی نوێنەرایەتی کورد و تورکمان و کورد و تورکمان و کلد و ئاشوری و عەرەب بە لیژنەی ڕاوێژکاری پیادە کردی مادەی ٥٨ و ئاسان کردنەوەی ڕەوشی کەرکوکی دووپات کردەوە. بەر لە هەڵبژاردنی ئەنجومەنی پارێزگا
- * لە ٢٠٠٥/١/٩ لەناو شاری کەرکوک چەند کەسێکی نەناسراو لەناو ئوتومبێلەوە خەڵکیان داوەتە بەر ڕێژنەی گوللە و لە ئاکامدا هاوڵاتییەکی کورد بە ناوی (محەمەد عەزیز)و دوو کەسی تورکمان بە ناوەکانی (محەمەد خدرو سایب قادر) کوژران.
- لە ٢٠٠٥/١/٩، لە گەڕەکی یەکی ئایار لە شاری کەرکوک (کامیل کەمال مستەفا) بەڕێوەبەری خۆیەتی پەروەردەی کەرکوک لەبەر دەرگای مالی لە لایەن نەناسراوەکانەوە تەقەی لێدەکرێ و دەکوژرێ.
- لە ٢٠٠٥/١/٩ لە تەنیشت مزگەوتی ئەلنور ئەلکەبیر دوو هاوڵاتی ڕفێندران و بە ناوەکانی (ئەحمەد نەسرەدین و عامر ئەحمەد)
- لە ٢٠٠٥/١/٨ لە ناحیەی ریازی سەر بە قەزای حەویجە (محمد امین خدر) بەرپرسی ڕێکخراوی مافی مرۆڤ لە ناحیەی ریاز لە لایەن نەناسراوەکانەوە ڕفێندرا.
- لە ٢٠٠٥/١/٧ لە داقوق دوکانی ملم فاتیح کە کوردێکی دانیشتووی شارەکەیەتی ئاگری تێ بەردەدرێ و دوکانەکەی دەسوتێندرێ.

www.arsiv.org

پەیامی کورد

ژمارە ١٩ (ساڵی دووهەم) | رۆژنامەیەکی هەفتانەی گشتییە | ٢٠٠٥/١/١٤

سواڕە محەمەد ئەمین ئەندامی پەرلەمانی کوردستان:



ئێمە لەناو پەرلەماندا وەک تاکێکی سەربەخۆ گفتوگۆ دەکەین و بڕیار دەدەین.

لاپەڕەی ٣

پشتگیریکردن لە رۆژنامەنووسی کورد «شمزین جیهانی» ئەرکی هەموو کوردێکە!



نزار جاف ـ سزادانی رۆژنامەنووسی کورد خاتوو شەمزینی جیهانی لەلایەن " دادگای ئینقلابی شاری مەهاباد" بۆ ماوەی سێ ساڵ و سێ مانگ، ڕسوا کردنێکی نوێی دیکەیە کە دەچێتە دۆسییە پڕ لە تاوانەکانی " سایەکانی خواوەند" لە تاران. خاتوو جیهانی کە لە نووسین و دەربڕینە ئیزگەییەکانیدا هەمیشە جەختی لەسەر بابەتەکانی سەربەستی بیر و بۆچوون و ئازادی ئافرەت کردۆتەوە، سەرئەنجام دوژمنانی سەربەستی هزری مرۆیی و ئازادی ئافرەت ڕق و کینەی خۆیان بە پەلکێشکردنی ئەو خاتوو دلێرە بۆ بەردەم دادگای دوور لە دادپەروەری " ئینقلابی شاری مەهاباد" تا پتر چارەی ڕەشی ئەو حکومەتە دژ بە مرۆڤایەتییە ئاشکرا تر بێت بۆ هەموو جیهان. ئەوەتا لەبەرچاوی هەموو ئازادیخوازانی جیهانەوە، خاتوو شەمزینی جیهانی ڕۆژنامەنووس و ڕوناکبیر لە زیندانێکدا بەندی دەکرێت کە تایبەتە بە پیاو کوژ و دز و جەردە و قاچاغچییانی تلیاک و هیرۆیین!! تاوانی ئەم کچە کوردە ئازا و بەجەرگە ئەوە بوو کە دەنگی زوڵاڵی خۆی لە ڕووی جەللادەکانی گەلانی ئێراندا بڵند کردەوە و داخوازییە ڕەواکانی ئەو گەلە ستەمدیدانەی خستەڕوو. لەڕاستیشدا ئەرکی هەموو ڕۆژنامەنووس و نووسەر و ڕۆشنبیرانی کوردە کە دەنگی ناڕەزایی خۆیان لەمەڕ ئەم تاوانە ناڕەوایەی دادگا دوور لەیاساکانی کۆماری ئیسلامی ئێران دەرهەق بە خاتوو جیهانی بەرزبکەنەوە و داوای ئازادکردنی هەرچی زووتری بکەن. جێی ئاماژە پێکردنە کە ماوەی دادگاییکردنە کارتۆنییەکەی "دادگای ئینقلابی مەهاباد" تەنها کاتژمێر و نیوێکی خایاند و ڕاستەوخۆ سزا ناڕەواکەیان ڕاگەیاند، لەمیانەی کپکردنی دەنگی خاتوو شمزینی جیهانییەوە دەسەڵاتدارییەتی ئێران دەخوازێت دەنگی ئازادی گەلانی ئێران بەگشتی و دەنگی ڕەوای گەلی کورد لە نیشتمانی خۆیدا خاپوور بکات، بەڵام دەنگی ڕەوای ئازادی و سەربەستی هەرگیز کپ ناکرێت و خاتوو جیهانیش بە پشتیوانی هەموو ئازادیخوازانی کورد و جیهان بەسەربەستی لەم قۆناغە پڕ لەئازارەی دەربازدەبێت. هزاران سڵاو لە شەمزینی جیهانی و هەڵوێستە ڕەوا و چاو نەترسەکەی و سەرفرازیش دەرئەنجامی هەموو خەباتێکی ڕەوایە.

حاجییانی کوردستان ڕاستەوخۆ لە فڕۆکەخانەی هەولێرەوە بۆ سعودییە دەفڕن

بۆیەکەم جار لە مێژووی کوردا، حاجییەکانی کوردستان لەڕێگەی فڕۆکەخانەی هەلێری نێودەوڵەتییەوە بەرەو عەرەبستانی سعودی بەکۆمەڵە گەشتێکی ئاسمانی گەیشتنە ئەو وڵاتە بۆ ئەنجامدانی ڕێ و ڕەسمی حەجی ئەمساڵ و بەو شێوەیەش هەنگاوێکی سەرفرازی دیکە لە مێژووی سەروەری کوردستاندا تۆمارکرا. هەرلەمبارەوە ڕۆژی ٢٠٠٥/١/١١ دوا کاروانی حاجییانی کوردستان لە ڕێگەی گەشتی ئاسمانییەوە گەیشتە عەرەبستانی سعودی. جێی ئاماژە پێدانە کە تیمی ڕاگەیاندنی کوردی هاوڕێ لەگەڵ کاروانی حاجیانی کەردستاندا توانی سەردانی شاندی ١٨ وڵاتی ئیسلامی و جیهانی بکات.

K.TV ستۆدیۆی ئەوروپا لە ئەڵمانیا دەکاتەوە

لە بیرەوەری شەشەمین ساڵوەگەڕی دامەزراندنی تەلەفزیۆنی کوردستان **K.TV** بڕیارە لە ٢٠٠٥/١/١٧یەکەمین ستۆدیۆی **K.TV** لە وڵاتی ئەڵمانیا بکرێتەوە، بۆ بەدواداچوونی ئەم هەواڵە گرنگە سەردانی ستۆدیۆکەمان کرد و لە دیداریکدا هەڤپەیڤێنێکمان لەگەڵ بەرپرسیاری ئۆفیسی ستۆدیۆی **K.TV** لە ئەوروپا بەڕێز " خەلیل سنجاری" سازکرد.

پەیامی کورد: ئەوەی ئێستا لەناو ئەم ستۆدیۆیەدا دەبینین دەستکەوتێکی زۆر گەورەیە و مایەی خۆشحاڵییە کە بەم ئاستە بەرزە هونەرییەوە ستۆدیۆیەکی کوردی دەبینین، چۆن دەستتانپێکرد؟

خەلیل سنجاری: پێم خۆسە لە سەرەتاوە یادی شەشەمین ساڵڕۆژی دامەزراندنی **K.TV** لە هەموو گەلی کورد بە گشتی و کادیر و کارمەندانی ئەو تەلەفزیۆنە تازیزە بکەم، ئاشکرایە ئەمڕۆ ڕاگەیاندن دەروازەیەکی زۆر فراوان و کاریگەرە بۆ بەجیهانییونی کێشە و خواستەکانی گەلەکەمان و ناساندن و بەرزکردنەوەی ئاستی فەرهەنگی نەتەوەکەمان. هەربۆیە پێش شەش ساڵ هەروەک بەڕێز کاک مەسعود بارزانی ڕایگەیاند " تەلەفزیۆنی ئاسمانی کوردستان شۆڕشێکی نوێی گەلەکەمانە " ئەو دەزگایە هاتە دامەزراندن و چەندین قۆناغی باشی بڕی و ئێستا لە ڕێگەی پەخشەکانی ئاسمانی و ئەنتەرنێتەوە ٢٤ کاتژمێری تەواو پەخش دەکات و لەو ماوەیەی دواییشدا " ڕادیۆی کوردستان"یشی لەگەڵ گرێدرا.



خەلیل سنجاری بەرپرسیاری ئۆفیسی ستۆدیۆی **K.TV** لە ئەوروپا

پەیامی کورد : ئەتوانیت باسی ئەو ئاستەنگانە کارەکانتان هەبوون چی بوون؟

بۆ لاپەڕەی ٢

